



K.T.

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê EDEBİYATA KURDÎ

**EDEBÎYATA KURDÎ YA ZAROKAN DI SERDEMA
KAFKASYAYÊ DE**

Bahar ENÇ

TEZA LÎSANS A BİLİND

Şêwirmend

Doç. Dr. Zafer AÇAR

Bîngol – 2024

T.C.
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

KAFKAS DÖNEMİ KÜRT ÇOCUK EDEBİYATI

Bahar ENÇ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

Danışman
Doç. Dr. Zafer AÇAR

Bingöl – 2024

NAVEROK

NAVEROK	I
BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ	V
TEZ ONAY SAYFASI	VI
PÊŞGOTIN.....	VII
KURTE	IX
ÖZET0	X
ABSTRACT	XI
KURTEPEYV	XII
DESTPÊK	1
Armanc û Çarçove	2
Çavkanî û Rêbaz	3
Zehmetîyên Tezê.....	5
BEŞA YEKEM.....	6
1. ÇARÇOVEYA GIŞTÎ.....	6
1.1. Zarok	6
1.2. Zarokatî.....	8
1.3. Edebîyat û Edebîyata Zarokan.....	12
1.3.1. Pêvajoya Dîroka Edebîyata Zarokan.....	17
1.3.1.1. Îngilistan.....	20
1.3.1.2. Fransa	21
1.3.1.3. Almanyay	22
1.3.1.4. Emerîka	23
1.3.2. Armanc û Fonksîyonên Edebîyata Zarokan.....	24
1.3.3. Di Perwerdeya Zarokan de Rola Edebîyata Zarokan	26
1.3.4. Taybetmendî û Wesfên Edebîyata Zarokan	28
1.3.4.1. Ji Alîyê Naverokê ve Taybetmendîyên Berhemên Edebîyata Zarokan	30
1.3.4.1.1. Mijar	31
1.3.4.1.2. Tema.....	31
1.3.4.1.3. Şexs/Kesayet.....	32
1.3.4.1.4. Ziman û Vegotin	32
1.3.4.1.5. Honak/Plan	32
1.3.4.2. Ji Alîyê Rûxsarê ve Taybetmendîyên Berhemên Edebîyata Zarokan	33
1.4. Edebîyata Kurdî ya Zarokan	35
1.4.1. Berhemên ku di Serdema Klasîk de ji bo Zarokan Hatine Nivîsîn	36
1.4.1.1. Nûbihara Biçûkan	36

1.4.1.2. Gulzar	37
1.4.1.3. Luxetnameyî Ehmedî	37
1.4.1.4. Mîrsadu‘l-Etfal.....	38
1.4.1.5. Eqîdeya Mewlewî (1806-1882)	38
1.4.2. Berhemên ku di Serdema Modern de ji bo Zarokan Hatine Nivîsîn	39
1.4.2.1. Xebatên li Tirkîyeyê Hatine Kirin.....	40
1.4.2.2. Xebatên li Ewropayê Hatine Kirin.....	45
1.4.2.3. Xebatên li Başûr Hatine Kirin	49
1.4.2.4. Xebatên li Îranê Hatine Kirin.....	50
1.4.2.5. Xebatên li Sûrîyeyê Hatine Kirin.....	51
BEŞA DUYEM	56
2. EDEBÎYATA ZAROKAN LI KAFKASYAYÊ	56
2.1. Êwra Kafkasyayê	56
2.2. Perwerdeya Zarokên Sêwî	57
2.2.1. Xo-Xo Hînbûna Xondina Nivîsara Kurmancî	58
2.2.1.1. Naveroka Pirtûkê	59
2.2.1.1.1. Lorî.....	61
2.2.1.1.2. Pêkenok	62
2.2.1.1.3. Çîrok.....	62
2.2.2. Ronaî-Kitêba Alfabaya Kurmancî.....	62
2.2.2.1. Naveroka Pirtûkê	63
2.3. Kadroyên Pêşîn û Xebatên Perwerdeya Zarokan.....	64
2.4. Çend Berhemên Zarokan ên Perwerdehiyê	66
2.4.1. Kitêba Zimanê Kurmancî (Bona Dersxana Sisya, 1935).....	66
2.4.1.1. Naveroka Pirtûkê	66
2.4.1.1.1. Helbest.....	67
2.4.1.1.2. Çîrokên Menzûm	68
2.4.1.1.3. Stranên Zarokan.....	70
2.4.1.1.4. Çîrok û Metnên Xwendinê	70
2.4.2. Kitêba Zimanê Kurmancî (Bona Dersxana Çaran, 1936).....	73
2.4.2.1. Naveroka Pirtûkê	73
2.4.2.1.1. Metn	73
2.4.2.1.2. Helbest.....	76
2.4.2.1.3. Çîrok.....	78
2.4.3. Kitêba Zimanê Kurmancî (Bona Dersxana Duda, 1937).....	80
2.4.3.1. Naveroka Pirtûkê	80
2.4.3.1.1. Metn	80

2.4.3.1.2. Çîrok.....	83
2.4.3.1.3. Helbest.....	84
2.4.4. Kitêba Zimanê Kurmancî (Bona Dersxana Şeşa, 1935).....	85
2.4.4.1. Naveroka Pirtûkê	86
2.4.4.1.1. Metn	86
2.4.4.1.2. Helbest.....	86
2.4.4.1.3. Çîrok.....	87
2.4.4.1.4. Şano.....	87
2.4.5. Zimanê Dê, Kitêba Xwendinê (Bona Dersxana Sisya, 1955).....	87
2.4.5.1. Naveroka Pirtûkê	88
2.4.6. Lîteratûra (Bona Dersxana 5-6, 1970).....	89
2.4.6.1. Naveroka Pirtûkê	89
2.4.6.1.1. Çîrok.....	90
2.4.6.1.2. Helbest.....	90
2.4.6.1.3. Meselok û Gotinok.....	90
2.4.6.1.4. Têderxistinok	90
2.4.6.1.5. Klam	91
2.4.6.1.6. Metn	91
2.4.7. Elîfba (1974)	91
2.4.7.1. Naveroka Pirtûkê	92
2.5. Rola Radyoya Rewanê di Edebîyata Zarokên Sovyetê de	92
2.5.1. Şengilo, Mengilo, Xalîçengilo	93
2.5.2. Kumsor.....	94
2.6. Rola Rêya Teze di Edebîyata Zarokên Sovyetê de	94
2.7. Berhemên Zargotinê û Edebîyata Zarokên Kafkasyayê.....	95
2.7.1. Folklorê Kurmanca	96
2.7.2. Folklorê Kurmancîyê.....	99
2.7.3. Hikayetêd Cimeata Kurda.....	100
2.7.4. Zargotina Kurdî.....	102
2.8. Çîrokên Taybetî ji bo Zarokan Hatine Nivîsandin.....	103
2.8.1. Şêrê Çavqul.....	103
2.8.2. Gezgezk	105
2.9. Berhemên Edebîyata Zarokan ên Hatine Wergerandin	106
2.9.1. Se û Pişik.....	107
2.9.2. Kalkê Gabo Çewa Kurmê Hevîrmîş Xweyî Dike	108
2.9.3. Xweyî û Xulam	108

2.9.4. Axirya Nes	108
2.9.5. Nezerê Mêrxas.....	108
2.9.6. Tramve li Rewanê.....	109
2.9.7. Mişka Pişîkêra Çawa Şer Kirin	109
2.9.8. Teyr û Tû.....	110
2.9.9. Gîkor	110
2.9.10. Berhevkirina Kilama.....	111
2.9.11. Masîgir û Masîyê Zêrîn.....	111
2.9.12. Şirovekirin Derheqa Heywana de (Bona Zara).....	112
2.9.13. Plenê Kavkasê	112
2.9.14. Robînzon Krûzo	113
2.9.15. Memê û Eyşê.....	113
2.10. Helbestên Zarokan di Edebîyata Kurdî ya Sovyetê de.....	114
2.10.1. Mikaêlê Reşîd – Pişîka Min	115
2.10.1.1. Naveroka Pirtûkê.....	115
2.10.2. Fêrikê Êsiv – Pampa Min	115
2.10.2.1. Naveroka Pirtûkê.....	116
2.10.3. Karlanê Çaçanî	117
2.10.4. Emînê Evdal- Bihar	117
2.10.4.1. Navaroka Pirtûkê.....	118
ENCAM	120
ÇAVKANÎ	123
ÇAVKANÎYÊN DÎJÎTAL	128

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Yüksek Lisans tezi olarak hazırladığım “*Edebîyata Kurdî ya Zarokan di Serdema Kafkasyayê de*” adlı çalışmanın her aşamasında, başlangıçtan sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu taahhüt ederim.

01/12/2024

Bahar Enç

TEZ ONAY SAYFASI
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Bahar Enç tarafından hazırlanan *Edebîyata Kurdî ya Zarokan di Serdema Kafkasyayê de* başlıklı bu çalışma, 03.12.2024 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda *oybirliği* ile başarılı bulunarak jürimiz tarafından Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan	: Doç. Dr. İlyas SUVAĞCI	İmza:
Danışman	: Doç. Dr. Zafer AÇAR	İmza:
Üye	: Dr. Öğr. Üyesi Ömer DELİKAYA	İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../..... tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA
Enstitü Müdürü

PÊŞGOTIN

Edebîyat wekî pirtûkxaneyeye mezin çî pêdivîya mirovan ji alîyê zihnî û fikrî ve hebe dibersivîne. Wisa ku edebîyat mirovan ji alîyê fikr û zinhî ve pêş ve dibe û bi awayekî estetîk ruhê mirovan xweş û geş dike. Zarok bi sedan salan wekî mînyatûrên mezinan hatine hesibandin û edebîyata mezinan bi kar dianîn. Lê ev yek problemeke mezin bû ji bo zarokan. Lewre zarok ji mezinan cudatir bûn. Asta têgihîştina wan, nêrina wan a li ser jîyanê gelek cuda bûn. Mixabin civak pir dereng bi vê yekê hesîyan. Piştî civak bi zarok û zarokatîyê hesîyan, xwestin ji bo zarokan jî edebîyatek biafire.

Ji dîroka mirovahîyê heta îro fikr û hizr û tevgerên mirovan hertim di nava guherîn û geşedaneke de ne. Cîvatên di dewrên berê de li ser zarok û zarokatîyê xwedî fikrên nebaş bûn an jî bê fikir bûn, piştî bûyerên wekî ronesans, reform û şoreşa pîşesazîyê fikrên baş û paqij li ser zarok û zarokatîyê çêkirin. Giringîya serdema zarokatîyê hat pêhesîn û ji bo geşedana zarokan edebîyatê rolek mezin lîst. Herwiha kesên wekî; Dewey, J. J. Rousseau, J. Locke bingeha geşedan û giringîya perwerdeya zarokan danîn. Bi vî awayî di perwerdeyê de rola edebîyatê hat diyarkirin û ji bo perwerde û geşedana zarokan edebîyat bi awayek aktîv hat bikaranîn.

Mînakên pêşî yên edebîyata zarokan helbet devkî bûn. Wisa ku pitik dema ji dayîk dibûn bi lorikên dîya xwe cara pêşî berhemên edebî nas dikirin. Piştî, ji bo zarokan berhemên nivîskî hatin amade kirin ku di destpêkê de ew berhemên devkî bûn û hatin nivîsandin. Di destpêkê de herçiqas li hemberî çêkirina edebîyata zarokan bertek hatin nîşandan jî bi pêvajoya demê re edebîyateke xweser ji bo zarokan hat avakirin.

Di kurdî de jî berhemên zarokan ên pêşî bi devkî bûn. Dîsa berhemên pêşîn ên nivîskî jî bi berhevkerin û nivîsandina wan berhemên devkî çêdibin. Di kurdî de tevî van berhemên folklorîk, ji bo zarokan ferhengên menzûm ên duzimanî hatine amadekirin. Taybetmendîya wan a sereke ew e ku ji bo perwerdeya zarokan hatine amadekirin. Herwiha, di kurdî de berhemên zarokan ên klasîk jî dihatin wergerandin. Lê mixabin di kurdî de berhemên xusûsen ji bo zarokan hatine nivîsandin heya demên dawî pir kêmtir bûn. Ev yek ji ber sedemên politîk, sîyasî û qedexeya li ser zimanê kurdî nehêlaye ji bo zarokan jî edebîyatek pêşketî pêk were.

Kurd li cîhanê ligelek welatan berbelav bûne û jîyana xwe di nav welatên cuda de berdewam dikin. Ji ber vê yekê jî dema em bala xwe didin edebîyata kurdî, em rastî gelek êwrên edebîyata kurdî tên ku yek ji wan êwran jî êwra Kafkasyayê ye. Piştî şerê cîhanê yê yekem dema Rûs ji pişkavkazê vedikişin û cihên wekî bajarê Qersê dikevin

bin hikumdarîya Osmanîyan, gelek kurdên Êzdî tîr sirgunkirin û direvin Ermenistan û Kavkazê. Piştî ku kurdên êzdî dikevin bin sîwana Sovyeta Yekgirtî, derfetên xwendin û nivîsandinê dikeve destê wan û kurdên li wir jî edebîyateke xweser ava dikin. Kurdên ku di êtîmxaneyan de mezin dibin bi dûmahîya demê re dibin nûner û nivîskarên kurdên navdar. Gelek xebatên cuda li wir tê kirin ku yek ji wan jî xebatên wan ên ji bo zarokan e. Kurdên Sovyetê ji bo edebîyata zarokan gavên giring avêtin. Elfabe, rêziman û pirtûkên dersan ji bo zarokan hatin amadekirin. Edebîyatnûsên kurd ên Sovyetê yê wekî Hecîyê Cindî, Casimê Celîl, Emînê Evdal, Erebe Şemo, Cerdoyê Gengo, Fêrikê Ûsiv, Karlanê Çaçanî, Mikailê Reşîd û Miradê Qeçax ji bo zarokan gelek berhem nivîsandin. Ew nivîs, him ji bo pirtûkên dersê him jî bi awayekî serbixwe ji bo zarokan hatin weşandin. Wan nivîskaran ji bo zarokên kurd çîrok û helbestên rûsî û ermenî wergerandin kurdî. Herwiha gelek çîrok, metn û stran ji bo zarokan amade kirin. Tevî van, hin berhem di Rodyaya Rewanê de û hin berhem jî di Rojnameya Rêya Teze de ji bo zarokan hatin weşandin.

Ji ber ku heta niha di edebîyata kurdan ya zarokan de xebatên akademîk û zanistî zêde nehatine kirin, di amadekirina vê xebatê de ji aliyê çavkanîyan ve me gelekî zehmetî kişand. Taybetî xebatên li Sovyetê li ber çavê me xumam in. Lewre gelek xebatên li Sovyetê hatine kirin di nava arşîvan de mane. Ji ber vê jî xwe gihandina wan çavkanîyan gelekî zehmet bû. Lê kesên wekî Rohat Alakom, Michael Erdman, Temûrê Xelîl, Eskerê Boyîk, Ezîzê Gerdenzerî û Mem Bawer derîyê arşîvên xwe li me vekirin û barê me sivik kirin. Ji ber vê yekê jî em spasîya wan nivîskarên hêja dikin. Hin kesên din jî hene ku di vê rêya zor û zehmet de bi alîkarîya wan dîsa barê min sivik bû. Di destpêkê de ez spasîya şewirmendê xwe Doç. Dr. Zafer Açar dikim ku wî ez hertim motîve dikirim û hertim ji bo min bû palpişt. Ez spasîya Dr. Ömer Delikaya dikim ku wî jî rê û rêbaz hînî min kir û pêşnîyazên xwe hertim bi min re parve dikir. Herwiha, ez spasîya mamoste Îlyas Suvağci jî dikim ku ji bo hîlbijartina mijar û serenava teze wî alîkarîya min kir. Jê cuda ez spasîyên xwe ji Serhat Kaya re dikim ku wî jî ji aliyê rêbaza teze û xwendina tîpên kirîlî de gelek alîkarîya min kir.

Ev xebat bi palpiştî, hezkirin û xwedîderketina dayîka min afirî. Ji ber vê yekê jî ez vê xebatê diyarî dayîka xwe dikim.

Bahar Enç

KURTE

Piştî ku edebîyata zarokan cihê xwe di nav wêjeya cîhanê de girt û pêl bi pêl berbelavî cîhanê bû, fêmkirin û nêzîkbûna li hember zarokan û pergalên perwerdeya beralîya zarokan jî bi dûmahîya demê re guherî û edebîyateke xurt jî bo zarokan afirî. Di hemû wêjeya cîhanê de jî bo zarokan berhem afirîn, helbest hatin nivîsîn, pirtûkên perwerdeyê hatin amadekirin û jî bo pêşketina zarokan gavên cur bi cur hatin avêtin. Wekî hemû wêjeyên cîhanê, di wêjeya kurdî de jî jî bo zarokan gav hatin avêtin û di her êwreke kurdî de berhem jî bo zarokan hatin dayîn, bername hatin çekirin û heya roja îroyîn jî ev xebat tên berdewamkirin. Yek jî êwra kurdî ku jî bo zarokan gelek xebatên cur bi cur hatine amadekirin, êwra Kafkasyayê ye. Ji ber ku kurdên li wir xwedî çîrokeke sirgunîyê ne, pêşketina wêjeya zarokan û pêşketina xebatên dîtir li gor pergalê Sovyeta Yekgirtî şikl girtîye û wisa pêş ketîye.

Ev xebata li ber destê we jî du beşan pêk tê ku di beşa yekem de bi taybetî li ser zarok, zarokatî, wêjeya zarokan û cihê wê ya li cîhanê li gor çavkanîyên berdest hatîye behskirin û mijar hatîye zelalkirin. Di beşa duyem de jî me li gorî çavkanîyên li ber dest behsa kurtedîroka êwra Kafkasyayê kirîye û wêjeya zarokan a êwra Kafkasyayê, xebatên ku li wir hatine kirin li gor berheman kategorîze kirîye, behsa serecem û naveroka wan kirîye û analîz kirîye.

Bi vê xebatê hat dîtîn ku di serdema Kafkasyayê de jî bo xwendin û pêşketina zarokan gelek pirtûkên perwerdeyê hatine amadekirin. Her wiha jî bo zarokan gelek helbest û çîrok hatine nivîsandin û jî bo zarokan gelek pirtûk hatine wergerandin û pêşkêşkirin.

Miftepeyv: Zarok, Edebîyata Zarokan, Êwra Kafkasyayê, Perwerde.

ÖZET

Çocuk edebiyatının dünya edebiyatında yerini alıp yavaş yavaş dünyaya yayılmasının ardından çocuklara karşı anlayış, yaklaşım ve çocuklara yönelik eğitim sistemleri de zamanla değişmiş ve güçlü bir çocuk edebiyatı oluşmuştur. Dünya edebiyatının tamamında çocuklara yönelik eserler yaratıldı, şiirler yazıldı, eğitici kitaplar hazırlandı ve çocukların gelişimi için çeşitli adımlar atıldı. Bütün dünya edebiyatında olduğu gibi Kürt edebiyatı içerisinde de çocuklar için adımlar atılmaya başlandı ve Kürt edebiyatının her bir dönemi içinde çocuklar için farklı çalışmalar yapıldı, çocuklara yönelik eserler verildi, programlar yapıldı ve bu çalışmalar günümüze kadar sürdürülmektedir. Kürt çocuk edebiyatı için çeşitli çalışmalar yapan Kürt edebiyatı dönemlerinden biri de Kafkas dönemidir. Orada yaşayan Kürtlerin sürgün bir hikâyesi olduğundan çocuk edebiyatının gelişimi ve diğer eserlerin gelişimi SSBC sistemine göre şekillenmiş ve bu şekilde gelişmiştir.

Önünüzdeki bu çalışma iki bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde çocuk, çocukluk, çocuk edebiyatı ve mevcut kaynaklara göre dünyadaki yerine değinilmiş ve konuya açıklık getirilmiştir. İkinci bölümde mevcut kaynaklara göre Kafkasya döneminin kısa tarihçesinden ve Kafkasya dönemi çocuk edebiyatından bahsettik, burada yapılan çalışmaları eserlere göre kategorize ettik, içeriklerinden bahsettik ve analiz ettik.

Bu çalışmanın sonucunda Kafkasya döneminde, çocukların eğitimi ve gelişimi için önemli çalışmalar yapıldığı görülmüştür. Bu kapsamda birçok eğitim kitabı hazırlanmış, çocuklar için şiirler ve hikâyeler yazılmış, ayrıca pek çok kitap tercüme edilerek sunulmuştur.

Anahtar Kelimeler: Çocuk, Çocuk Edebîyatı, Kafkas Dönemi, Eğitim.

ABSTRACT

After children's literature found its place in world literature and began to gradually spread worldwide, attitudes and approaches toward children, as well as educational systems targeting them, also evolved over time, leading to the development of a strong body of children's literature. In world literature, works were created for children, poems were written, educational books were prepared, and various steps were taken for children's development. As with global literature, Kurdish literature also began to take steps for children. In every period of Kurdish literature, different efforts have been made for children, products aimed at them have been created, programs have been organized, and these activities continue to this day. One of the periods in Kurdish literature that has undertaken various efforts for Kurdish children's literature is the Caucasian period. Due to the story of exile experienced by the Kurds living there, the development of children's literature and other works was shaped by the system of the Soviet Union and progressed accordingly.

This work in front of you consists of two parts. In the first part, it addresses the topics of children, childhood, children's literature, and their place in the world according to existing sources, providing clarity on the subject. In the second part, we discuss a brief history of the Caucasian period based on available sources, along with children's literature of that period. We categorized the works conducted here according to their content, discussed their themes, and provided an analysis.

As a result of this study, it has been observed that significant efforts were made during the Caucasus period for the education and development of children. In this context, many educational books were prepared, poems and stories were written for children, and numerous books were translated and presented.

Keywords: Child, Children's Literature, Caucasian Period, Education.

KURTEPEYV

bnr.	: Binêre
C.	: Cild
H.	: Hejmar
hwd.	: her wekî din
J.	: Jimar
r.	: Rûpel
vghz.	: Veguhêzer
wer.	: Wergêr



DESTPÊK

Ji zayînê heta dawîya emrê xwe mirov di nava geşedanekê de ye ku ev geşedan wekî serdemên cuda yên jîyana mirovan e. Ji wan serdeman zarokatî, wekî destpêka jîyana mirovan, zarokan ji bo jîyînê amade dike. Kesên di wê serdemê de dijîn wekî zarok tên pênasekirin ku zarok di nava civatekê de kesên gelekî giring in. Lewre zarok wekî pirekê, nîrxên çandî û exleqî yên civata xwe hildigire û derbasî nîfşên din dike. Fîkr û tevgerên li hember zarok û zaroktîyê bi awayekî jîndar bi pêvajoya demê re li gorî çanda civakan gelek caran guherîye. Zarokên ku di dewrên kevnar û qedîm de wekî minyatûrên mezinan dihatin hesibandin di pêvajoya demê re bûn navenda civakê û bûn keseyatên giring. Wisa ku ji bo zarokan cil û bergên taybet û lîstikên aîdî wan hatin çêkirin û ji bo wan jîyanek taybet afirî. Di wê jîyana afirî de hemû tişt li gorî nêrîna wan û têgihiştina wan a li hember jîyanê bûn. Yek ji van guherînan jî pergala perwerdeyê bû ku civatan edebîyat wekî amûrekê ji bo hînkirin û perwerdeya zarokan bi kar anîn. Bi vî awayî edebîyata zarokan derket ku edebîyata zarokan wekî cureyeke edebîyatê di pêvajoyeke dirêj de pêk hat. Wisa ku edebîyata zarokan bi awayekî xweser piştî kîşfa têgehên wekî zarok û zarokatîyê hat avakirin. Miletan, giringî dan zarokên xwe û zarokatî wekî serdemeke taybet hesibandin, bi vî awayî ji bo zarokan berhem dan û xusûsen ji bo zarokan edebîyat afirandin.

Geşedana fîkr, tevger û nêrînên derbarê zarok û zarokatî û edebîyata zarokan de li hemû dinyayê hêdî hêdî berbelav bû. Hemû miletan gav bi gav ji bo zarokên xwe berhemên edebî amade kirin. Wekî miletên din kurdan jî ji bo zarokên xwe berhem amade kirin. Herçiqas ji ber sedemên siyasî û polîtîk pêşveçûnek baş çênebûbe jî xebatên ji bo zarokan hatine kirin nayên pişguhkirin. Wisa ku divê bê daxuyandin ku di nava berhemên edebîyata kurdî ya gelêrî de gelek nivîs hene ku bi taybetî ji bo zarokan in û îro jî berhemên ji bo zarokan tên nivîsandin xwe dispêrin wan berheman. Herwiha, wekî hemû gelên din kurdan jî edebîyat wekî amûreke perwerdeyê bi kar anî û di medreseyan kurdan jî ferhengên menzûm ên duzimanî ji bo zarokên kurdan hatin nivîsandin. Jê cuda gelek klasîkên cihanê yên zarokan jî ji bo zarokên kurd hatin wergerandin. Ji ber perçebûna welatê kurdan xebatên kurdan jî perçebûyî ne. Ji ber vê jî di her ewreke edebîyata kurdî de xebatên cur bi cur hatin amade kirin. Kurdên li Tirkîyê, Îranê, Sûrîyê, Îraqê û Dîyasporayê gelek berhem ji bo zarokên kurdan derxistin. Vêca Êwreke din ku ji bo zarokên kurdan berhemên

giranbiha dane, Êwra Kafkasê ye. Kurdên Sovyetê piştî bidestxistina derfeta perwerdeyê ya bi zimanê dayîkê û piştî piştgirîdayîna xebatên çandî û edebî, xebatên giring û taybet derxistin. Pirtûkên dersê yên ku ji bo zarokan hatine amadekirin, ji bo geşedana edebîyata zarokan cihekî taybet digirin. Herwisa, kurdên Kafkasyayê ji bo zarokan gelek helbest, çîrok û stran nivîsandin û di Radyoya Rewanê de radyoşanoyên xwe dane lîstin.

Armanc û Çarçove

Afirînerên berhemên kurdî yên li Kafkasyayê xwedî çîrokeke trajîk bûn. Di nava wê trajêdiyê de wan afirîneran ji bo edebîyata kurdî û geşedana zimanê kurdî gavên giring û taybet avêtibûn. Xebatên wan ên giring û taybet bêguman bi perwerdekirina zarokên kurdan dest pê kiribû. Ji ber vê jî kesên wekî Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl yd. ji bo zarokên kurdan gelek kitêbên perwerdeyê amade kiribûn û di wan pirtûkên perwerdeyê de cih dabûn gelek cureyên edebîyatê. Wan edebîyatnûsan wekî mamosteyên zimanê kurdî pirtûkên dersên kurdî amade kirin û bi awayek eşkere peywendîya di navbera edebîyat û perwerdeyê de li ber çavan raxistin. Tevî van gelek berhemên serbixwe yên rûs û ermenan ji bo zarokên kurdan wergerandin kurdî. Jê cuda antolojîyên helbest û çîrokan jî xusûsen ji bo zarokên kurdan hatin amadekirin ku bi vî awayî geşedaneke baş ji bo edebîyata kurdî ya zarokan pêk hat.

Di wê dewrê de xebatên kurdî gelek caran hatin sekinandin ku piştî hilweşîna Sovyetê piraniya xebatên kurdî sekinîn û ew xebatên hatine kirin bi awayekî veşartî di nava arşîvan de man. Di vê xêbatê de li ser wan xebatên veşartî vekolîn hatîye kirin. Afirînerên berhemên kurdî yên Kafkasyayê gelek xebat ji bo zarokan kiribûn. Ji ber vê yekê jî armanca vê xebatê ew e ku li Sovyetê ji bo geşedana edebîyata zarokan çî hatîye kirin bê tesbîtkirin. Ev xebat peyîtandina wê yekê dike ku Kurdên Sovyetê jî wekî milletên din ji bo zarokên xwe gelek xebatên edebî kirine. Herwiha me xwest reng û dengên kesên wekî Hecîyê Cindî were naskirin. Wisa ku bi vê xebatê heta radeyekê em bersiva pirsên¹gorbiheşt Hecîyê Cindî jî didin ku ked û xebata wî ji bo zarokên kurdan û edebîyata zarokan pir zêde ye. Armanceke din ya vê xebatê ev e ku xebateke

1(Cimeta minê hizkîrî, ez deyindarê zimane te, efrandin û zargotina te bûme û bi helalîya şîre dîya xwe te ra xebitîme, wekî deynê te ser min nemîne. Gelo min ew deyn çîqa veğerandîye, ew jî bira Xwedê zanibe. Zef ji te razîme... Xebatêd xwe û pê ra jî navê xwe te ra dihêlim, ew jî, gelo, wê kêrî te bû? Nizam, wextê ya xwe bêje! Xatirê we!)

akademîk xusûsen li ser edebîyata zarokan a êwra Kafkasyayê were kirin. Lewre di kurdî de xebatên akademîk ên bi vî rengî gelekî kêr in. Herwiha li ser edebîyata zarokan a li Sovyetê xebateke serbixwe nehatîye kirin. Ji ber vê jî me xwest ew xebatên li Sovyetê ku ji bo zarokan hatine nivîsandin dîyar û zelal bibe û xebateke akademîk li ser wan xebatan were kirin.

Ev xebat ji du beşan pêk tê. Di beşa yekem de em zêdetir li ser têgehên zarok û zarokatîyê sekinîn. Lewre edebîyata zarokan hîmê xwe ji van herdu têgehên distîne. Piştî, edebîyat û edebîyata zarokan wekî du têgehên hat vekolandin. Paşê, ji ber ku rewş û dîroka derketina edebîyata zarokan rasterast li gorî erdnîgarî û li gorî rewşa civakê teşe digire behsa peydabûna edebîyata zarokan li hin cihên giring hat behskirin. Piştî, armanc û fonksîyonên edebîyata zarokan hat nirxandin. Piştî vê nirxandinê me pêwistî dît ku behsa rola edebîyata zarokan di perwerdeyê de jî bikin. Paşê jî di beşa yekem de taybetmendiyên edebîyata zarokan him ji aliyê navekarê ve him ji aliyê rûxsarê ve hat nirxandin. Di dumahîka beşa yekem de edebîyata kurdî ya zarokan hat nirxandin. Li wir me behsa hin berhemên di serdema klasîk de jî bo zarokan hatine nivîsandin kir. Pey re me behsa geşedana edebîyata kurdî ya zarokan li cihên wekî; Tirkîye, Îraq, Îran Sûrî û Dîyasporayê kir. Di beşa duyem de jî bi awayek berfireh li ser xebatên li Sovyetê yên ji bo zarokan hatîye sekinandin. Peşî behsa wan berhemên edebî hat kirin ku di nava pirtûkên dersan de bicih bûne. Paşê me behsa rola Radyaya Rewanê û Rêya Teze ya ji bo edebîyata zarokan kir. Paşê em li ser berhemên folklorîk hûr bûn û me tesbîta berhemên folklorîk ên ji bo zarokan hatine nivîsandin veçirand. Piştî me li ser berhemên xusûsen û bi taybetî ji bo zarokan ên ji rûsî û ermenî hatine wergerandin vekolîn kir. Di dawî de em li ser helbestên zarokan ên serbixwe sekinîn û analîza wan helbestan kir. Me xebata xwe bi çavkanîyên piştî Şoreşa Oktobirê heya hilweşîna Sovyeta Yekgirtî sînordar kir û me berhemên piştî hilweşîna Sovyetê derxebat hişt.

Çavkanî û Rêbaz

Ev xebat ji du qisman pêk tê. Qisma pêşî wekî qisma teorîyê bi ravekirina tegehên ava bû. Zêdetir li ser geşedana zarokan û rola edebîyatê ya li ser geşedana zarokan hat nirxandin. Di beşa duyem de xebatên kurdên Sovyetê yên ji bo zarokan hatine kirin, hatin tesbîtkirin, senifandin û analîzkirin.

Di qismê pêşî de ango beşa yekem de wekî çavkanî herî zêde çavkanîyên tirkî hatin bikaranîn. Herwiha tevî çavkanîyên tirkî, kême be jî çavkanîyên inglîzî jî hatin bikaranîn. Beşa yekem ji ber ku wekî teorîyê bû, çavkanîyên bi xebata me re têkildar wekî çavkanî hatin bikaranîn. Tevî wan jî ber ku di beşa yekem de zêdetir li ser pênaseya têgehan hat sekinîn, çavkanîyên sereke pirtûkên li ser zarok û edebîyata zarokan hatine nivîsandin bûn. Wekî minak: Berhema Recep Nas ya bi navê *Örneklerle Çocuk Edebiyatı*, berhema Hasan Gülerüz ya bi navê *Yaratıcı Çocuk Edebiyatı*, berhema Alemdar Yalçın û Giyasettin Aytaş ya bi navê *Çocuk Edebiyatı*, berhema Necdet Neydim ya bi navê *İnceleme-Araştırma-Eleştiri-Çocuk Edebiyatı*, berhema Sedat Sever a bi navê *Çocuk ve Edebiyat*. Herî zêde me ji van pirtûkan sê wergirt. Herwiha hin kovarên taybetî li ser edebîyata zarokan hatine nivîsandin dîsa wekî çavkanî hatin bikaranîn. Di beşa yekem de me cih da xebatên edebîyata zarokan ên bi kurdî jî. Lê ji ber ku xebatên akademîk ên li ser edebîyata zarokan pir kême in hejmarên çavkanîyên me jî kême bûn. Lê xebatên hatine kirin xebatên serkeftî ne û me gelek sêd ji wan wergirt. Wekî minak teza Turkan Tosun, a Kenan Subaşı, a Qader Zeyad Rashad û teza Ramazan Pertev çavkanîyên bîngehî ên xebata me bûn. Herwiha, me berhema Kenan Subaşı ya bi navê *-Girr û Gallî Mindalanî Kurd-Dîrokçeya Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî* jî wekî çavkanîyeke taybet hilbijart û me bi kar anî. Ji van cudatir, hin gotarên din ên Kenan Subaşı en wekî *Nirxandina Helbestên Zarokan ên Kurdî li Gorî "Rastîya Zarokan" û "Îzafîyeta Zarokan"*, *Kurteîroka Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî û Elaedîn Seccadî û Nirxandina Çîrokên Wî Yê ji bo Zarok û Nûciwanan li gorî Pîvanên Edebîyata Zarokan* dîsa wekî çavkanî hatin bikaranîn.

Di beşa duyem de pêşî bi kurtasî behsa kurdên Sovyetê û xebatên wan hat kirin. Helbet li vir çavkanîya sereke berhema Eskerê Boyîk a bi navê *Çanda Kurdên Sovyetê* bû. Piştîre bi awayekî berfireh tehlîla xebatên ji bo zarokan hatine nivîsandin hat kirin. Di vê tehlîlkirinê de çavkanîyên sereke ew xebat bi xwe bûn. Wisa ku berhemên ji bo zarokan hatine dayîn piranî ji bo perwerdeyê hatine nivîsandin. Me heft pirtûkên dersê bi dest xist û me analîz û tehlîla navaroka wan pirtûkan kir. Ji ber vê jî pirtûkên dersê yê li Sovyetê hatine amadekirin ji bo xebata me bûn çavkanîyên sereke. Herwiha, kesên wekî Têmurê Xelîl, Eskerê Boyîk Mirazê Cemal û Micheal Erdman derîyê pirtûkxaneya xwe li me vekirin. Bi vî awayî me xwe gihand 48 hejmarên Rojnameya Rêya Tezeyê, hin berhemên royaokrafîk û berhemên wergerandî. Ew xebatên hatine

peydakirin ji bo me bûn çavkanîyên sereke ku me tehlîl û analîza wan kir. Piştî berhemên zargotinê yê Hecîyê Cindî û Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl hatin bidestxistin û tesnîfkirineke berfireh li ser wan jî hat kirin. Tevî van, gotara Celîlê Celîl a bi navê *Beşek ji diroka weşengerîya kurden Kafkasyaye* wekî çavkanîyeke sereke pir zêde me jê îstîfade kir.

Zehmetîyên Tezê

Di xebata me de kêmasîya herî zêde nebûna hin çavkanîyan û xwegîhandina arşîvên êwra Kafkasyayê bû. Wisa ku herçiqas di edebîyata kurdî de gelek xebatên cihereng ji bo zarokan hatibin kirin jî, xebatên akademîk ên li ser edebîyata zarokan gelekî kêmtir in. Wekî mînak di êwra Kafkasyayê de Karlanê Çaçanî wekî helbestvanê zarokan tê naskirin lê berhemên wî yê ji bo zarokan nehatine peydakirin. Ji ber vê yekê jî him ji bo beşa teorîyê û him jî ji bo beşa duyem me ji alîyên çavkanîyan de gelekî zehmetî kişand. Ji ber ku kurdên Kafkasyayê bi awayekî rêk û pêk ji bo zarokan berhem nedane, veçirîna berhemên zarokan û veqetandina nivîsên zarokan ji nav berhemên folklorîk gelekî wext hilda. Jê cuda herçiqas heya salên 1940î pirtûkên perwerdehîyê bi tîpên latînî hatibin nivîsîn jî xwendin û fêmkirina wan nivîsan gelekî zehmetî çekir. Herwiha ji ber ku pirtûkên perwerdehîyê yê piştî salên 1940î jî bi temamî bi tîpên kirîlî hatine nivîsîn xwendin û têgihîştina metnan de gelekî zehmetî hate kişandin.

BEŞA YEKEM

1. ÇARÇOVEYA GIŞTÎ

1.1. Zarok

Zarok perçeyeke civakê ye. Ji ber vê yekê zarok ji bo civatekê pir giring in. Miletêk bi saya zarokan berdeyama hebûna xwe tîne. Ango zarok nîfşê miletekê ye. Her miletek bi awayekî xweser zarokên xwe mezin dîkin û bi şiklekî cuda li zarokên xwe dinêrin. Bo nimûne li Ewropayê an jî li Emerîkayê bi gelemperî dê û bav û belkî papîr ji bo gihiştina zarokan berpîşyar in. Li welatên wekî Kurdistan, Iraq an Hindistanê zarok ji aliyê tevahiya civaka gundî ve tên mezinkirin (Kızılhan, 2014 :9). Helbet ev nêrîn û tevgerên cuda yên li ser zarokan bûne sedem ku di her civakekê de jî bo têgeha “zarok”ê ravekirinê cuda peyda bibe. Ji ber vê jî, mirov dikare bibêje ku di ravekirana têgeha “zarok”ê de nîşaneyên çandî tên dîtin û wekî têgeh jî bi nêrînên xweser hatîye pênasekirin. Ango di civak û çandên cuda de wateyên cûrbicûr li ser vê têgehê hatine barkirin. Ji ber vê yekê jî bo pênasekirina vê têgehê wateyeke hevpar nehatiye kirin û raveyeke hevpar û tekûz tune ye. Herwiha di pêvajoya demê re pênaseya vê têgehê gelek caran guherîye. Kesên zana, pîşpor û civaknas li gorî şert û mercên serdema xwe li gorî rewşa erdnîgarîyê û li gorî şiklê civak û dînî meneyên cuda lê bar kirine.

Di ferhanga tirkî de zarok; ew kes e ku “1. Qîz an jî kurê ku temenê wan biçûk; 2. Ji hêla nijadê ve ewladê kur, an jî qîz; 3. Kur, an jî qîza ku di heyama geşedanê ya di navbera pitikî û xamabûnê de ye.” (Türkçe Sözlük, 2011).

Wê demê em dikarin bêjin zarok ewladên mirovan ên di nava geşadanê de ne ku hêj negihiştî û neresîd in. Li gorî peymanê mafên zarokan a navneteweyî zarok ew kes in ku temenê wan di navbera 0 û 18ê de ne. Li gorî vê peymanê hemû kesên ji 18 salî biçûktir wekî zarok hatine hesibandin.

Li gorî gelek zana û pîşporan ev sînor diguhere anga wekî me got pênaseyek tekûz tune ye. Şahin dibêje; “Zarok ew kes in ku di navbera 0 û 15 salî de dijîn. Wisa ku zarok mirovên biçûk in ku di heyama di navbera pitikî û xamabûnê dijîn (2007: 3). Li gorî Yalçın jî zarok 1) ew kes in ku ji du salîya xwe, heta kamîlbûna xwe dijîn. 2) kur yan jî qîza ku hê xama nebûye (Yalçın û Aytaç, 2016: 13). Dîyar e ku ji bo

pênaseya têgeha “zarok”ê gelek perspektîfên cuda hene ku li gorî sînorê temenê xwe wekî zarok tên pênasekirin.

Herwisa ji ber cudahiyeke bîyolojîk û psîkolojîk ev heyama ku zarok tê de dijîn di navbera xwe de şax şaxî dibe. Franklîn vê rewşê wiha şîrove dike: “bi awayek nerênî zarok; wekî ‘kesên negihîştî’ tê pênasekirin. Zarokatî ji pitikbûnê heta 18 salî serdemeke dûv û dirêj diheve. Ev serdema dirêj, hin cure pêwistî, qebîliyet û potansiyelê diheve. Keseke/î çar salî jî zarok e û keseke/î şazdeh salî jî lê cudahiyeke wan hene” (1986: 22).

Di ferhenga pedagojîyê de Paul Foulquie têgeha “zarok”ê wekî jîyana mirovan a berîya kamilbûnê pênase dike û dibêje: “zarokatî sê şax in, destpêka zarokatîyê an jî zarokatîya biçûk (heta du salî) zarokatîya duyem an jî zarokatîya navîn (ji 2 salî heta 7 salî), zarokatîya sêyem an jî zarokatîya dawî (ji 7 salî heta 11/12 salî) (1994: 79). Ramazan Pertev jî dike sê şax lê sînorê temenê zarokan cudatir dike û wiha diyar dike: wekî çaxa pitikayî (0-2), çaxa zarokantîya pêşî an jî berîya dibistanê (3-6), çaxa zarokatîya dawî yan jî çaxa dibistanê (6-13) (2009: 21).

Wê demê mirov dikare bibêje ku zarok piştî heyama pitikantîyê dest pê dike heya heyama kamilbûnê berdewam dike. Dema mirov li pênase û nêzîkbûna zanyaran ên li ser têgeha zarokan dinêre, dikare algorîmayeke wisa derbixe ku zarok di navbera temenên 2-15 salîya xwe de tekûz dikevin bin sîwana zarokbûnê.

Jixwe ji zayînê heta dawîya emrê xwe mirov, di nava geşedan û guherînekê de ye. Ev guherîn û geşedan wekî serdemên cuda yên jîyana mirovan e. Çiftçi behsa heyamên jîyana mirovan dike û dibêje: di jîyana mirovan de hin serdem hene, ev serdem pîrtî, ciwantî û zarokatî ne. Li gorî Çiftçi di navbera wan serdeman de cudahiyeke hişk tune ye û Çiftçi giringîyê dikişîne ser serdema zarokatîyê û dibêje: tecrubeyên ku di temenê navîn de çêdibin bi saya zarokatîyeke dewlemend ava dibin. (2013: 125). Wisa be tesîra zarokatîyê li ser serdemên din gelek zede ye. Li gorî psîkanalîstê navdar Sigmund Freud kesayeta mirovan di heyama zarokatîyê de çêdibe û bi tecrubeyên zarokatîyê, tevger û şexşiyeta mirovan ava dibe. Ji ber vê yekê zarokatî serdemeke pir giring e. Wê demê em behsa zarokatîyê bikin bê ka zarokatî çî ye! Ji bo kîjan serdemê zarokatî tê gotin?

1.2. Zarokatî

Dema em bala xwe didin ferhenga tirkî tê dîtin ku ji bo “zarokatîyê”: “Rewşa zarokbûnê; bi heyama jîyana mirovan a di navbera pitikî û xamabûnê de” hatîye gotin. Di ferhenga pedegojîyê de wekî heyema berî kamilbûyînê tê pênasekirin. Lê dema em di nava seyra dîrokê de li zarokatîyê dinêrin, dikare bê gotin ku zarokatî li gorî dîrok, çand û civakê hilberîye û gelek nêrînên cuda li ser hatine gotin. Wê demê serdema zarokatîyê serdemeke gerdûnî be jî, ji ber ku di her çandekê de wateyên cuda lê hatîye barkirin, penaseyên çandî tên dîtin (Karadoğan, 2019: 197). Zarokatî ne tenê kategorîyeke bîyolojîk e, di heman demê de avahîyeke cîvakî û siyasî ye ku di nava pêvajoya dîrokê de li ser xeta aborî civakî/çandî û polîtîkayê bi cureyên cuda hatîye fêmkirin û sêwirandin. Herwisa li gorî seyra dîrokî ya zarokatîyê mirov gelekî dereng bi zarokatîyê hesîyane. Wisa ku Nas dibêje: mirovatîyê xwe bi awayekî hêsan negihandibû têgeha zarokatîyê, zarok hertim hebû lê zarokatî tunebû, û wekî tunebûyî dihate hesibandin (2014: 1).

Li Mezopotamyaya Kevin zarok di nava malbatekê de nîşaneyê dewlemendîyekê bû. Li gorî wê dewrê zarok di malekê de çiqas zêde bûna ew malbat ew qasî dewlemend bû. Lê helbet ev zêdebûn ji bo zarokan ne erênî bû. Lewre malbat zarok ji bo gelek karan bi kar dianîn û zarok di malê de berpirsyarê gelek tiştan bûn. Zarokên ku berpirsyariyên xwe nedianîn cih cezayên gelek tund û tuj dixwarin. Li Mezopotamyaya Kevin zarok di nava şert û mercên gelek xerab de dijîyan. Wisa ku malbatan zarokên xwe şûna deynê xwe bi rehetî didan kesên xwedî deyn (Toptaş, 2016: 56-60).

Di nava civatên Yewnana Kevin de hemû biryarên jîyana zarokan li gorî malbat û civatê dihate dayîn. Wisa ku di wê serdemê de gelek caran zarok, bi taybetî keç -ji ber ku tu fêyda wan çênabe ji alîyê aborî ve- piştî ji dayîk hatin dinyayê ji alîyê malbatan ve dihatin terikandin. Herwiha wan civatan nedihêlan ku zarokên zeîf û tenduristîya wan nebaş bijîn. Herwiha malbatek dikare zarokekê/î qebûl bike an jî red bike. Ku malbatek zarokên xwe red bike malbateke din dikare wî/wê zarokê xweyî derbikeve (Aybar û Ayperi, 2022: 467).

Heta serdama navîn jî fikra zarokatîyê peyda nebûbû. Zarok ligel mezinan bûn ji bo wan qadek cuda nebû, cil û bergên wan wekî yên mezinan bûn. Zarok wekî mînakên mezinan bûn; xwarinên mezinan dixwarin, listikên mezinan dilistîn, çîrokên

wan guhdar dikirin û ligel mezinan perwerde didîtin. Herwisa bav ji bo zarokan desthilatdar bûn, dikaribûn zarokan ceza bikin, seqet bihêlin, bifiroşin û bikujin ji (Bumin, 1983: 20).

Helbet ev rewş bi vî şiklî berdewam nebû. Pêşveçûna fikr û tevgerên civatan gelek tişt guherandin. Wisa ku di dîroka mirovahîyê de û di her serdemêkê de, di qadên wekî felsefe, huner û zanistê de pêşveçûn û nêrînên cuda çêbûne. Di bin tesîra wan pêşveçûnan de têgehên wekî zarok û zarokatîyê zêdetir pêşketin û bûn qada lêkolînê.

Li gorî Postman fikra zarokatîyê ji îcadên Ronesansê ya herî giring e. Herwisa Postman dibêje: “Zarokatî di sedsala 16em de çêbûye û derketîye meydana. Heta sedsala 16em zarok mirovên biçûk bûn. Piştî sedsala 16em zorak êdî hêdî hêdî ji mezinan cuda hatin hesibandin (1995: 8).

Li gorî sosyolog û dîroknûsê frensî Aries, berîya sedsala 15 û 16em fikra zarokatîyê tunebû. Aries dibêje: zarokatî wekî têgeh heta sedsala navîn nehatibû peyda kirin. Herwisa li gorî Aries di sedsala 17em de êdî mirina pitikan kêmtir bû, di sîstema perwerdeyên Ewropê de guherîn çêbûn. Di gel van, hin pêşvaçûyîyên civakî çêbûn û tegeha zarokatîyê bi nîspî derket. Tevî van, bi qewlî Aries ve di civakên Serdema Navîn de zarokatî wekî heyameke jîyana mirovan nedihat hesibandin. Ji ber vê yekê di civakên serdema navîn de cudahîyên di navbera mezin û biçûkan de pir kêmtir bûn (Ulanowicz, d.t.).

Li gorî çavkanîyên berdest: Di sedsala 18em de êdî eleqeya civat û malbatan a li ser zarokan hinek zêdetir bû. Berîya sedsala 18em zarok xwedî jîyaneke xweser nebûn, hemû tiştên wan aîdî mezinan bûn. Lê piştî sedsala 18em zarok bûn navenda eleqeya malbatan. Herwiha di serdema 18em de civakên burjuwazî xwestin bi zarokan bidin hîskirin ku zarok ji wan cuda ne û kesên hilbijartî û mumtaz in. Ji ber wê ji bo zarokan cilên cudatir jî hatin dirûtin. Herwisa civatên pê hesîyan ku zarok xwedî dinyayeke cuda ne ji bo zarokan dinyayeke aîdî zarokan afirandin. Ango zarok, şûna ku bi mezinan re wext derbas bikin, zêdetir di navbera xwe de wext derbas kirin. Bi vî awayî ji bo zarokan qadeke din hat avakirin û listikên aîdî zarokan peyda bûn.

Piştî şoreşa pîşesazîyê êdî avahîya civak û malbatan guherî, mirina pitikan kêmtir bû û têkilîya di navbera zarok û malbatan de xurt bû. Lê ligel pîşesazîyê li Ewropayê taybetî li Îngilistanê zarok di nava şertên xerab de dihatin xebitandin. Ji ber vê yekê

rewşenbîrên wê serdemê yê wekî Voltaire, Diderot ve Helvetius xwestin fikrên qirêj ên derbarê zarokan de ji holê rakin. Wan rewşenbîr û zanyaran zarokatî wekî temsîliyeta paqîjîyê bi ciwatên Ewropî dan bawer kirin (Karadogan, 2019: 206). Wisa be dikare bê gotin ku derbarê zarokan de êdî hin tiştên nivîsîn û giringeyek ji bo zarokan hatîye dayîn. Zarok êdî di nava civatê de kesên gelek taybet in. Herwiha piştî şoreşa pîşesazîyê di navbera zarok û mezinan de ferqek çêbû. Bi îcada matbaayê û bi pêşveçûna xwendinê ve zarok ketin nav heyameke cuda. Matbaa bû sedem ku mezinahî giring bibe û zarok jî bikevin alema mezinan û çanda xwendinê hîn bibin (Öztaş, 2013; Bumin, 1983; Neydim, 2003).

Di sedsala 20em de, di bin sîwana kesên wekî J. J. Rousseau, J. Locke û J. Dewey bingeha fikra zarokatîyê hat avêtin. Rousseau zarokan wekî gulên kûvî dibîne. Li gorî Rousseau ji bo giringîya zarokan sedemek an jî armancek hewce nake. Zarok bi hebûna xwe jixwe taybet û giring e. Xweserîbûn, sirûştî û paqîjîya zarokatîyê divê bê bilind kirin. Herwisa perwerdeya ku zarok dibînin divê geşedana zarokan a sirûştî xerab neke (Kabasakal Badamchi, 2017).

John Locke jî li ser perwerdeya zarokan xebat kirine û nêrînên wî yê derbarê perwerdeyê de tesîreke mezin li ser serdema 18em çêkirîye. Wisa ku li gorî Locke zêhn wekî levhayekê vala ye û zarok bi rêya derdorê dikare bê perwerde kirin. Li gorî fikrên Locke rola dê û bavê û mamosteyan li ser tevgerên zarokan zêde ne. Ji ber vê jî çî tevgerên em bixwazin, em dikarin li ser zarokan bidin peyda kirin. Herwisa ji bo şexsiyeteke baş li zarokan peyda bibe divê di wextê xwe de tiştên baş bînin hînkirin.

Li gorî Dewey jî eger mirov li hest û pêwistîyên zarokan xwedî derbîkeve û tenê hewl bide ku wan hest û pêwistîyan derxe û pêş bixe zarok dema mezin bûn dê jîyanek bi disiplîn û bi çand bijî. Herwisa li gorî John Dewey, di geşedana zarokan de ji pêkarên derdorê zêdetir divê li gorî tebîet û şexsiyeta wan a taybet tevbigere. Dewey giringî daye avahîya bîyolojîk a zarokan û modeleke perwerdeyê pêşniyaz kirîye ku di wê modelê de zarok divê ji derve, ne bi darê zorê, xwe bi xwe, xwe perwerde bikin (Bender, 2005: 15).

Bi awayekî giştî dikare bê gotin ku; heta ku zarokatî wekî heyameke serbixwe hate hesibandin gelek wext derbas bû. Wisa ku bi pêvajoya demê re ligel guherînên weki aborî, siyasî çandî/cîvakî fikrên cuda yê li ser zarokatîyê peyda bûn. Aborî, ji cotkarîyê ber bi pîşesazîyê ve çû, mirina zarokan kêmtir bû, avahîya malbat û civakan

guherî û tîkîlîya zarokan û malbatan zêdetir bû. Feylesof, ronakbîr û zanyarên serdemê ji bo perwerde û geşedana zarokan xebat kirin û bingeha fikra zarokatîyê avêtin. Bi vî awayî derbarê zarokan de xebatên zanistî hatin kirin.

Bi kurtasî seyra dîrokê ya zarokatîyê bi vî şiklî ye; di civakên berê yê wekî Mezopotamyaya Kevin û Yewnana Kevin de zarokatî zêde ne grîng bû û zarok berpirsîyarê gelek tiştan bûn. Bi awayekî hêsan zarok dikaribû bihata cezakirin, seqetkirin an jî kuştin. Heta di serdema navîn de jî zarok û zarokatî tunebû. Wisa ku di serdema navîn de zarok mînyaturên mezinan bûn, di wêne û peykeran de zarok ji alîyê şiklî ve wekî mezinan hatine teswîrkirin. Cîl û bergên zarokan wekî yê mezinan bûn, listikên aîdî wan tunebûn. Li gorî Aries di serdema navîn de derbarê zarokatîyê de tiştek peyda nebûbû û li gorî Aries zarokatî piştî sedsala 17em derket. Piştî dema metbaa îcad dibe, bi guherîna perwerde û tevgerên reformê li ser zarokatîyê fikr guherîn û fikrên cuda derketin. Zarok êdî bû navendek û êdî li ser portreyan zarok temsîliyeta xweşî û başîyê dike.

Di sedsala 20em de ji bo zarokan bernameyên televîzyonê yê taybet, dibistan, pirtûk û listikên taybet derketin. Disa di sedsala 20em de gelek xebat û lêkolîn hatin kirin. Wisa ku di serdemên pêşî û navendî de nerîna otorîter a li ser zarokan di sedsala 20 û 21em de guherî û zarok bû navend û rêzdarî ji bo wan hate girtin.

Piştî hişmendîya giringîya zarokan ji bo civakê li malbatan çêbû, êdî malbatan xwestin zarokên xwe perwerde bikin. Lewre zarok temsîliyeta malbatan in û her malbatek perçeyê civakê ye. Ji ber vê jî dikare bê gotin ku wekî tovê civatekê zarok çiqas pêş bikeve civak dê ewqasî zêde pêş bikeve. Psîkayatrîstê zarokan Haim Ginot ji bo zarokan wiha dibêje: “zarok wekî çîmentoyek şil e, çî bikeve ser şûna xwe dihêle”. Li gorî van gotinên Ginot, civak çî hînî zarokan bike zarok dê wê hîn bibe. Ji ber vê yekê rola civakê ji bo perwerde û geşedana zarokan giring e. Li gorî Nelson Mandela kesê bixwaze ruhê civatekê nas bike divê tevgera wê civakê ya li ser zarokan binêre. Wisa be dikare bê gotin ku civateke di hewldana geşedana zarokan de wekî civateke pêşketî dikare be hesibandin. Herwisa Kızıllhan ji bo zarokan dibêje: “ew ne nebat in ku hema mirov wan av bide û ew jî mezin bibin. Divê bi destê zarokan bê girtin û evîn û fedakarî bê nîşandayîn da ku ew bikaribin di rêyên rast û yê çep re derbas bibin” (Kızıllhan, 2014: 7). Kızıllhan jî balê dîkşîne ser rola civakê ya li ser geşedana zarokan. Wisa be civak divê çî bike?

Albert Einstein dibêje: “Eger hûn bixwazin zarokên we jî bin ji bo wan çîrokên perîyan bixwîn, eger hûn bixwazin jîrtir bibin ji bo wan zedetir çîrokên perîyan bixwîn”. Ligel van gotinên Einstein dikare bê gotin ku ji bo têbînî û geşedana zarokan xwendin û perwerde giring e. Rola civakê li vir ew e ku ji bo zarokan edebîyatekê biafirîne da ku zarok jîyanê nas bikin Lewre edebîyat imkana têgihîştinê, watedarkirina jîyanê dide zarokan.

1.3. Edebîyat û Edebîyata Zarokan

Di dîroka mirovahîyê de mirovan hertim xwastinê hestên xwe bînin ziman û şîroveya wan bikin. Çi nivîskî çi devkî mirovan hewcedarî bi îfadekirina hestên xwe dîtine. Edebîyat bi vê hewcedarîyê derketîye ku bi rengvedana jîyanê afirîye. Lê belê divê bê gotin ku edebîyat hunerek e, ji ber vê jî her gotin nikare bibe edebîyat. Lewre hest û ramanên tîm zimên divê bi awayekî estetîk bînin ziman.

Wekî tê zanîn peyva edebîyatê ji erebî derbasî tirkî û farisî bûye. Herwisa bi qasî Adak derdibire; edebîyat wekî peyv ji erebî derbasî kurdî jî bûye ku di erebî de bi forma xwe ya yekjimar wekî *edebê* tê bikaranîn û edeb tê wateya zerafet, nezaket û xweşikîyê. Zanayên ereb ên ev nav li zanista edebîyatê kirinê wiha fikirine û gotine madem wateya peyva *edebê* xweşikayî ye û ev xweşikayî bi vegotinê tê îfadekirin, nexwe agahîyên derheqê vegotina xweş û bihuner de, yan jî zanista vegotina xweş û bihuner bila bi *edebê* bînin îfadekirin (Adak, 2015: 27).

Weku me got edebîyat bi awayekî estetîk bi rêya zimanê îfadekirina hest, fikr û ramanan e. Wê demê dikare bê gotin ku amûra edebîyatê ziman bi xwe ye. Wisa ku bikaranîna zimên a herî bi bandor di edebîyatê de tê dîtin. Afirînên wekî helbest, roman û çîrok hêza hest û bihîstina hunermendekê/î şênber dike û xweşîya zimanê pê hatîye nivîsîn nîşan didin. Bi xwendina van afirînan mirov nêzî jîyanê dibe û cîhana hest û fikrên mirovan fireh dike. Herwiha ev afirîn qebîliyeta têgihîştin û vegotina mirovan zêde dike (Sever, 2019: 39). Di gel van gotinan mirov dikare bêje ku edebîyat wê derfetê dide ku mirov bi têbînîyeke fireh bi nêrîneke vekirî li jîyanê binêre. Herwisa bi bikaranîna zimanekî xweş û şeweyekî estetîk edebîyat zewqeke bêhempa dide mirovan.

Her miletekî zimanekî xwe heye. Di vê kêlîyê de amûrê edebîyatê ziman be, wê demê em dikarin bêjin edebîyat bi nasnameyeke çandî ji ziman û şeweya civaka xwe

diafire. Wisa ku her civakek xwedî taybetmendîyên cuda ye. Ji bo vê jî di edebîyatê de nîşaneyên çandî û folklorîk tên dîtin. Mutluay derbarê vê mijarê de dibêje: ji ber ku edebîyat xwe dispêre zimanê civakê, rewşa civakê, bi hest û fikrên civakê û bi zimanê wê civakê tê nivîsandin. Ji ber vê jî di edebîyatê de nasnameyêke neteweyî heye. Lê divê ev e jî bê gotin ku berhemên edebî dikare bi awayekî serkeftî were wergerandin ser zimanekî din, bi vê yekê jî nîşaneyên gerdûnî jî dikare bê dîtin (1978: 7).

Edebîyat ji bo miletekî pir giring e. Lewre di edebîyatê de ji bilî armanca estetîkê armanceke din heye ku ew jî hînkirin e. Li gorî Şirin, di tebîata edebîyatê de pîrarmancî heye. Ev pîrarmancî xwe dispêre vê yekê ku berhemek tenê bi fonksîyonekê pêk nayê. Di her berhemekê de ligel fonksîyona xwe ya sereke fonksîyonên din jî hene. Di berdewama gotinên xwe de Şirin dibêje “di nava armanca berhemeke edebî de dikare armanca perwerdeyê, hînkirinê, zewq û keyf û feydedayîne bi hev re hebe” (2007: 13). Ji ber vê, edebîyat derfêta hînkirineke cîyawaz dide civatan ku divê civat bi hemû fonksîyonên edebîyatê, edebîyata xwe geş û xweş bike.

Dema mirov van fonksîyonên edebîyatê tîne ber çav dikare bê gotin ku edebîyat wekî pirtûkxaneyekê ye û mirov li çî bigere dikare bibîne. Di nav vê pirtûkxaneyê de gelek cureyên edebîyatê şax vedane ku yek ji wan jî edebîyata zarokan e. Jê cuda zarok bi cihana edebîyatê ya sêwirî amadeyî jîyana rastî dibin. Herwisa bi saya edebîyatê fikra zarokan li ser jîyanê çêdibe, zarok bi jîyanê dihesin û fikr û xeyalên wan berfirehtir dibin.

Êdî em dizanin ku zarok wekî domdarên çand û binemala civakê aîdî geşedaneke xweser in. Ji ber vê jî ji bo zarokan edebîyateke ji edebîyata mezinan cudatir heye. Edebîyata zarokan ji bo zarokan e. Ji ber vê berhemên edebîyata zarokan li gorî fikr û xeyalên wan in. Li ser vê yekê J. Rececca Lukens dibêje: “Zarok ne mirovên mezin in. Ji aliyê tecrubeyên xwe ve ji mezinan cuda ne. Ji ber vê edebîyata ji bo xwînerên biçûk tê avakirin wekî cure ne lê wekî derece divê ji edebîyata mezinan cuda be” (Sever, 2015: 23).

Tevî van li gorî Şirin: “edebîyata zarokan aîdî heyamekê ye ku jêdera xwe ji zarok û zarokatîyê distine. Ji aliyê têgihiştin, eleqe, hest û fikr û xeyalî ve divê ji bo zarokan guncav be. Herwisa ev cure wêje nêrînên zarokan û rastîya wan nîşan dike û ev nêrîn û rastî divê di pîvan, ziman, fikr û tîpan de li gorî zarokan bi naverokeke jidil û sade be. Ev cure wêje ligel hînkirina xwendina zarokan ji aliyê huner, edebîyat û

estetîkê ve alîkarîya zarokan dike. Tevî van, edebîyata zarokan bi awayekî hessas ji bo mezinbûnê amade dike” (Şirin, 2000a: 33). Şirin bi vê pênaseyê armanc, taybetmendî û sînorên edebîyata zarokan dîyar dike.

Pênaseya Sever a li ser edebîyata zarokan ji ya Şirin ne dû re ku Sever dibêje: “Edebîyata zarokan navê wan berhemên e ku di qonaxê jîyana mirovan de ji destpêka heyama zarokatîyê ya pêşîn heta heyama xamabûnê jî di nav de ye ku ev berhem bi awayekî guncav ji bo pêşketina zimanê zarokan û li gorî asta têgihiştina zarokan bi ziman û dîtbarîyên xwedan wesfên hunerî, cihana hest û ramana zarokan dewlemend dike û asta zewqa wan bilind dike (2015: 23). Wisa be em dikarin bêjin bi saya edebîyatê di zimanê zarokan de pêşveçûn çêdibe û rêya têgihiştineke astbilind li ber zarokan vedibe.

Pênaseyeke din a li ser edebîyata zarokan bi vî şiklî ye: “Edebîyata zarokan edebîyateke wisa ye ku bi asta têgihiştina zarokên di serdema geşedanê de li ser cihana hest û ramana wan de şikl digire”. (Şimşek û Yakar, 2014: 42). Nexwe edebîyata zarokan li gorî hest û ramanên zarokan li gorî asta têgihiştina zarokan diafire.

Koyuncuoğlu balê dikşîne ser edebîyata devkî jî û li gorî wî: “edebîyata zarokan ew cure edebîyat e ku berhemên bi zarokan ve girêdayî yên di nava xwe de berhemên devkî û nivîskî dihewîne. Berhemên edebîyata zarokan li gorî temenê zarokan tîndarî amedekirin û di wê hewildanê de ye ku zarok qebiliyetan bi dest bixin” (2021: 2). Wê demê ne tenê nivîskî, edebîyata zarokan a devkî jî heye. Herwisa bi pênaseya Koyuncuoğlu em bi armanceke din a edebîyata zarokan dihesin ku edebîyata zarokan dixwaze zarok qebiliyetan bi dest bixin.

Her pênaseyek bi awayekî li ser fonksiyon, armanc û sînorên edebîyata zarokan sekiniye. Li gorî van pênaseyan em têdigihên ku xwîner zarok bi xwe ne. Wisa ku ev edebîyat hîmê xwe ji zarok û zarokatîye digire. Ji ber ku muxatabên edebîyata zarokan zarok bixwe ne, berhemên edebîyata zarokan divê li gorî cihana wan û li gorî asta têgihiştina wan be. Herwisa divê li gorî daxwaz û eleqeya wan û divê li gorî hest û ramanên zarokan be. Edebîyata zarokan ji ber ku li gorî asta têgihiştina zarokan ava dibe, divê ji aliyê şêwe û zimanê xwe ve vekirî û zelal be. Ji mezinan cudatir zarok hêj ne xwedî tecrube ne, edebîyat wê rêyê li ber zarokan vedike ku zarok bi rastîya jîyanê dihesin. Berhemên edebîyata zarokan li gorî nêrîn û rastîya jîyana zarokan diafire. Di heman demê de fikr û xeyalên zarokan bi saya edebîyatê geş û fireh dibe. Tevî van,

zarok bi temenekî biçûk hînê xwendinê dibin û çanda xwendinê li zarokan peyda dibe. Ne tenê di warê nivîskî de, di warê devkî de jî edebîyateke zarokan heye.

Edebîyata zarokan ji alîyê hebûn û tunebûna xwe ve demeke dirêj bû qada gengeşîyê. Lewre wekî me di destpêkê de behs kiribû, jêdera edebîyata zarokan zarok û zarokatî ye. Herwiha em vê yekê jî dizanin ku derketina dîroka têgeha zarokatîyê ne dîrokeke kevn e. Bi pêvajoya demê re mirovek çawa ku mezin dibe, ji alîyê fizîkî û psikolojîk ve geş dibe û fikr û hest û bawerî jî diguherin. Jixwe di diroka mirovahîyê de mirov ji alîyê fikr û bawerîyên xwe ve hertim di nava guherîn û geşedanekê de ye. Dema me behsa prosesa zarokatîyê kir em pê hesîyan ku zarokatî ji alîyê hebûn û tunebûna xwe ve bi sedan salan bûye qada gengeşîyan. Piştî jî “edebîyata zarokan heye an tu ne ye?”, vê carê ev mesele bû qada gengeşîyê. Lewre di dewrên berê de zarok wekî objeyekê di nava civakê de kesên bêqîmet bûn. Piştî zarokatî bû navenda malbat û civakê, psîkoanalîstên wekî Freud giringîya zarok û zarokatîyê anîn zimên û li gorî Freud şexsiyeta mezinan di heyema zarokatîyê de çêdibe. Adler jî wekî Freud difikire û dibêje “eger hûn bixwazin mirovekê/î nas bikin bala xwe bidin temenê wê/wî yê di navbera 6 û 12 salî de.

Di her dewrê de li ser zarok û zarokatîyê fikrek heye. Helbet ev yek li ser milê zarokatîyê barekî mezin çêdike. Lewre em dizanin ku zarok, di vê serdemê de, di nava geşedaneke hessas de ne. Tiştên di vê serdemê de hîn dibin dê tesîrek mezin li ser jîyana wan çêbibe. Wekî mînak di vê serdemê de hînî zimanê dayîka xwe dibin. Bingeha perwerdehîyê di vê serdemê de çêdibe. Herwiha di destpêka heyama zarokan a pêşî de, di jîyana mirovan de heyama herî krîtîk e. Lewre tiştên ji bo zarokan tên veguhastin zarok pir zû têdigêhe, agahîyên di vê serdemê de tên hînîkirin mayinde ne.

Em êdî dizanin ji perwerde û geşedana psîkolojîya zarokan edebîyat derfeteke mezin e. Lê gelo edebîyata zarokan xusûsî ji bo zarokan di atmosfereke siruştî de çêbû? Li gorî gelek kesan edebîyata zarokan tune, hetta divê nebe. Edebîyata zarokan cara pêşî di sedsala 18em de li Îngilistanê derkete meydanê. Bertekên pêşî, hin perwerdekar jî di nav de, ji Dêrê tên. Li gorî kesên bertek nîşan didin divê ji xencî dersan tu xwendin nebe. Ew kes di wê bawerîyê de bûn ku çîrokên pevxistî ên heywanan û pirtûkên tije fentezî dê zerarê bidin zarokan. Li hemberî van bertekan, herçiqas ji alîyê hunerê ve xwedî kêmasî be jî pirtûkên zarokan hatin weşandin.

Bertekên li ser edebîyata zarokan bi derketina edebîyata zarokan dest pê kiribûn. Lê heta îro jî gelek nivîskar û edebîyatnûs di wê bawerîyê de bûn ku edebîyatek aîdî zarokan nîne. Li gorî edebîyatnûsan berhemêke edebî nikare di sînore asta têgihiştina zarokan pêk were, peyvên tîn bikaranîn di nava sînore de bi hejmareke dîyar dikare bê bikaranîn ew jî tenê dê kêrî perwerdeyê bê (Şirin, 1987: 47-48).

Li gorî hin edebîyatnûsên Tirk edebîyata zarokan tune ye. Gülerüz(2013, 75). di xebata xwe de fikrên nivîkarên Tirk wisa dide dîyarkirin ku wek mînak Cemal Süreya dibêje ez di wê bawerîyê de me ku ji edebîyatê cudatir edebîyata zarokan tune ye. Zarok ji ber ku ne nivîskar in, wê demê edebîyateke wan jî tune. Yaşar Kemal jî dibêje: edebîyata zarokan tune ye. Li gorî Kemal edebîyata zarokan bi biçûkxistina zarokan derketîye. Di berdewama gotinên xwe de Kemal dibêje çîrok ji aliyê mezinan ve jî tîn guhdarkirin ne tenê zarok guhdar dikin, di edebîyata zarokan de tenê zûgotinok û helbest cûda ne, ew qas.

Bi zimanekî hişk Baltacıoğlu behsa tunebûna edebîyata zarokan dike û dibêje: edebîyatek bi taybetî nikare hebe ji bo zarokan, ka çawa zadek, hewayek, huner û zimanekî taybet nikare hebe ji bo zarokan edebîyatek jî nikare hebe. Zarok namzetên mezinbûnê ne, ji ber vê jî tiştên ku zarok distînin, dixwin û jê hez dikin wekî ya mezinan in (Baltacıoğlu 1933, vghz. Nas, 2014: 34).

Li jorê bi awayekî berfireh pênameya edebîyata zarokan hate kirin. Jixwe kesên dibêjin edebîyateke aîdî zarokan heye xwe dispêrin rastîya zarokatîyê. Wisa ku derbarê edebîyata zarokan de Tarık Dursun (1987, vghz. Nas, 2014: 37) wiha dibêje: di rastîyê de edebîyateke zarokan heye. Ne tenê li vir di hemû edebîyatên cihanê de edebîyata zarokan wekî cureyeke cuda tê hesibandin. Di vê cure edebîyatê de ligel weşanger û weşanxaneyan, helbestvan, çîroknûs û romanûsên şareza hene.

Kesên edebîyata zarokan wekî heyî dihesibînin di wê hişmendîyê de ne ku edebîyata zarokan edebîyateke giring e û ne hêsan e. Edebîyateke aîdî zarokan e lê ev nayê wê wateyê ku ew berhemên edebî bi awayekî beredayî werin amadekirin. Michel Tournier dibêje: edebîyata zarokan ne lîstika zarokan e, karek zehmet e (Şirin, 2000b: 33). Dilidüzgün dibêje: hêmanên edebîyatê, hêmanên edebîyata zarokan e jî. Pêşî edebîyata zarokan, edebîyat e. Belê berhem ji bo zarokan in lê ev nayê wê wateyê ku ez ê ji sînore pîvanên edebîyatê derkevim (2000: 257).

Bi kurtasî dikare bê gotin ku edebîyata zarokan edebîyata heyama zarokatîyê ye. Ji alîyê hebûn û tunebûnê ve gelek caran dibe qada gengeşîyan. Lê em dizanin ku asta têgihiştina zarokan ji ya mezinan cudatir e. Lê zarok jî mirov in û divê ji edebîyatê neyên bêparkirin. Ji ber vê jî divê ji bo zarokan jî edebîyatek hebe ku ew jî edebîyata zarokan bi xwe ye. Herwisa divê edebîyateke bêtertîb, bêqalîte û bêwate nebe. Çi pêkhatin û pêdivîyên ji bo edebîyatê pêk tên divê ji bo edebîyata zarokan jî pêk bê.

Di edebîyata zarokan de hêmanên sereke edebîyat û zarok in. Li ser edebîyata zarokan mirekeb bû derya û him zarokatî him jî edebîyata zarokan wekî daristaneke tevlihev e. Ji ber vê jî divê bi perspektîfeke fireh li ser were sekinandin. Em dizanin ku edebîyata zarokan edebîyateke ne kevn e. Lê gelo cara pêşî li ku û kengî derket?

1.3.1. Pêvajoya Dîroka Edebîyata Zarokan

Di pêvajoya dîrokê de edebîyata zarokan li gorî nerînên çand û civakê teşe girtîye û geşedana edebîyata zarokan li gorî guherînên civakî û çandê ava bûye. Bi perspektîfeke fireh eger em li diroka mirovahîyê bifikirin, em dê pê bihesin ku berê nivîs nebû lê gotin hebû. Berhemên çandî yên wekî: çîrok, çîrçîrok, destan, kilam, helbest û gotinên pêşîyan bi devkî nîfş bi nîfş dihatin neqîlkin (Güleryüz, 2013: 143). Wisa be edebîyata zarokan xwe dispêre berhemên devkî. Piştî nivîs hat dîtin ev berhem hatin nivîsandin û bi vî awayî ji nîfşên din re hatin veguhastin. Wisa ku piştî metbaa hat dîtin berhemên devkî hatin çapkirin û hin berhemên din jî derketin. Wisa, berîya ku geşedana edebîyata zarokan pêk nehatibû qismekî berhemên edebîyata mezinan ji bo zarokan dihat bikaranîn (Yıldız û Öztürk, 2018: 3).

Di serdemên kevnare de ji ber ku nivîs hêj nehatibû dîtin berhemên bi edebîyata zarokan re têkildar wekî devkî; çîrokên mîtolojîk, destanî û çîrokên dînî bûn û ne dîyar bû ka kîjan berhem aîdî kîjan serdemê ye.

Di serdema pêşîn de, ku ev serdem heya hilweşîna Romaya Rojhilatê tê hesibandin, medenîyet li cihên wekî Sumer, Misir, Hind, Yewnanistan û Anatolîyayê şîn bibû. Bîranînên mamosteyê Sumerî Ludingirra berhemeke aîdî vê serdemê ye ku bi rehetî û bi şewq dikare ji bo zarokan bê xwendin. Di vê berhemê de nîşaneyên çand û hunera wê serdemê tên dîtin. Li gorî belgeyan Sumerîyan dibistan ava kirine û di qadên cuda de dersên edebîyatê dane. Bo numûne, berhemên wekî *Destana Gilgameş* bi xwendekaran didan xwendin (Güleryüz, 2013: 143).

Dema em li gorî rêza dîrokî li cîhanê, li edebîyata zarokan dinêrîn, em dikarin bibêjin ku li gorî belgeyên berdest di edebîyata zarokan a nivîskî de yekem pirtûka zarokan B.Z. di sedsala VIem de li Hindistanê derketîye. Ev pirtûk behsa çîroka Brehmene dike ku lawê Hikumdarekî perwerde dike. Di pirtûkê de çîrok û fabl hene ku meseleyên wekî exlaqî û polîtîk bi awayekî kêfxweş tînin behskirin. Di heman demê de ev pirtûk wekî yekem pirtûka dîdaktîk e ku bikêf tînin vegotin (Bütün Ayhan, 2018: 7). Ji xencî vê pirtûkê li ser axa Hindistanê pirtûkeke bi navê *Kelîle û Dîmne* heye ku hêjayî behskirinê ye. *Kelîle û Dîmne* P.Z. hatîye nivîsîn û behsa serpêhatîyên du birayan dike. Di vê pirtûkê de heywan diaxivin û tînin de mesele hene ku mirov jê ders bigire.

Li Yewnanistana Kevin di perwerdeya zarokan de dîtin, edebîyat û muzîk gelekî giring bû. Wisa ku Platon dibêje zarok xwedî qebîlîyetên cuda ne û dibêje divê zarok li gorî van qebîlîyetan bînin perwerdekirin. Di Yewnana Kevin de *Fablên Ezop* jî bo zarokan dihatin xwendin.

Digel van, li Anadolîyê jî çîrokên jî bo zarokan dihatin xwendin hebûn. Hetta li rojhilata Anadolîyê, Îlyada û Odise ya Homeros jî bo zarokan dihat xwendin (Güleryüz, 2013: 147-157).

Li ser van agahîyan dikare bê gotin ku bi zanebûn jî bo zarokan berhem nehatîye dayîn. Dîyar e ku berhemên edebî hene lê jî bo mezinan hatine nivîsîn û guhdarkirina wan jî bo zarokan bikêf e û gelek caran jî jî bo perwerdekirina wan hatine bikaranîn. Wisa be dikare bê gotin ku edebîyata zarokan a nivîskî li ber çavê me xumam e.


Wekî me li jorê behs kir yekem pirtûka jî bo zarokan hatîye nivîsîn li Hindistanê B.Z. di sedsala VIem de hatîye nivîsîn. Li gorî çavkanîyên berdest, piştî vê pirtûkê hezar salan zêdetir berhemeke ku jî bo zarokan hatibe nivîsîn nehat dîtin. Gelo piştî hezar salan çî bû sedem ku edebîyata zarokan geş bibe?

Weku me behs kiribû çîrûskên biçûk ên giringîpêdayîna serdema zarokatîyê, di sedsala 16em de derket. Piştî ku fikra zarokatîyê derket pêş û giringîya zarokatîyê berbelav bû, civakan pê derxistin ku zarok jî hewceyî edebîyatekê ne. Em dizanin ku edebîyata mezinan jî ya zarokan kevintir e. Piştî zarokan dest bi xwendina klasîkên mezinan kirin, civatan ferq kir ku jî bo zarokan edebîyatek pêwîst e. Jixwe tiştê ku

hebûna wê ne pêwîst be, nikare derbikeve. Em dikarin vê yekê wekî unsûreke kartêkar a li ser derketina edebîyata zarokan bihesibînin.

Herwiha edebîyata zarokan jî piştî sedsala 16em derket. Sedsala 16em jî sedsaleke wisa ye ku Dêr serdest in. Ji ber vê jî berhemên zarokan gelemperî bi dîn re eleqedar in. Ji ber bertekên kilîseyê yên li ser edebîyata zarokan dikare bê gotin ku berhemên sedsala 16em ji cihana xeyalên zarokan ên rengîn dûr in û tenê şîretên dînî tîr pêşkêşkirin. Lê li hemberî van bertekan nivîskarên serdemê, kêr be jî hin tişt nivîsandin. Kîbrîs vê gengeşîya di navbera serdemên nivîskar û kilîseyê de wekî unserekê dibîne ku bandor li ser edebîyata zarokan kirîye û dibêje: Kilîseyê li welatên Ewropayê çî xwendinên naverok ne dîn hebe, nexwastine zarok bixwînin. Lê zarok ji berhemên naveroka wan dîn e aciz bûbûn û nedixwastin bixwînin. Bi vî awayî gengeşî hatin kirin ku gelo li ser berhemên edebî yên ji bo zarokan guncav were nivîsan an na. Nivîsên hatin nivîsîn heta sedsala 18em jî ji bin bandora kilîseyê xilas nebû, nekarîbûn xwe ji taybetmendîya xwe ya dîdaktîk biparêzin (Zengin, 2009; Bütün Ayhan, 2018; Kîbrîs, 2010).

Li vir divê behsa derketina metbaayê jî bê kirin ku bi derketina metbaayê bandoreke mezin li ser geşedana edebîyata zarokan çêdibe. Lewre piştî metbaa derket xwendin û nivîsîn zêde dibe, eleqeya li ser pirtûkan zêdetir dibe û berhemên edebîyata zarokan derdikevin. Çîrokên wekî *Robîn Hood* ên jêdera wan çîrokên gelerî ne di wê serdemê de bi zîmanekî sade derdikevin (Kadim, 2021: 2). Kîbrîs behsa heman tiştî dike û dibêje xebatên bi awayekî zanistî û bi zanebûn hatine kirin li Îngilistan, Fransa, Almanya û Emerîkayê hatine dîtin. Berhemên pêşî di bin bandora çîrokên wekî *Robîn Hood* û *Tom Thom* de derketin û bi uslûbeke herikbar û zîmanekî sade û biwêne derketine. Gel van, çîrokên fêbl ên wekî *Aisopos (Ezop)* wekî berhemên pêşî tîr hesibandin (Kîbrîs, 2010). Bi vî awayî êdî berhemên curbicur ji bo zarokan derdikevin. Mîna keke dîn jî ev e û wisa tê hesibandin ku yêkê pirtûka biwêne ji bo zarokan hatîye nivîsîn ji aliyê John Amos Comenius li Nurembergê di sala 1658ê de bi navê *Orbis Sensualium Pictus* hat weşandin (Lewis, 2016, vghz. Öncü, 2008: 78).



Wisa be dikare bê gotin ku li welatên Rojavayê hişmendîya edebîyata zarokan pêk hat û çîrokên gelêrî û çîrokên ku xwe dispêrin çîrokên gelêrî bi rêyeke rêkûpêk ji nû ve hatin derxistin. Ango edebîyateke bi taybetî ji bo zarokan derket. Divê bi perspektîfeke fireh em li wan welatên Rojavayê binêrin bê ka çi xebat ji bo edebîyata zarokan pêk hatine.

1.3.1.1. Îngilistan

Di geşedana edebîyata zarokan de bêguman tesîra Îngilistanê zêde ye. Wisa ku yekem pirtûkxanêya zarokan di sala 1748ê de li Îngilistanê hatîye damezirandin. Li Îngilistanê pirtûkên zarokan li gorî guherîna civakê guherîne. Helbet di destpêkê de li Îngilistanê jî tevgerên nerênî li ser edebîyata zarokan hebûn. Lê digel van nêrman çîrokên wekî *Robin Hood* û *Jack the Giant Killer* gelek dihatin ecibandin û xwendin (Güleryüz, 2013: 167). Fikrên nerênî yên derbarê edebîyata zarokan de, di sala 1545ê de, bi pêşniyazên Hogh Rhodes kêmtir dibe. Piştî bi tesîra bîrdozên perwerdeyê yên wekî John Locke, nivîskar û weşangerên pirtûkên zarokan li ser edebîyata zarokan hûr bûn û xwe ji fikrên dogmatîk ên serdema navîn xilas kirin (Bütün Ayhan, 2018: 8). Di sedsala 17em de çîrokên di serdema navîn de hatine nivîsîn ên wekî *Ezopê* li Îngiltereyê ji nû ve hatin nivîsîn. Ligel van, hin çîrokên hîlbijartî ên *Çîrokên Hezar û Yek Şevî* jî ji bo îngilîzî hatine wergerandin (Güleryüz, 2013: 167).

Piştî, di destpêka sedsala 18em de nivîskarekî bi navê John Newbery ji bo zarokan pirtûkeke bi navê *Maka Qaz* (*Mother Goose*) nivîsand. John Newbery yekem kes e ku li gorî asta temen û eleqeya zarokan pirtûk nivîsîye û ev pirtûk yekem pirtûk e ku li gorî asta temen û eleqeya zarokan hatîye nivîsîn. Herwisa ev pirtûk berhevokên kilam û zûgotinokên gelêrî ne û bi armanca zarok jê kefê hildin hatîye nivîsîn. Li gorî çavkanîyên berdest Newbery li cîhanê kesê yekem e ku ji bo edebîyata zarokan gaveke rasterast û ciddî avetîye (Bütün Ayhan, 2018: 8).



Hin berhemên din ên li Îngîlistanê hatine nivîsin ku êdî wekî klasîkên edebîyata zarokan tên hesibandin ev in: Berhema Daniel Defoe ya bi navê *Robinson Crusoe* ya ku di sala 1719ê de hatiye nivîsandin, berhema Jonathan Swift ya bi navê *Gulliver's Travel (Seyahatên Gullîver)* ya ku di sala 1726ê de hatiye nivîsandin, pirtûka Charles Dickens ya bi navê *David Coperfield* ya ku di sala 1850î de hatiye nivîsandin.

Li gorî çavkanîyên berdest li Îngilistanê di sedsala 19em de û piştî sedala 19em ji aliyê şiklî û navaroka xwe ve bi awayekî serkeftî derketin. Berhema Lewis Carrol a bi navê *Alice's Adventures in Wonderland (Alîs li Dîyarên Nûwaze)* di sala 1865ê de hatiye nivîsandin. Ev berhem wekî me got klasîk e ji bo edebîyata zarokan û heta îro jî ji aliyê zarokan ve tê xwendin. Gaveke giring ya din ji bo edebîyata zarokan ew e ku helbestvanekî bi navê William Blake ji bo zarokan yekem pirtûka helbestê amade kir (Bütün Ayhan, 2018: 8).

1.3.1.2. Fransa

Geşedana edebîyata zarokan di sedsala 17em de û piştî sedsala 17em çêdibe. Wisa ku li Fransayê piştî şoreşa pîşesazîyê jin ketin nava jîyana xebatê. Helbet ev bû sedem ku perwerdeya berî dibistanê derbikeve û bi geşedana zaroknêhîrtinê xebatên bi zarokan re eleqedar derbikevin. Li Fransayê xebatên peşî yê edebîyata zarokan ji bo hînîkirina alfabe û hînîkirina zimên hatine amadekirin (Yalçın & Aytaş, 2011).

Charles Perrault nivîskarekî frensî ye ku wekî bavê pirtûkên zarokan tê hesibandin. Charles Perrault di sala 1696ê de di serdema Lui de pirtûkeke bi navê *Contes de ma mère l'Oye (Çîrokên Maka Qaz)* weşand. Charles ev pirtûk bi berhevîkirina çîrokên gelî amade kiribû. Di vê berhemê de çîrokên gelêrî yê wekî *Cendrillon (Sîndrella)*, *Le Petit Chaperon rouge (Keça Kumsor)*, *La Belle au bois dormant (Rindika di Xew de)*, *Le Maître chat ou le Chat botté (Pisîka Bigîzme)* hebûn.

La Fontaine (1621-1695) jî nivîskarekî frensî ye û berîya Charles Perrault e. Fontaine ji bo mezinan nivîsiye lê bi terza fablê jî berhemên wî hene. La Fontaine fablên çîrokbêjê yewnan Ezopî bi navê *Fables d'Esopî* (Fablên Ezopî) wergerandiye frensî. Herwiha, Fontaine ji xêncî wergera frensî ya çîrokên Ezopî, bi xwe jî çîrokên heywanan (fabl) nivîsandine.

Li Fransayê dîsa nivîskarekî din; François Fenelon (1651-1715) berhemeke bi navê *Les Aventures Telemaque* (Telemak) nivîsandîye. Ev berhem ji bo perwerdeya welîahtên Fransayê hatîye nivîsandin û li Fransayê pirtukeke gelek giring tê hesibandin. Lewre berhem xwe dispêre Mîtolojiya Yewnanî û wekî pirtukeke felsefî giringîyê dide aqil û zanabûnê (Yalçın & Aytaş, 2016: 22-26).

Li Fransayê ji sedsala 19em pê ve êdî di pirtûkên zarokan de unsûrên kêfî û herikbarî hat dîtin. Di wê serdemê de nivîskar Jules Verne (1825-1905) bi pirtûkên xwe yên bi terza xeyalên zanistî û maceraperestî derket meydanê. Bi berhemên Jules Verne ne tenê zarok, mezinan jî bala xwe dan behr û ezmanan. Pirtûkên wî yên wekî *Voyage au centre de la Terre* (Seyahata ber bi Navenda Dinyayê), *De la Terre à la Lune* (Seyahata ber bi Hîvê ve), *Les Enfants Du Capitaine Grant* (Zarokên Kaptan Grant), *Vinght mille lieues sousles mers* (Di bin Behrê de Bîst Hezar Fersah), *Le tour du monde en quatre-vingts jours* (Di Heyştê Rojan de Gera Alemê) pirtûkên navdar in (Kıbrıs, 2010).

1.3.1.3. Almanya

Li Almanyayê heta sedsala 18em berhemên pêşî yên edebîyata zarokan ji alîyê naveroka xwe ve bi bandora kîlîseyê, bi armanca hînkirina qeyd û bendên exlaqî hatine honandin. Berhemên li gorî cihana zarokan li Almanyayê cara pêşî ji alîyê du birayên alman Jacob Grim (1785-1863) û Wilhelm Grim ve hatine amadekirin. Van herdu birayan heta nivê duyem yê sedsala 19em li hemû Almanyayê gerîyane û çîrokên di nava gel de ku bi devkî tên gotin berhev kirine û ji nû ve veguhestine.

Nivîskarekî din yê ji bo edebîyata zarokan berhem daye Cristophe Von Schmid (1768-1854) e ku pirtûkeke çîrokan ya ji 9 ciltan pêk tê ya bi navê *Das Blumenkörnchen* (Selika Kulîlkan) tekeli edebîyata zarokan amade dike (Kıbrıs, 2010).

Tevî van, nivîskarê bi navê Karl Friedrich May jî nivîskarekî giring yê edebîyata zarokan yê li Almanyayê ye. Karl zêdetir bi terza macerayê berhem nivîsandine. Karl bi berhemên xwe zarokan dibe cihên dûr û nedîtî (Bütün Ayhan, 2018: 10).

1.3.1.4. Emerîka

Wekî welatên Ewropayê li Emerîkayê jî ji bo edebîyata zarokan gavên giring hatin avêtin. Lê dîsa wekî welatên Ewropayê li Emerîkayê jî berhemên pêşî bi unsûrên dîdaktîk dihatin nivîsandin.

Di dawîya sedsala 19em de li Emerîkayê nivîskareke jin M. Alcott (1832-1888) di sala 1868ê de bi navê *Little Women- Meg, Jo, Beth and Amy* (Jinên Biçûk Meg, Jo, Beth û Amy) romanek nivîsandîye. Berhemên wekî *Tom Sawyer* û *Huckleberry Finn* (Mark Twain, 1835- 1910) hatin nivîsandin û ev berhem wekî klasîkên edebîyata zarokan tên hesinbandin.

Dîsa nivîskarên jin; Lucy Sprague Mitchell (1878-1967) pirtûkeke bi navê *The Here and Now Story Book* (Li vir û Niha Pirtûkeke Çîrokan), Frances Hodgson Burnett (1849-1924) pirtûkeke bi navê *Little Lord Fauntleroy* (Lordê Biçûk Fauntleroy), Eleanor Emily Hodgman Porter (1868-1920) romaneke bi navê *Pollyanna* ji bo zarokan nivîsandine. Nivîskar Mark Twain jî di sala 1876ê de romaneke bi navê *The Adventures of Tom Sawyer* (Serpêhatiyên Tom Sawyer) nivîsandîye (Bütün Ayhan, 2018: 10-12).

Dema em bala xwe didin peydabûna edebîyata zarokan di civatên wekî îngilîz, elman, frensî û emrikî li gorî pêvajoya dîrokî ya edebîyata zarokan dikare bê gotin ku edebîyata zarokan têgeheke nû ye. Lewre heta sedsala 16em ji bo edebîyata zarokan bi zanebûn û bi taybetî ji bo zarokan berhem nehatibû dayîn. Ango di civakan de hişmendîya çêkirina edebîyateke xweser ji bo zarokan tunebû. Wekî me li jorê bi berfirehî behs kir, gavên yekem ku bi zanebûn ji bo edebîyata zarokan hatine avêtin li welatên Rojavayê ên wekî Îngilistan, Almania, Fransayê û li Emerîkayê hatin avêtin. Lewre tevgerên Reform û Ronasansê, Şoreja Pîşesazîyê û peydabûna matbaayê li welatên rojavayê çêbûn û ji alîyê zanistî ve pêşveçûnên mezin peyda bûn. Bi vî awayî di sedsala 17em û 18em şûn de pêşî li Rojpaşî jî li cihên din ên cîhanê nêrîn û tevgerên li ser edebîyata zarokan guherîn û geşedanên mezin çêbûn.

Li gorî agahîyên jorê em dikarin pê derbixin ku bi gelemperî berhemên pêşî yên edebîyata zarokan bi armanca hînkirina tiştêkî an jî bi armanca perwerdeyê dihatin nivîsandin. Ango berhemên pêşî bi awayekî dîdaktîk dihatin dayîn, piştî bi prosesa demê re êdî berhem bi armanca ku kêf û coşê bide zarokan dihatin nivîsandin.

Di destpêkê de dema me behsa edebîyatê kir me gotibû edebîyat bi awayekî estetîk îfadekirina hest û ramanan e. Civatên ku pê hesîyan ku zarok hilgirê çand û zimên e, edebîyat bi armanca perwerdekirinê bi kar anîn. Bi vî awayî di edebîyata zarokan de edebîyat digel estetîkê, di armanca hînkirina tiştêkî de bû rêyek. Lê ji ber ku zarokatî serdemeke krîtîk e, divê berhemên edebîyata zarokan li gorî hin qeyd û bendan bê avakirin. Herwisa weku me got edebîyata zarokan piralî ye. Ango ji yekê zêdetir fonksîyonên wê hene. Gelo fonksîyon û taybetmendiyên edebîyata zarokan çi ne û edebîyata zarokan tesîreke çawa li ser zarokan çêdike? Divê bê behskirin da ku giringîya edebîyata zarokan zêdetir bê fêmkirin.

1.3.2. Armanca û Fonksîyonên Edebîyata Zarokan

Edebîyat çi ye û bi kêrî çi tê? Gelo hewce ye ku di edebîyatê de armanca û fonksîyon hebin? Lêkolînerên li ser edebîyat û berhemên edebî hûr dibin derbarê vê mijarê de gelek caran fikrên curbicur derxistine. Li gorî Borges di berhemeke edebî de lêgerîna fonksîyonên edebîyatê tevgerêk bêmentiq e, eger berhemek xweş û estetîk be hewce nake mirov li ser fonksîyon û armanceke din bifikire. Di heman demê de li gorî Losa roman û helbest bi awayekî sirûştî û tesadufî naafire. Ji ber ku ev berhem ji aliyê mirovekê/î ve tê afirandin divê fonksîyon û armanceke wan hebe (Karagül, 2019: 335). Derbarê vê mijarê de Şirin dibêje: armanca berhemeke edebî ya sereke bi fonksîyona wê dîyar dibe. Piralîbûn û pirarmancîbûna edebîyatê ji ber tebîeta edebîyatê ye. Her berhemek digel fonksîyona xwe ya sereke hin fonksîyonên din jî hene. Ji ber vê jî fonksîyonên her berhemekê cuda ne (Şirin, 2016: 13).

Li gorî çavkanîyên berdest berhemeke edebî dikare di nava xwe de him estetîkê him jî hînkirinê bihewîne. Li gorî Moran fonksîyoneke berhemeke edebî ew e ku di xwîneran de estetîkê peyda dike. Di heman demê de berhemeke hunerî dikare agahî jî bide, dikare kelecana dînî jî bi xwîneran bide hîskirin û herwisa dikare hestên polîtîk jî li xwîneran peyda bike. Ji ber vê jî digel fonksîyonên sereke fonksîyonên din jî hene (Moran, 1974, vghz. Şirin, 2016: 13).

Wellek û Warren jî li ser heman mijarê di heman fikrê de ne û li gorî wan: eger berhemeke edebî bi awayekî serkeftî fonksiyonên xwe anîbin cih ne tenê peydakirina “feyde” û “kêf”ê bi hev re, di heman demê de divê “feyde” û “kêf”ê di nava berhemekê de bi hev re zeliqandî û pevgirêdayî bin (Şirin, 2016: 13).

Ji ber ku di edebîyat û edebîyata zarokan de heman wesf tînin dîtin. Dikare bê gotin ku ev pirarmancîbûn û piralîbûna edebîyatê ji bo edebîyata zarokan jî derbasdar e. Herwisa di pêvajoya dirokê de, di fonksiyon û armancên edebîyata zarokan de gelek caran guherîn çêbûne. Di demekê de edebîyata zarokan bi armanca hînkirin û perwerdeyê dihat bikaranîn. Piştî digel hînkirin û perwerdeyê, edebîyat êdî bi armanca kêf û coşê bide xwîneran hat bikaranîn.

Li zanîngeha Virginiyê Rita Felski di xebata xwe ya bi navê Edebîyat Kêrî Çi tê? (*Uses of Literature*) de behsa fonksiyonên edebîyata zarokan dike û dibêje çar fonksiyonên edebîyata zarokan hene; Nasîn, Efsûnî, Heyirandin û Agahdarkirin.

Li gorî Felskî fonksiyona edebîyata zarokan a yekem nasîn e û ev fonksiyona nasînê bi sê rêyan pêk tê: Naskirina zarokan, xwenaskirana zarokan, naskirina zarokan ya derbarê mirov û jîyanê de. Divê civat zarokan nas bikin û divê pirtûkên ku ji bo zarokan tînin nivîsandin li gorî eleqe, xwestek û li gorî asta zarokan be. Civakên ku giringîyê nedin zarokatîyê û zarokan nas nekin nikarin ji bo wan berhemekê biafirînin. Herwiha, zarok bi xwendina berhemeke edebî dê xwe ferq bike. Bi vî awayî zarok dê eleqe, xwestek û tevgerên xwe li gorî xwe ava bikin. Di dawîyê de dê geşedana kesayetîyê tîkûz bo zarokan pêk bê. Bi xwendina berhemeke edebî zarok di heman demê de dikarin bi hişekî vekirî û fireh li jîyanê binêrin. Lewre bi xwendina roman an jî çîrokekê zarok dibe şahîdê/a gelek jîyanan. Bi vî awayî sînore naskirina zarokan yê ji bo jîyan û mirovên cuda fireh dibe (Karagül, 2019: 335-338).

Bi edebîyatê mirov dikeve nava xeyalan û dikare dîyar dîyar bigere. Edebîyat tesîreke mezin li ser mirovan çêdike. Lewre gelek caran berhemeke edebî bi awayekî efsûnî hişê mirovan bêsînor dike. Bi edebîyatê hêza xeyalkirinê bilind dibê û bi xwendina berhemeke edebî hîzr û hişê zarokan geş dibe (Demir, 2019: 1013).

Fonksiyoneke din ya edebîyatê heyirandin e ku mirov dema berhemeke edebî dixwîne gelek caran şaş dibe. Zarok dema tiştên veşartî û nehatibe dîtin û bihîstin dixwînin diheyirin û bi vî awayî hestê meraqkirinê li wan peyda dibe. Jixwe meraq û

heyîrîn di tebîeta mirovan de hene. Ev herdu hest her ku zêdetir dibin mirov zêdetir difikre û dipirse. Bi vî awayî ji alîyê bidestxistina agahîyên nû ve zarok pêş ve diçe.

Agahîdayîn an jî agahdarkirin fonksîyoneke gelekî giring ya edebîyatê ye. Herwisa di edebîyatê de hêzek heye ku bi wê hêze hiş û fikrên mirovan geş dibe, fireh dibe, pêş ve dibe. Li gorî Arîsto tiştê ku mirovî dikşîne berhemeke hunerî xwestina hînbûnê ye. Di edebîyata zarokan de fonksîyona agahîdayînê bi perwerdeya fikr û ramanên zarokan pêk tê (Karagül, 2019: 343-335). Herwisa bi xwendina berhemên edebî di zarokan de ji alîyê bidestxistina agahîyan ve dewlemendî çêdibe û bi xwendina berheman ve ji alîyê geşedana zimanî ve pêşveçûn çêdibe. Bi saya vê fonksîyona edebîyatê, edebîyata zarokan ji bo perwerdeya zarokan hatîye bikaranîn. Jixwe em dizanin ku rola edebîyatê ya li ser perwerdeya zarokan pir zêde ye ji ber vê jî gelek berhemên dîdaktîk ên zarokan hene.

1.3.3. Di Perwerdeya Zarokan de Rola Edebîyata Zarokan

Çi devkî çi nivîskî edebîyat bi bikaranîna zimanekî pêk tê. Çi civakên ku giringî dane zimanê xwe giringî dane edebîyatê jî. Lewre ji diroka mirovahîyê heta îro zarokan ji mezinan neqilkirin û veguhestin kirine. Ji ber vê jî rola edebîyatê ji bo hînbûna zimên û neqilkirina ji bo nîşê piştî xwe roleke mezin dilîze. Civatên bi vê yekê hesiyane ji bo perwerdeya zarokan edebîyat bi kar anîne. Wisa ku berhemên edebî yên ji bo perwerdeya zarokan hatine bikaranîn ji ber hewcebûyîna vê yekê derketîye meydana (Güler, 2014: 8).

Aytaş jî derbarê vê mijarê de dibêje: edebîyata zarokan geşedana zimanê zarokan hêsantir dike. Zarok zimanê ku dibihîsin hîn dibin. Atmosferên ji bo geşedana zimanê zarokan çiqas zêde bin dê zarok ewqas zû hîn bibin. Digel hînbûna zimên di hînbûna xwendinê de jî edebîyata zarokan roleke giring dilîze (Aytaş; 2003: 157).

Herwiha ji bo xwendina zarokan pêş bikeve û xwesteka xwendinê bi zarokan re peyda bibe jî edebîyat roleke mezin dilîze. Wisa ku xwendin gelek derîyan vedike. Ji ber vê jî li dibistanan elimandina pirtûkxwendinê gelekî giring e. Lewre gelek xwendekar pirtûkan naxwînin an jî pir kêr dixwînin ji ber vê jî bikaranîna edebîyatê di dersan de pir giring e. Bi bikaranîna edebîyatê re zarok dê zêdetir pirtûkan bibînin û nas bikin. Bi vî awayî dê zarok bi tecrûbeyên xwe bizanin ka dê çawa li ser berhemeke edebî bixebitin (Arkılıç Songören, 2011: 84).

Civatên ku dixwazin zarokên wan çand û zimanê wan bizanin û hînî nifşê din ê piştî xwe bikin, dîsa edebîyatê bi kar tînin. Him dewlet him jî civak ji mirovan hin tevgeran hêvî dikin û li gorî wan ev tevger di serdema zarokatîyê de ango di serdemeke krîtîk de pêk tê. Ji ber vê jî civat edebîyatê bi kar tînin (Güler, 2014: 8). Wisa be em dikarin bêjin civat edebîyata zarokan ji bo hînbûna nîrx û tevgerên ku li gorî civakê guncav in bi kar tîne.

Di dîroka edebîyata zarokan de berhemên dîdaktîk hertim hebûn. Dema me behsa destpêka edebîyata zarokan kir me gotibû di sesdsela 16em de kilîseyê nedixwest di perwerdeyê de edebîyat were bikaranîn. Kesên li hember vê berteka kilîseyê derketibûn di edebîyatê de digel hînkirinê edebîyat ji bo kêf û coşê bi kar anîn. Lewre muxatabê edebîyata zarokan zarok in, zarok hê di serdema lîstina lîstikan de ne ji ber vê, berhemên xwerû agahî dê zarokan biwestîne û aciz bike. Loma berhemên edebî yên ji bo perwerdeyê tên bikaranîn digel hînkirina tiştekî divê di nava xwe de xweşî, kêf û coş ê bihewîne (Güler, 2014: 8).

Li gorî Aytaş bi awayekî serkeftî hîlbijartina berhemeke edebî û bi xwendina wê berhema edebî zarok dê bigihêje van armancan:

1. Xwendekar tiştên dixwînin dê zû û rast fêhm bikin, herwisa dê hînbûna xwendineke sirûştî û watedar bi dest bixin.
2. Di gelek mijaran de, dê eleqeya xwendekaran zêde bibe û dê xwendekar tûrikê xwe yê peyvan dewlemend bikin.
3. Dê xwendekar bigihêjin takekesîyeke baş û dê welatekî baş bi dest bixin.
4. Xwendekar bi rêya nîşandana alîyê xweşîkî ya berhemeke edebî dê li nîrxên estetîkê bifikire.
5. Bi xwendinê, hessasîyeta serdema zarokatîyê ya xwendekaran dê bi awayekî erênî bê piştgirîkirin.
6. Xwendekar dê di mijarên cuda de agahîyan bi dest bixin. Qebîlîyeta bi saya xwendinê zanistî hatine bidestxistin dê pêşvetir biçin.
7. Xwendekar dê ji bo berhemên serkeftî daxwazker be û dê kêfa wan ji wan berheman were. Bi wî awayî elimîna xwendinê dê were bidestxistin.

8. Dê di zarokan de sewda û hezjêkirina pirtûkan çêbibe û dê zarok bixwazin pirtûkên wan hebin (2003: 157).

Di perwerdeya zarokan de bikaranîna edebîyata zarokan tesîreke mezin li ser pêşveçûna zarokan çêdike. Civakên bi vê yekê hesîyane ji bo geşedana zarokan bi awayekî hessas berhem nivîsandine û ji bo zarokan berhemên guncav hilbijartine.

Derbarê giringî û bikaranîna edebîyata zarokan de Öztürk û Öztürk wiha difikirin: piştî hevnasîna zarokan bi pirtûkan re çêdibe hewcedarîya zarokan bi edebîyatê çêdibe. Lewre dewlemendbûna hest û ramanê zarokan bi edebîyatê çêdibe. Ji bo ku ev hewcedarîya zarokan were cih divê di destpêkê de pirtûkên hatine hilbijartin hêja û biwesf bin. Herwisa divê li gorî temen û asta geşedana wan bin. Ji ber vê jî taybetmendiyên edebîyata zarokan giring in (Öztürk û Öztürk, 2021: 139).

Weku hate daxuyandin edebîyata zarokan di perwerdeyê de bi awayekî eşkere tê bikaranîn û ji aliyê geşedana zarokan ve roleke mezin dilîze. Lê ji ber ku edebîyata zarokan ji bo zarokan e, divê edebîyata zarokan li gorî hin taybetmendiyên diyar pêk were. Pirtûkeke ji bo zarokan hatîyê nivîsîn ne li gorî temen û ne li gorî asta têgihiştina zarokan be dibe ku negihêje armanca xwe.

1.3.4. Taybetmendî û Wesfên Edebîyata Zarokan

Zarok ji aliyê zihn û hizra xwe ve ji mezinan cuda ne û zarok jîyanê li gorî fizyolojî, psikolojî û li gorî hest û ramana xwe watedar dikan. Ji ber vê jî edebîyata ji bo zarokan tê avakirin divê ji ya mezinan cuda be. Weku me behs kiribû pirtûkên ji bo zarokan tînin nivîsandin divê li gorî asta têgihiştina zarokan be û divê xwestek û eleqeya zarokan neyê pişguhkirin. Li vir divê behsa zimên jî bê kirin ku li gorî Arıcı ziman taybetmendîyeke giring a edebîyata zarokan e û diyardeya berhemê ji aliyê hêjabûna wê ve nîşan dide. Ziman û vegotina di berhemê de tê bikaranîn divê zelal be û li gorî asta geşedana zarokan be (2016: 48).

Li gorî Arıcı berhemeke edebîyata zarokan divê di nava xwe de hin taybetmendîyan bihewîne ku ew wan wiha rêz dike:

1. Berhemeke edebî ya ji bo zarokan hatîye nivîsîn divê bikare zihn û bergehê zarokan veke.

2. Divê ew berhema ji bo zarokan hatîye nivîsandin, mirovahîyê, jîyanê û dinyaya zarok tê de dijîn bi zarokan bide naskirin û bi zarokan bide hezkirin.
3. Divê berhem di wê hewldanê de be ku hestên estetîk û xweşik li zarokan peyda bike.
4. Berhem divê hest û raman û hêza xeyalkirina zarokan pêş ve bibe.
5. Berhema ji bo zarokan hatîye nivîsîn divê wê derfetê bide ku zarok bikaribin bi çavekî rexneyî li wê berhemê binêrin
6. Divê berhem alîkarîya zarokan bike ku zarok bikaribin xwendin, guhdarkirin, xebirdan û qebîlîyêtên nivîsandinê bi pêş bixin.
7. Divê ji bo hînbûna zimanê dayîkê alîkar be û bikaribe zedetir peyvan bi wan bide hînkirin.
8. Berhemên ji bo zarokan hatine nivîsandin divê têkildarî wê çand û medenîyetê be ku zarok tê de dijîn.
9. Di berhemê de peyama ku dixwaze were dayîn divê bi rêya hiskirinê were dayîn.
10. Divê di berhemê de vegotinên polîtîk û beralîkirina fikrên polîtîk tunebin. (Arıcı, 2016: 48-50).

Li gorî Şirin sê têgehên serekê yên edebîyata zarokan hene: Nêrîna zarokan, îzafiyeta zarokan û rastîya zarokan. Ev hersê têgeh hev temam dikin û piştgirîyê didin hev. Şirin van hersê têgehên ku ji bo pîvanên di edebîyata zarokan de tên bikaranîn wekî mifteyêkê dibîne (Şirin: 2016: 23). Ango pîvanên di edebîyata zarokan de tên bikaranîn divê li gorî van têgehan werin bikaranîn.

Rastîya zarokan bidestxistina cudabûna zarokan a ligel mezinan e, îzafiyeta zarokan ji bo zarokan bikaranîna zimên û vegotineke guncav e. Rastîya zarokan mijar tevger û hessesîyeta aîdî xweserîya gerdûnîya zarokan di nava xwe de dihevin. Herwiha tiştê rengê xwe dide edebîyata zarokan helwesta nivîskar ya li ser îzafiyeta zarokan e û nêzîkbûna nivîskarî ya li ser rastîya zarokan e (Şirin: 2016: 23).

Li gorî Çelik û Fîrat rastîya zarokan, nêrîna zarokan ya li ser jîyan û dinyayê, têgihîştin, xwestek û eleqeya zarokan dihevwîne. Bi xwendina berhemên ku bi rastîya zarokan hatine nivîsîn zarok dê bi awayekî mentîqî li ser bûyer û rewşan tevbigere (2020: 95). Nivîskar bi bikaranîna rastîya zarokan, zarokan nêzî rastîyan dike. Wisa ku edebîyat jêdera xwe ji rastîya jîyanê distîne. Ji ber vê jî edebîyat çawa ku alîyên jîyanê ên xweş pêşkêşî zarokan dike divê alîyên nexweş ên jîyanê jî piştguh neke (Şen, 2012: 12).

Berhemên ji bo edebîyata zarokan tên nivîsandin ji gelek alîyan ve divê ji bo zarokan guncav bin. Ev guncavbûn wekî îzafiyeta zarokan tê binavkirin ku di edebîyata zarokan de îzafiyeta zarokan rewşa guncavbûnê eleqe, pêwîstî, asta geşedanê, qebîliyeta zihnî û nêrîna li ser jîyanê ya zarokan e (Öztürk û Öztürk 2021: 140). Wisa be dikare bê gotin ku tiştê berhemeke edebîyata zarokan giring û hêja dike bikaranîna van pîvanan e.

Li gorî îzafiyeta zarokan berhemên edebîyata zarokan divê li gorî heyama geşedanê be, ji alîyê naverok û zimên ve li gorî temenê zarokan be. Herwiha naveroka berheman divê li gorî rastîya zarokan be û divê ji alîyê reng û wêne û ahangê ve hişmendîya estetîkê çêbike (Güleryüz, 2003, vghz. Karaağaç û Alikılıç, 2023: 61).

Li gorî Sever, ji bo ku pirtûkên zarokan li ser fikr û ramana dinyaya zarokan tesîrê çêbikin divê ew ligel wesfên wekî dîtbarî û zimanî xwedî hin taybetmendîyên din bin. Ev taybetmendî; naverok û rûxsarîya berhemê ne (Sever, 2019: 120). Divê bê daxuyankirin ku taybetmendîyên berhemên zarokan ji alîyê naverok û rûxsarê ve divê li gorî îzafiyeta zarokan bîn dîyarkirin.

1.3.4.1. Ji Alîyê Naverokê ve Taybetmendîyên Berhemên Edebîyata Zarokan

Zarok li gorî nêrîn û mentîqa xwe li jîyanê dinêrin. Ji ber vê jî berhemên ji bo edebîyata zarokan tên nivîsandin ji alîyê naveroka xwe divê bala zarokan bikişîne. Berhemeke zanistî û giran dibe ku tu tesîrê li ser zarokan çêneke. Wisa ku berhemên edebî ji kîjan temenî re hatibine amadekirin jî divê demxweşîyekê bide xwendevanê xwe û coşîyeke edebî bi wan re çêbike. Her çiqas berhem ji alîyê dîtbarîyê ve têr û tîjî be jî ku di naveroka wê de kêmasî hebin ew berhem wekî “berhema edebî” nayê dîtin (Yıldız, 2017: 12).

1.3.4.1.1. Mijar

Mijar di nava berhemê de bi me dide zanîn ka berhem behsa çi dike. Di edebîyata zarokan de mijarên hatine hilbijartin divê li gorî asta têgiştina zarokan bin. Herwisa divê têkilîya mijarê bi jîyana rojane ya zarokan re hebe û divê temenê zarokan were berbiçavkirin (Nas, 2014: 63).

Yalçın û Aytaç derbarê mijarên berhemên zarokan de heman tiştî dîyar dikin û dibêjin divê têkilîya mijaran bi jîyana rojane re hebe û ji alîyê rastîyan ve divê guncav bin. Divê di berhemên de peyamên tîn dayîn li gorî rastîya cihê ku lê dijîn be (2016: 88).

Serpil Ural dibêje çîrok û çîrçîrokên ji bo zarokan tîn nivîsandin divê dawîya wan bi şabûnê xilas bibe. Herwiha di berdewama gotinên xwe de Ural dibêje divê mijara berhemên zarokan wisa werin honandin ku bila tê de tevlihevî, gengeşî û problem hebin lê dibêje divê di dawîyê de werin çareserkerin û bi xweşî û şabûnê xilas bibin. Lewre zarok ji ber temenê xwe yê biçûk têkçûyîna qebûl nakin. Ji ber ku zarok têkilîyekê di navbera xwe û şexsên berhemên de çêdikin û dikevin bin tesîra wan. Bê guman ji ber van tiştan di nava jîyanê de dikare bê behskirin lê divê li gorî pîvanekê were behskirin (Ural, 1988, vghz. Nas, 2014: 63).

Derbarê mijarên berhemên edebîyata zarokan de Şirin jî wiha dibêje: divê di nava berhemên zarokan de gotinên sîyasî û polîtîk nebin; ew pirtûkên zarokan ên dikevin nava problemên civakî bi kîjan nêrîna dinyayê be bila bibe ew ne pirtûkeke baş e. Ango divê mijara berhemên edebî yê zarokan ji polîtîka û sîyasetê dûr be (Şirin, 2007: 42).

1.3.4.1.2. Tema

Di nava berhemê de tema fikra bingeîn a mijarê ye. Nivîskar herî zêde li ser temayê difikire. Li gorî Yalçın û Aytaş temayên ji bo zarokan hatine hilbijartin divê rastîyên exlaqî yê gerdûnî hînî zarokan bike. Herwiha divê takekesî û nasnameya zarokan pêşve bibe. Bi vî awayî zarok di nava civakê de dê bibin kesên rêzdar û serkeftî (2016: 85)

Li gorî Nas tema divê vekirî û dîyar be. Divê ji alîyê hest û ramana zarokan ve rengvedana dinyaya zarokan bide. Herwisa divê temayên wekî hezkirina sirûştê, malbat, heywan û xwestina jîyînê were bikaranîn (Nas, 2014: 63).

1.3.4.1.3. Şexs/Kesayet

Kesên ku nivîskar di berhemên xwe de afirandine wekî şexs an jî keseyat tên binavkirin. Di berhemên zarokan de gelek caran şexs tenê mirov in, di gelek berhemên zarokan de heywan jî wekî şexs tên bikaranîn.

Şexsên di çîrok an jî çîrçîrokan de herî zêde divê çar kes bin û ev dikarin bibin mezin, zarok, heywan, amûrek an jî mekîneyek (Gönen, 2001: 58).

1.3.4.1.4. Ziman û Vegotin

Di berhemên zarokan de ziman û vegotin du hêmanên gelekî giring in. Lewre asta têgihiştina zarokan ji ya mezinan cuda ye. Zarok ji alîyê zimên ve xwedî kêmasî ne û vegotina berheman divê li gorî peyvzanîna zarokan be.

Nas, taybetmendiyên zimên û vegotinê wiha rêz dike.

1. Berhem divê bi zimanê axaftinê bê nivîsandin.
2. Ji ber ku dê berhem bi deng bê xwendin divê dema ku hat xwendin xweş were guhê zarokan. Ji ber vê divê bi awayekî rîtmîk bê nivîsandinê.
3. Divê nivîskar dema berhemê dinivîse şaşîyên rastnivîsî û rêzimanî neke
4. Divê qebîliyeta zarokan a ziman û vegotinê pêşve bibe (Nas, 2014: 66).

1.3.4.1.5. Honak/Plan

Honak di nava berhemekê de bi awayekî rêk û pêk bicihkirina mijar, şexs û temayê ye (Yalçın û Aytaş, 2016: 91). Berhemeke ku ji bo zarokan hatibe nivîsandin eger bi honakeke baş hatibe nivîsandin bûyer, hest û fikir dê hevdû bişopînin.

Di berhemên edebîyata zarokan de honak an jî plan divê ji bo têgihiştina zarokan bibe alîkar. Herwiha divê teknîkên vegotinê yên ku têgihiştinê zehmet dikin neyên tercîhkirin. Honak divê di nava têkilîya sedem û encamê de were pêkhatin û divê tevlihevîyê çêneke. An na dê berhem ji alîyê muxatabê xwe ve neyê fêmkirin (Aydın û Uzun, 2020: 321).

1.3.4.2. Ji Alîyê Rûxsarê ve Taybetmendîyên Berhemên Edebîyata

Zarokan

Tiştê ku dixwaze tesîrê çêbike divê pêşî balê bikişîne. Di berhemên zarokan de rûxsar biqasî naverokê giring e. Lewre divê pêşî balê bikişîne. Ji ber vê jî divê berhemeke edebîyata zarokan pêşî xîtabî çavên wan bike. Li gorî Nas taybetmendîyên fîzîkî ên berhemên edebîyata zarokan hezkirina zarokan ya li ser pirtûkan zêde dike. Lewre zarok pêşî giringîyê dide şiklî (2014: 66).

Eremektar derbarê rûxsara berhemên edebîyata zarokan de wiha dibêje: Berîya ku mirov pirtûkan bi zarokan bide xwendin divê pêşî wisa bike ku bala zarokan bikişîne ser pirtûkan. Divê pirtûkên di refên pirtûkxaneyan de disekinin mîna kûlîlkên rengîn balê bikişînin da ku moz werin hingîvê (1989, vghz Nas, 2014: 66)

Li gorî çavkanîyên berdest hin hêmanên rûxsarî yê edebîyata zarokan dikare wiha were rêzîkirinê:

Firehî: Divê ji alîyê firehîya xwe ve bikarbibe were hilgirtin. Lê ji bo ku bala zarokan bikêşe dikare firehîya wan cuda be. Li gorî Sever di serdemên zarokatîyê yê pêşî de ji bo zarokan berhemên ji alîyê firehîya xwe ve cuda dikarin werin bikaranîn (2019: 121).

Cîltkirin: Bi cîltkirina pirtûkê pirtûk dê ji bo demeke dirêj bikaribe were bikaranîn. Bi vî awayî dê tesîreke erênî li ser têkilîya pirtûk û zarokan çêbibe (Aydın û Uzun, 2020: 321).

Berg: Bergên pirtûkê hêmana pêşî ye ku balê dikişîne ser pirtûkê. Sêwirandina pirtûkê çiqas xweşik be pirtûk dê bala xwîneran ewqas zêde bikişîne ser xwe. Ji ber vê jî reng û wêneyên li ser bergên pirtûkan divê muheqeq zewqeke estetîk bidin. (Aydın û Uzun, 2020: 321)

Cînsê Rûpelan: Li gorî Nas yek an jî du hevîrê kaxîzê divê were bikaranîn û divê kaxîz neteyise û divê çavê zarokan newestîne.

Rêkûpêkiya Rûpelan: Nivîs divê li ser rûpelan di sitûnekê de werin nivîsîn û divê di koşeyên rûpelan de valahîyên guncav hebin (Nas, 2014: 66).

Herf: Ji alîyê firehîya xwe ve herf divê ji bo xwîneran guncav be. Herwiha divê stîleke harfan were hilbijartin ku tesîreke nerênî çêneke. Ji ber ku herf tesîrê li ser xwendinê dike divê li gorî asta geşedana zarokan were bikaranîn.

Bikaranîna Wêneyan: Di berhemên zarokan de bikaranîna wêneyan giring e. Lewre pirtûkeke ku bi wêneyan hatibe nivîsandin dê xeyalkirina zarokan zindîtir bike, metin dê watedartir bibe û dê dewlemendtir bibe (Aydın û Uzun, 2020: 321).

Weku dîyar e berhemeke ku ji bo zarokan tê nivîsandin li gorî gelek qeyd û bendan divê were nivîsandin. Ji gelek alîyan ve zarok ji mezinan cuda ne û divê bi awayekî hessas li gorî temen, asta têgihiştin û asta bikaranîn û fêmkirina zimanê zarokan were nivîsandin.

Sever jî di pirtûka xwe ya bi navê *Çocuk ve Edebîyatê* de behsa taybetmendiyên edebîyata zarokan ji alîyê rûxsar û naveroke kirîye. Taybetmendiyên rûxsar û naveroka berhemên edebîyata zarokan li gorî Sever divê bi vî awayî werin nivîsandin:

1. Di berhemên edebîyata zarokan de nivîskar li şûna ku şîretê bide divê zarokan bide fikirîn û digel fikirkirinê divê di nava kêf û coşê de bin.

2. Di vegotinê de divê şaşîya mentiqê tunebe. Ji bo geşedana exlaqa zarokan wisa neyê nîşandan.

3. Di pirtûkên zarokan de divê cihêkarîya jin û mêra neyê kirin. Di nava jîyanê de rola jin û mêran divê wekî hev bîn nîşandan.

4. Di pirtûkan de li şûna helwestên otorîter divê tevgerên demokratîk werin pêşkêşkirin.

5. Pirtûkên ji bo zarokan hatine nivîsîn divê giringîya çanda demokrasîyê ji bo kes û civakê bi zarokan bide hîskirin.

6. Di pirtûkan de divê cezayên şanazîyê dişkînin neyên pejirandin û zarok divê li ser şaşîyên hatine kirin bikaribe bifikire .

7. Pirtûk divê piştgirîyê bide geşedana têgihan û têgihiştina zarokan. Divê pirtûk piştgirîyê bide geşedana têgeha takekesî û hestên ewlehîyê bi zarokan re çêbike. Bi pêşvebirana takekesîya zarokan divê zarokan di nava jîyanê de bike hevkêş.

8. Divê pirtûk xwe ji telqînên pêşdaraz, îdoelojî, dinî û polîtîkayê pîbarêze û divê zarokan ber bi bawerîyên vala nebe.

9. Pirtûk divê taybetmendîyên zarokan pêşve bibe (2013: 66).

Li gorî taybetmendî û wesfên edebîyata zarokan divê bê daxuyankirin ku edebîyata zarokan ji bo geşedana zarokan roleke mezin û giring dilîze.

1.4. Edebîyata Kurdî ya Zarokan

Hişmendîya çêkirina edebîyateke birêkûpêk ji bo zarokan li cîhanê gelek dereng dest pê dike. Di kurdî de jî rewş bi vî rengî ye. Li cîhanê tevî sedemên derengmayîna edebîyateke xweser ji bo zarokan, di kurdî de jî sedemên civakî, politîk, siyâsî û qedexeya bi sedan salan a li ser zimanê kurdî jî tev de, nehêlaye pêşveçûnek di edebîyata kurdî ya zarokan de çêbibe.

Herwiha nimûneyên pêşî yê berhemên edebîyata zarokan cureyên folklorîk ên wekî çîrok, çîrçîrok, zûgotinok, lorî û hwd. in. Ji mezinan bi devkî ev cure hatibûn veguhestin û nîfş bi nîfş berdewam kiribûn. Divê bê gotin ku zimanê kurdî di vî warî de xwedî ziman û çandê dewlemend e. Bi zargotineke dewlemend zarokên kurdan ji mezinan gelek çîrok, tiştanok, zûgotinok guhdar kirine û ev çand nîfş bi nîfş heta roja me hatîye.

Piştî hişmendîya çêkirina edebîyata zarokan li civatan peyda bû di gelek civatan de berhemên folklorîk ji aliyê hin nivîskaran ve hatin berhevkirin û derbasî nivîsê bûn. Li Îngiltereyê weku me behs kiribû berhemeke bi navê *Mother Goose* (Maka Qaz) ji aliyê John Newrbey ve bi berhevkirina berhemên folklorîk ji nû ve ji bo zarokan hat nivîsîn. Heman tişt li Franseyê ji aliyê Charles Perrault pêk hatîye ku dîsa bi berhevkirina berhemên gelêrî ji bo zarokan pirtûkek hatîye nivîsîn. Di kurdî de jî berhemên bi vî rengî hene ku yek ji wan berheman pirtûka Zinarê Xamo ya bi navê *Hebû Tunebû! Antolojîya Çîrokên Zarokan* e. Zinarê Xamo derbarê berhema xwe de wiha dibêje:

Ev çîrokên gelêrî ne. Yanî malên gel in û miheqeq berî min jî yekoyek li hin deran hatine gotin an jî weşandin. Lê wekî straneke gelêrî, wekî pêkenînekê her kesî bi hawakî û bi devoka xwe gotîye. Min jî bi salan ew berhev kirin, li gor zanîna xwe şirove kir û di vê berhevokê da civandin. Heta ji min hat min zimanekî sade û rewan, ji bo ku zarok kanîbin jê fam bikin, bi kar anî (Xamo, 2014: 8).

Berhemên edebîyata zarokan herçiqas hîmê xwe ji hêmanên çandî û gelêrî standibin jî, gelek civak di bin bandora hevdu de mane û berhemên pêşî yê edebîyata

zarokan bi wergeran hatine amadekirin. Gelek civatan çîrokên Ezopê yewnan û fablên La Fontaine wergerandine û bi şeweyeke cuda bi kar anîne. Di kurdî de jî berhemên bi vî rengî tên dîtîn. Bo nimûne, hin çîrokên Ezopî ji aliyê 'Ezîz Gerdî ve hatine wergerandin ji bo ser kurdîya soranî û di sala 1982yê de hatine çapkirin. Herwiha ji aliyê Sidîq Gorîcan jî hatine wergerandin ji bo kurdîya kurmançî û di sala 2013yê de hatine çapkirin (Qader, 2016: 5).

Herwiha di kurdî de ji bo zarokan ferhengên duzimanî hatine amadekirin ku ev berhem ewilîn berhemên zarokan tên hesibandîn. Li gorî çavkanîyên berdest ewilîn berhema ji bo zaroka hatîye nivîsîn ferhengeke duzimanî ya bi navê *Nûbihara Biçûkan* e. Ev berhem di sedsala 17em de ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatîye nivîsîn. Wê demê weku Suvağci jî gotîye, bîgehê edebîyata kurdî ya zarokan xwe dispêre ferhengên klasîk ên duzimanî, berhemên dînî yên zarokan, folklorê kurdî û wergerê (Suvağci, 2020: 71).

Di vê kêlîyê de divê behsa medreseyan kurdan bê kirin ku berhemên wekî *Nûbihara Biçûkan* di van medreseyan kurdan de ji bo perwerdekirina zarokên kurdan hatine bikaranîn. Medreseyan kurdan ji bo kurdî pir birûmet û giring in. Lewre ji bo hînkirina zimanê farisî û erebî, ji bo hînkirina ilmên dînî û ilmên pozîtîf roleke mezin dilîze. Di medreseyan kurdan de zimanê perwerdeyê kurdî bû. Zanayên kurd pirtûkên dersê bi kurdî dinivîsandin. Pirtûkên erebî jî bi şiroveya kurdî dihat dayîn. Wuhareng ev sazîyên perwerdehîyê bûbûn devera bicihanîna tore, tevger û rêveçûna kurdeyatîyê jî (Zinar, 1993: 10). Di van medreseyan de zarokên kurd hîn ilmên pozîtîf û dînî bûne, edet û zimanê kurdî hîn bûne.

Gelek berhemên edebîyata kurdî ya klasîk di van medreseyan de dihatin xwendin. Hin beşên dîwanan, mewlûd, eqîde û ferhengên menzûm, ji wan berheman in. Ji wan eqîde û ferhengên ji bo zarokan hatine nivîsandin hêjayî behskirinê ne.

1.4.1. Berhemên ku di Serdema Klasîk de ji bo Zarokan Hatine Nivîsîn

1.4.1.1. Nûbihara Biçûkan

Nûbihara Biçûkan, yekemîn ferhenga kurdî ya menzûm, di heman demê de, di kurdî de yekemîn berhema edebîyata zarokan tê hesibandîn. Ji aliyê Ehmedê Xanî ve di sala 1683yê de hatîye nivîsîn. Ferheng Erebi-Kurdî û Kûrdî-Erebî ye. Ferheng bi mebesta ku di sîstema medreseyan de ji bo pêwîstîyên zarokên kurdan bi zimanê erebî

bibe bersivek hatîye nivîsandin. Dema zarokên biçûk piştî xilaskirina Qur'ana pîroz dest bi xwendina pirtûkên erebî dikirin gelekî zehmetî dikişandin. Xanî ji bo ku xwendekarên kurd di destpêkê de fêrî peyvên sereke yên erebî bibin ev ferheng nivîsandiye. Xanî navê berhemê û armanca nivîsandina vê berhema xwe wiha anîye ziman:

Vêk êxistin Ehmedê Xanî

Navê Nûbihara Biçûkan lê danî

Ne ji bo sahip rewacan

Belkî ji bo biçûkêd kurmancan (Adak, 2015: 254)

1.4.1.2. Gulzar

Gava mirov li metnên di yên ji bo zarokan hatine nivîsîn dinêre, tesîra Xanî di hîlbijartina metnan de jî xuya dike. Wisa ku ji alîyê şagirdê Ehmedê Xanî, Îsmailê Bazîdî (1655-1710) ve ji bo zarokan bi navê *Gulzarê* ferhengeke kurdîya kurmancî, erebî û farisî hatîye çêkirin. Ev ferheng di tarîxa edebîyata kurdî de ferhenga menzûm a duyem e ku di sedsala 18em de hatîye nivîsîn (Tek, 2019; Adak, 2015; Pertev, 2012). Pertev derbarê *Gulzarê* de wiha dibêje:

Derbarê *Gulzarê* de mixabin agahîyên tekûz û berfireh li ber destê me nînin. Li gorî agahîyên ku li ber dest in, taybetîyên *Gulzarê* bi vî awayî ne:

- 1) Ferhengeke Kurdî-Erebî-Farisî ya bi sêzimanî ye.
- 2) Di medreseyên kurdî de wekî pirtûkeke dersê hatîye xwendin.
- 3) Bi giranî devoka Hekarî û Bazîdê bi kar anîye (Pertev, 2012: 24-25).

1.4.1.3. Luxetnameyî Ehmedî

Luxetnameyî Ehmedî sed salî piştî Nûbihara Biçûkan, di sala 1790î de ji alîyê Şêx Marûf Nodeyî (1753-1837) ve hatîye nivîsîn. Ferheng bi Kurdî (sorani)-Erebî ye (Pertev, 2012: 25). Şêx Me'ruf Nodeyî sedema nivîsandina vê berhemê di destpêka berhemê de, di beyta heftem de dîyar dike ku ji bo lawê xwe Ehmed amade kirîye. Herwiha di medreseyên kurdan de jî cihekî taybet digire. Di van beytan de em armanca amadekirina ferhengê dibînin:

Ta kî ferzendem Ehmed bê te'eb

Şewed danayê luxatê 'ereb (Boleli û Ertekin, 2017: 30)

1.4.1.4. Mîrsadu'l-Etfal

Ferhengeke menzum a dî ku ji bo zarokan hatîye nivîsandin *Mîrsuda'l-Etfala* Mihemed Kerbelayî ye ku bi giştî ji bo temamê zarokên kurdan û bi taybetî jî, ji bo birayê xwe Muhemmed Eskerî û birazîyê xwe Neqşibendî nivîsandîye. Ev berhem di sala 1912yê de hatîye nivîsandin (Boleli û Ertekin, 2017: 30).

Mîrsadu'l-Etfal, ferhengeke menzûm a Kurdî-Farisî ye. Ji destpêkekê û 15 beşan (qit'e) pêk tê. Beşa dawîyê berovajî yên berê xwe bi sernav e û sernavê wê *Metlebu'l-Murekkebat* e. Du navên vê berhemê hene. Yek jê *Mîrsadu'l-Etfal* û yê din jî *Şahrahê Kûdekan* e. Mîrsad bêjeyeke erebî ye û wateya wê "cihê çavdêrîyê" ye. Etfal jî bêjeyeke erebî ye û pirjimara "tîfl"ê, yanî zarokê ye. Herdu bi hev re tên wateya "cihê çavdêrîya zarokan" an jî "nêrîngeha zarokan".

Kerbelayî, di destpêka berhemê de, piştî besmele, hemd û selewatan bi awayekî eşkere nav û sedema amadekirina berhemê dîyar dike. Kerbelayî, dûre behsa giringî û taybetîya zimanê farisî dike. Li gorî wî zarokên ku bi zimanê farisî zanibin dê di warê zanistî û edebîyatê de gelek serkeftî bin.

Ku da newrestegan û newnihalan

Melekûebêanê kurdan pur şepalan

Bikin seeyê di vê miraadê eqser

Bigîjin meqaed û rahê di enwer

Çikû ezmanê fursê pur ecîb e

Kesê ku zanibe aayet edîb e

Nebin bêbehre ez deryayê pur durr

Ji beorê fursê derxin gewherê pur (Pertev, 2012: 24-27)

1.4.1.5. Eqîdeya Mewlewî (1806-1882)

Di edebîyata kurdî ya zarokan de piştî ferhengên menzûm, eqîdenameyên menzûm hatine nivîsîn. Ev nêrît jî dîsa piştî *'Eqîdenameya Ehmedê Xanî* bûye 'adet û di medreseyan de wekî metnên mufredatê jî hatine dîtin. Li pey *'Eqîdenameya Xanî*, Mewlewî (1806-1882) jî 'eqîdenameyek nivîsiye (Tek, 2019: 53). Ev pirtûk ji 110

beytan pêk tê, zêdetir ji bo xwendevanên nû hatîye nivîsandin û di sala 1977ê de hatîye çapkirin (Ahmad, 2020: 129).

Berhemên di serdema edebîyata kurdî ya klasîk de ji bo zarokan hatine nivîsandin bi gelemperî ferheng û ‘eqîde bûn. Herwiha, helbestên di vê qonaxê de bi piranî teqlîda *Nûbara Biçûkan* bûne ku ji hêla naveroka xwe ve dikevin nav rastîya şiklî ya zarokan ku armanca wan a sereke perwerdekirin, nesîhetdayîn û şîretkirina zarokan bûye (Subaşı, 2021: 229).

1.4.2. Berhemên ku di Serdema Modern de ji bo Zarokan Hatine Nivîsîn

Di edebîyata kurdî ya zarokan de gavên biçûk û giring di serdema modern de hatine avêtin. Lê dîsa jî di serdema modern de, di warê edebîyata zarokan de qelsîyek berbiçav heye. Di pêşgotina berhema Zinarê Xamo ya bi navê *Hebû Tunebû ‘Antolojîya Çîrokên Zarokan* de jî tê daxuyankirin ku; ger Nûbara Ehmedê Xanî (1651-1707), alfebeyî Xelîl Xeyalî, Cedwela Lêkerên Kurdî ya Ebdurrehîm Rehmî û nivîs û çîrokên zarokan ku di kovar û rojnameyên wê demê de (Rojî Kurd, 1913) derketine nehesibînin, ji bo zarokan tiştekî nivîskî nehatîye amadekirin (Xamo, 2014: 4). Helbet sedemên vê qelsbûnê gelek in ku ya herî mezin sedema politîk e. Tek jî balê dikêşîne ser qelsbûna edebîyata zarokan û qelsbûna edebîyata kurdî ya zarokan wiha dinirxîne:

Di edebîyata kurdî de metnên ku bi muxetabîya zarokan hatine nivîsîn hebin jî, di navbera van metnan de salên dirêj derbas bûne û heta salên dawî bi kurdî qadeke wisa ya xurt çênebûye. Helbet sebebên gelek cuda hene ka çima bingeheke serketî pêk nehatîye. Berîya her tiştî, kurdan heta tarîxeke nêzik sazîyên giring ên perwerdehiyê û hunerî nebûne. Yê heyî jî zêde domdirêj nebûne. Ji ber wê jî şair û rewşenbîrên civata kurdan ji bo zarokên serdema xwe û nifşên piştî xwe -bi taybet jî ji bo zarokan- kêr berhem nivîsîne, yan yê li berdest kêr in yan jî ji wan kêr nimûne gihîştine îro (Tek, 2019: 53).

Li cîhanê peydabûna edebîyata zarokan bi hewcedariya edebîyateke xweser ji bo zarokan, derdikeve. Ev wekî rastîyeke edebîyata zarokan e. Dema ku hişmendîya “hebûna zarokan” peyda bû û zarokatî bû serdemeke giring a jîyana mirovan, edebîyateke xweser ji bo zarokan derket. Di kurdî de mixabin muxatab û xwînerên edebîyata zarokan tunebûn. Ji ber tunebûna xwîneran ne mimkun e ku edebîyata zarokan bi pêş bikeve. Herwiha jî ber ku mafê kurdan ê perwerdeyê heya îro jî nehatîye dayîn yan jî lokal û parçekirî bûye, xwînerîya di temenê zarokatîyê de jî gelek qels

maye. Bivê-nevê vê yekê tesîreke nerênî li geşkirina edebîyata kurdî ya zarokan kirîye. Digel vê tesîra nerênî bi taybetî li başûrê Kurdistanê ji ber hebûna perwerdeya fermî ya bi zimanê kurdî (sorani) hin rê û derî li pêş afirandina vê qadê vebûne, xisûsen ji aliyê helbest û çîrokan ve (Subaşî û yd., 2022: 120). Ji bilî başûrê Kurdistanê li Tirkîyê, Ewropayê, Îran, Sûrîyê û li Sovyetê jî ji bo edebîyata kurdî ya zarokan gavên biçûk û giring hatin avêtin.

1.4.2.1. Xebatên li Tirkîyeyê Hatine Kirin

Li Tirkîyeyê xebatên kurdî bi taybetî li Stenbolê hatine kirin. Ji ber ku li Stenbolê çapxane hebû, navenda ilm û zanîne Stenbol bû û gelek rewşenbîrên tirk û kurd li Stenbolê bûn. Ji aliyê rewşenbîr û zaneyên kurd ên li Stenbolê sazî û komele hatine avakirin. Herwiha ji aliyê wan sazî û komeleyan ve gelek rojname û kovar hatine çapkirin. Di nav van kovar û rojnameyan de bi taybetî yên ku ji bo zarokan derketibin, tunene. Lêbelê derbarê terbiye û pedagojîya perwerdeyê de ji bo dayik, bavik û mamosteyan hin nivîs hatine weşandin (Subaşî, 2022: 28).

Mirov dikare mînaka kovara *Rojî Kurd* bide ku di hejmareke kovarê de behsa perwerdeya zarokan tê kirin. Nivîs ji aliyê Evdîlkerîmê Silêmanî ve bi serenava *Mindal bo çi zû fêrî xwendinê nabî* (Zarok bo çi zû fêrî xwendinê nabin) hatiye çapkirin. Di nivîsê de perwerdeya zarokan a li Ewropa û ya kurdî tê berawirdkirin. Silêmanî di perwerdeya zarokan de pêşketina Ewropayê wekî mînaka pîvanê nîşan dide. Herwiha, nivîseke Doganê Bulxarîstanî û nivîseke Fikrî Necdetê Dîyarbekirî jî dîsa li ser giringîya perwerdeya zarokan dîsa di vê kovarê de hatiye çapkirin (Kartal, 2014: 62-63).

Di wê serdemê de li Tirkîyeyê bi taybetî ji bo zarokan kovar û rojname tunebin jî di hin beşên rojname û kovaran de ji bo zarokan hin berhem hatibûn dayîn. Bo nimûne li Stenbolê di kovara *Kurdistanê* de (1919) helbesteke bi navê *Delelîya Zarokan* ji aliyê kesekî bi navê Zîno ve hatiye nivîsîn ku ev berhem wekî yekem helbesta kurdî ya zarokan tê hesibandin. Wisa ku ev helbest paşê ji aliyê Celadet Bedirxan ve bi navê Emîn Alî Bedîrxan di sala 1932yê de, di kovara *Hawarê* de ji nû ve hate weşandin (Qader, 2016: 18).

Li gorî çavkanîyên berdest di çar hejmarên *Kovara Jînê* de ji bo zarokan helbest hatine nivîsîn. Kovara *Jînê* di payiza sala 1918ê de li Stenbolê dest bi weşanê kirîye.

Wisa tê zanîn ku organa nefermî ya Komela Pêşketina Kurdistanê bûye. *Jîn* 25 hejmar hatîne weşandin û ew bi kurdî û tirkî derketîye. Yek ji hozan û nivîskarên kovarê yên timî, hozan û nivîskarê gewre Pîremerd bûye. Tewfîqê Silêmanî (Süleymanîyeli Tevfik), Xelîl Xîyalî, Kemal Fewzî, Hîlmîyê Siwêrekî û Evdirehîm Rehmîyê Hekarî jî nivîskarên din ên vê kovarê bûn (Bozarslan, 1985: 9).

Hîlmîyê Siwêrekî jî ji bo zarokên kurdan helbesteke bi navê *Yekdeng* nivîsiye. Helbest di hejmara 25em de derketîye (Bozarslan, 1985: 81)

Evdirehîm Rehmî Hekarî jî di kovara *Jînê* de helbestên bi navê *Ji bo Nesla Têt, Nalîna Sêwîkî* û *Mirovînî* ji bo zarokan nivîsiye (Tek, 2019: 61-65).

Tevî van, *Le Ber Rohî Kurde Biçûkan* helbesta Lahûtî Xanî Kermansahî ye ku ji bo zarokan nivîsandîye û dîsa ji aliyê Hîlmîyê Siwêrekî ve helbesteke bi navê *Serê Sibê* ji bo zarokan di kovara *Jînê* de hatine nivîsandin (Yıldırım û yd., 2013: 64).

Pîştî avabûna Komara Tirkîyeyê derîyê nîvvekirî jî ji bo weşangerîya kurdî hat girtin, lewre pîştî avabûna Komara Tirkîyeyê gelek sazî û komele hatin belavkirin û xebatên weşangerîya kurdî sekinî. Weşanên dihatine kirin jî ne fermî bûn. Lê piştî qanûn guherîn û xebatên weşangerîyê çêbûn. Li gorî Subaşî (2022: 29), pîştî van guherînên qanûnî weşanên zimanê kurdî bi awayekî fermî careke din derketin pîyaseyê û heya roja îro di gelek babet û mijaran de weşan hatin kirin û weşanên zarokan jî pareke berbiçav derkete holê.

Lê berîya wê divê behsa du kovarên din jî were kirinê ku ev kovar xusûsen ne ji bo zarokan bin jî hin hijmarên wan an jî beşên wan ji bo zarokan hatine veqetandin û ji bo zarokan nivîs hatine nivîsandin.

Nûbihar (1992-): *Kovara Nûbiharê* wekî ku ji dîroka wê jî dîyar e kovarek emirdirêj e û kovareke çandî, hûnerî û edebî ye. Di hin rûpelên kovarê de tê dîtin ku nivîs û wêneyên ku ji bo zarokan hatine amadekirin hene. Li gorî çavkanîyên berdest beşa ji bo zarokan hatîye veqetandin sê caran guherîye. Di serî de bi navê “Zarokname” -amedekar Xelîl Amed- wekî çend rûpelên dawîya kovarê ji bo zarokan veqetandin û ev beş piştî bi navê “Zarokistan” -amedekar Sabah Kara- û herî dawî jî bi navê “Nûbihara Biçûkan” -amedekar Rojbîn Özkan- weşîya û bi tevahî 112 hejmar jê derçûn û dawî lê hat. Xwedîyê kovarê Süleyman Çevik e (Subaşî, 2017: 111).

Kovara Nûbiharê ji bo edebîyata zarokan roleke mezin û giring dilîze. Lewre ji destpêka derketinê heta 2010î ji bo zarokan çîrok, kurteçîrok, helbest, pêkenok, fabl, gotinên pêşîyan, karîkatûr û hwd. gelek tişt hatine weşandin.

Türkan Tosun xebateke berfireh li ser vê kovarê kirîye û li gorî wê: Armanca van nivîsan ew e ku him zarok bînin perwerdekirin û him jî dema wan xweş derbas be. Ji bo perwerdeyê di kovarê de bi gelemperî mijarên dînî, neteweyî û yên exlaqî hatine hilbijartin. Weke mînak: jîyana pêxember û sehabeyan, navdarên kurd, gotinên pêşîyan û hwd. Ji bo ku kêfa wan bê û ew wextên xwe derbas bikin jî pêkenok, karîkatûr, fabl û çîrok hatine weşandin (Tosun, 2017: 112).

Di vê kovarê de, di qismê zaroknamêyê de piranî nivîsên Xelîl Amedî, Rojbîn Özkan û Sabah Kara tên dîtin. Nivîsên derbarê jîyan û gotinên pêxemberan de di hejmarên 1, 9 û 11em de ji bo zarokan hatine nivîsandin. Herwiha, ji bo zarokan behsa navdarên kurd ên wekî Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Seîdê Kurdî hatîye kirin ku mirov dikare wan nivîsan di hejmarên wekî 37, 39, 108 û 109em de bibîne. Dîsa nivîseke derbarê exlaqê de, di hejmara 56em de ji bo zarokan hatîye nivîsandin. Derbarê perwerdeya dînê Îslamê de jî hin nivîs di hejmarên 8, 108 û 110em de ji bo zarokan hatine nivîsandin. Herwisa di hejmarên 36, 41, 42 û 110em de jî ji bo zarokan gotinên pêşîyan hatine nivîsandin û behskirin. Digel wan, di *Kovara Nûbiharê* de, hejmarên wekî 34, 35, 35 û 109em de jî ji bo zarokan behsa gotinên navdaran hatîye kirin. Herwiha dîsa ji bo zarokan behsa cihên dîrokî yên wekî Pira Malabadî û Medresaya Sor di hejmarên 107 û 109em de hatîye kirin. Tevî van nivîsan, di hejmarên 1, 7, 45, 47 (2 nivîs), 107, 108 û 111em de çîrok û di hejmarên 46, 47, 56 û 110em de ji bo zarokan çîrok û kurteçîrok hatine nivîsandin. Ji bilî van nivîsan di *Nûbiharê* de ji bo zarokan helbest jî hatine nivîsandin lê piranîya helbestan jî alîyê Sabah Kara ve hatine nivîsandin. Mirov dikare wan helbestan di hejmarên wekî 78 (2 helbest), 79 (2 helbest), 81 (2 helbest) û 82em (2 helbest) de bibîne. Ji bilî Sabah Kara di *Nûbiharê* de helbesteke Cegerxwîn jî di hejmarên 34 û 35em de cih girtiye. Herwiha di *Nûbiharê* de 19 pêkenok ji bo zarokan hatine nivîsandin. Ji van 16 lib jî alîyê Xelîl Amedî ve 2 lib jî alîyê Rojbîn Özkan ve libek jî ji alîyê M Êhsan Hêvîdar ve hatine nivîsandin. Ev pêkenok di van hejmarên *Nûbiharê* de hatine weşandin: 10, 34, 35, 36, 37, 38, 39, 40, 41, 42, 46, 107, 108, 111. Di *Nûbiharê* de 16 lib fabl jî bo zarokan di hejmarên 3, 4, 6, 9, 34, 35, 36, 47, 108, 110, û 111em de hatine weşandin. Karîkatûrek û danasîna

berhemekê jî di hejmarên 36 û 109em de ji bo zarokan hatine nivîsandin. Tevî van, du nameyên zarokan di hejmarên 111 û 112em de hatine nivîsandin. Nivîsek nasîna zarokan, nivîsek danasîna heywanan, metelokek, listikek, 2 mamik û 2 bîranîn dîsa di *Nûbiharê* de ji bo zarokan hatine nivîsandin. Ji aliyê Xelîl Amedî ve 10 dîyalog bi navê Rengîn û Xemgîn di hejmarên 34, 35, 38, 40, 41, 42, 45, 46, 48, 53, 54 û 56em de ji bo zarokan hatine nivîsandin (Tosun, 2017).

Wekî ku diyar e keda *Kovara Nûbiharê* ji bo edebîyata zarokan pir zêde ye. Herwiha di geşedan û pêşketina edebîyata kurdî ya zarokan de rolek mezin listîye.

Nûpelda (2009): *Kovara Nûpeldayê* kovareke çandî-edebî ye ku di sala 2009ê de li Wanê sê mehan carekê derdikeve. Di çend hejmarên *Nûpeldayê* de ji bo zarokan beşeke bi navê “Zarokname”yê hatiye veqetandin ku ji bo zarokan hin nivîsên têkelî zarokan dihevine.

Du nivîsên Rojbîn Özkan ji bo zarokan hatine nivîsandin. Herwisa Aynur Bozkurtê ji frensî çîroka Hans Chrîstîan Andersan a bi navê *Werdeka Biçûk î Nexweşik* wergerandiye kurdî. Meryemeyn Erayê ji farisî çîrokeke bi serenavê *Rizo û Hespê Reş* wergerandiye kurdî. Abdulkerim Çay bi serenavê *Zaroktiya Me* nivîsek nivîsandîye. Bedreddin Basuxuy jî dîsa ji farisî bi serenavê *Xweştirîn Mekanê Dinyayê* nivîsek wergerandiye kurdî. Ji bilî van nivîsan Azîze Yıldız fableke bi serenavê *Dûpişk û Mar* nivîsandîye. Bedreddin Basuxuy dîsa ji farisî fableke bi serenavê *Sulha Heywanan* wergerandiye kurdî. Herî dawîn Zafer Berdestî sê kurteçîrokên bi serenavên *Fêl Fêlên Perê Ne Sim Simên Kerê Ne, Şûmo û Sê Reng Sêv* berhev kirine û ew di *Nûpeldayê* de hatine weşandin (Tosun, 2017: 56).

Li Tirkîyeyê kovarên bi taybetî ji bo zarokan hatine amadekirin jî hene. Li gorî çavkanîyên berdest bi qasî 10 kovar bi taybetî ji bo zarokan hatine amadekirin. Ji wan *Sîm* (1988-?), *Zarokê Pêşeng* (1991) û *Dîlan* (1991) ne fermî ne û derbarê wan de zêde agahî nehatiye dîtin.

Herwiha di sala 2003yê de kovareke bi navê *Dergûş* ji aliyê Weşanxaneyê Warê ve hatiye weşandin. Pêşî wekî paşkoyeke *Kovara Warê* derketîye û tenê du hejmar weşîyane. Berpirsyar Seîd Veroj û Ramazan Pertev bûn. Di kovarê de ji aliyê Ramazan Pertev ve nivîseke bi navê *Malbat û Zarok*, ji aliyê E. Yusuf Eyyubî ve nivîseke bi

navê *Ser Zarokan Çend Gotin* û ji aliyê Seîd Veroj ve nivîseke bi navê *Espiye* ji bo zarokan hatine weşandin.

Kovareke din bi navê *Şemamokê* di sala 2005ê de li Dîyarbekirê hatîye weşandin. Kovar bi zimanê tirkî û kurdî heta sala 2010î li ser hev 7 hejmar weşîyaye. Edîtorên vê kovarê Sîdar Jîr û Rizo Xerzî ne. Kesên wekî Amed Tîgrîs, Ferhadê Îçmo, Sîdar Jîr, Îbrahîm Kurmanc, A. Seçkîn, Behlûl Zelal, Heyder Dîljen, Konê Reş, Tengezar Marînî û hwd. di vê kovarê de ji bo zarokan fabl, helbest, çîrok, xaçepirs, mamik, lihevanînok, zûgotinok nivîsandine û ji zimanê almanî, îngilîzî û swêdî werger kirine.

Dîsa bi navê *Dergûşê* kovareke din di sala 2008ê de ji aliyê Şaredariya Bajarê Nû ya Dîyarbekirê ve hatîye weşandin. Bi tenê hejmarek derçûye û Sîdar Jîr edîtorîya wê kirîye. Di vê kovarê de jî fabl, çîrok, helbest, hînkirina navê hewyanan û nebatan, xaçepirs, zûgotinok, mamik, gotinên pêşîyan û hwd. bi wêneyan ve hatine weşandin.

Tevî van, kovareke bi navê *Agirê Tûtê* li Dîyarbekirê ji aliyê Kurdî-Derê di sala 2011ê de hatîye amadekirin û weşandin û tenê hejmarek çap bûye. Nivîskarê kovarê Sîya Sîtav, Nesrîn Navdar û Rûken Xwezan in. Di kovarê de nasandina Celadet Bedirxan, helbesta demsala biharê, gotinên pêşîyan, gotinên navdaran, biwêj, çewtîyên axaftinê, pirsên mentiqê, taybetmendîyên ajalan, xaçepirs, karîkatûr, çîrok, fabl, lîstika agirê tûtê, nasandina bajarê Amedê, pêkenok û hwd. hatine nivîsandin.

Hejmara yekem a Kovara *Zarokên Rojê* di sala 2011ê de wekî Bultena Kurdî-Derê di demsala havînê de weşîyaye û wekî berdewama *Agirê Tûtê* tê hesabandin. Sêmhane li ser hev bi temamî 4 hejmar weşîyaye. Di kovarê de gelek çîrok, helbest, fabl, karîkatûr, tiştanok, zûgotinok, nasandina navdarên kurd, nasandina heywanan, nasandina sebzeyan, nasandina cih û bajaran, wêneyên ji bo boyaxkirinê, gotinên pêşîyan, biwêjên kurdî, xaçepirs û pêkenok hatine nivîsandin û weşandin.

Ji bo zarokan kovareke din ya bi navê *Perperokê* di sala 2012ê de li Stenbolê ji aliyê Wêşanên Arê ve û bi berpirsîyarîya Mevlut Aykoç ve bi temamî du hejmar hatîye weşandin. Amadekarên kovarê Cüneyt Kulaz, Hasan Aslan, İdris Benek, Fêrgîn Melîk Aykoç, Xunav Altun û Mevlüt Aykoç in. Di vê kovarê de beşên li ser zimên, agahîyên rojane, tiştanok, dîrok, dersên matematîkê, nasandina heywanan, nasandina navdarên kurd, çîrok, xaçepirs û wêneboyaxkirin hatine weşandin.

Kovara *Bûka Baranê* di sala 2013ê de li Stenbolê bi yekem hejmara xwe derçûye û hejmara dawî di sala 2015ê de derketîye. Bi tevahî li ser hev 5 hejmar derçûne û edîtora kovarê Sewîm Qoserî ye. Xêzên vê kovarê ji alîyê Qerbelek, Zîşan Ozeke, Sewîm Qoserî ve hatine amadekirin. Di kovarê de çîrok, tiştanok, zûgotinok, mamik, heyranok, helbest, nasandina bajaran, nasandina navdarên kurd, wêneboyaxkirin, hejmar û matematîk, lorîk, nasandina zarokan, xaçepirs, perwerdeya dînî, şano û mijarên neteweyî hatine amadekirin û weşandin (Subaşı, 2022; Tosun, 2017).

Tevî van, li Tirkîyeyê, di van salên dawî de du weşanxane vebûn ku bi taybetî ji bo zarokan berheman diweşînin. Ji wan a yekem bi navê Hîvayê ye ku di sala 2014ê li Dîyarbekirê vedibe û xwediye wê Mem Bawer e. Weşanxaneyê din jî Weşanxaneyê Morî ye ku ew jî di sala 2015ê de hatîye avakirin û tenê ji bo zarokan pirtûkên perwerdeyê amade dike. Di wan weşanxaneyan de pirtûkên rêzimanê, pirtûkên çîrokan, pirtûkên boyaxkirinê û ferheng hatine weşandin.

Di hevpeyvînekê de Mem Bawer (2016) derbarê weşanxaneyê Hîvayê de wiha dibêje: Havîna 2014ê de ji çar hevalan 2 helbestvan, wênesazek û grafikerek em hatin ba hev û me ev weşanxane damezirand. Heta niha ji alîyê vê weşanxaneyê ve tevî pirtûkên zarokan û setên perwerdeyê 41 pirtûkên zarokan hatine weşandin.

Di berdewama hevpeyvînê de Mem Bawer (2016) kadroya nivîskarên zarokan ên ku berhemê wan di vê weşanxaneyê de çap dibin wiha rêz dike: Bêrî Bihar, Îsmail Dîndar, Yaqob Tilermenî, Mîran Janbar, Berfîn Ayşe Ögüt, Mahmûd Nêşîte, Mûrad Dildar, Şukran Çaçan, Hasîp Yanlıç, Ferîdûn Bîrgul, Seyhan Karakoç, Berfîn Îde Demîral, Yasemîn Elban, Amed Tîgrîs, Mahmûd Lewendî, Kerem Tekoglu, Janya Acar, Amed Gernas, Jîr Dîlovan, Yunis Bahram, Yehya Elewîferd, Konê Reş, Aynur Özbay, Benûşe Elewîferd, Rustem Felat, Roza Metîna, Hîva Yüce û Mem Bawer.

(Bawer, M. (2016). Kürt Folkloruyla Gelişen Çocuk Edebiyatı Bin Yıllardır Var.

https://bianet.org/haber/mem-bawer-kurt-folkloruyla-gelisen-cocuk-edebiyati-bin-yillardi-var-172500#google_vignette. (30.05.2024).)

1.4.2.2. Xebatên li Ewropayê Hatine Kirin

Piştî avabûna Komara Tirkîyeyê gelek rewşenbîr û nivîskarên kurd koçî Ewropayê dibin. Li Ewropayê ekolek ava dibe û êwreke giring ji bo edebîyata kurdî

dest pê dike. Di warê edebîyata zarokan de jî kesên wekî Zinarê Xamo, Murad Ciwan, Mahmûd Lewendî, Mahmut Baksî, Kemal Burkay, Haluk Öztürk, Firat Cewerî û Mehmet Emîn Bozaslan bi taybetî li Swêdê xebatên giranbiha pêk tînin. Van kesan jî bo zarokan fabl, çîrok û pirtûk nivîsandine, werger kirine û kovar derxistine.

Li Stokholmê di sala 1996ê de jî alîyê Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê ve 28 pirtûkên çandî û hunerî bi kurmancî û zazakî hatine çapkirin ku jî wan hin pirtûk jî bo zarokan derketine. Bo nimûne: Pirtûkeke bi sernavê *Klasîkên Cîhanê yê Piçûkan* derketiye. Di pirtûkê de *Keçika Kîbritfiroş* jî alîyê Bişarê Segman ve, *Çîroka Sînderela* jî alîyê Husamettîn Aslan ve, *Sazbendên Bremênê* jî alîyê Serdar Rojan ve, *Şûrê di Kevir de* jî alîyê Murat Ciwan ve, *Kumsor* jî alîyê Husemettin Aslan ve, *Berfîn* jî alîyê Reşo Zîlan ve, *Elî Baba* jî alîyê Amed Tigrîs ve, *La fontaine (Sîsîrk û Morî, Gur û Legleg, Rovî û Legleg, Gundî û Kurên Wî)* jî alîyê Reşo Zîlan ve û jî Aîsoposî (*Meymûn û zaroka wê, Rovî û Tirî, Gur û Seyê dermalî, Kusî û Kerguh, Pêşî û Şer, Mişkê bajarî û Mişkê gundî, Bayê kur û Tav, Zaq û Kevok, Kaja zer û Dendereşk, Şêr û Nêçîrvan, Rovî û Qirak, Pênîyara kerguhê*) dîsa jî alîyê Reşo Zîlan ve hatine wergerandin (*Klasîkên Cîhanê yê Piçûkan*, 1996b: 7-120). Herwisa pirtûkeke bi navê *Fablên Kurdî* derketiye ku di tê de 16 fabl jî alîyê kesên wekî Osman Sebrî, Konê Reş, Reşo Zîlan, Bonîya Cegerxwîn, Mahmûd Lewendî, Adar Jîyan, Salihê Heydo, Egîd Dijwar, Cegerxwîn û Abbas Alkan hatine nivîsîn (*Fablên Kurdî*, 1996a: 5-79). Jê cuda hin pirtûkên bi navê *Kejê* (bi zazakî: Aydın Bingöl), Pirtûka Daniêl Defoe ya bi navê *Robinson Crosue* (wergêr: Îhsan Espar), *Ji Zargotina Kurdî – Mamik, Lihevanînok, Şabûnok, Zûgotinok* (amadekar: Reşo Zîlan, Husamettîn Aslan, Amed Tigrîs) hatine çapkirin.

Pirtûkeke din a ku jî bo zarokan hatiye wergerandin bo Kurdî *Ansîklopedîya Zarokan* e. Pirtûk bi swêdî ye û jî alîyê Amed Tigrîs, Mahmûd Lewendî, Hesenê Metê, Seyidxan Anter û Ali Çiftçi jî bo kurdî hatiye wergerandin. Pirtûk dîsa li Stokholmê jî alîyê weşanxaneyê *Apecê* ve hatiye çapkirin.

(Ansîklopedîya Zarokan, (30.06.2024) Di wîkîpedîyayê de, [https://ku.wikipedia.org/wiki/Ans%C3%AEklopediya_zarokan_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/Ans%C3%AEklopediya_zarokan_(pirt%C3%BBk)))

Tevî van, nivîskar Mahmud Baksî jî bo perwerdeya zarokan pirtûkeke bi navê *Zarokên Îhsan* bi piştgirîya Wezareta Çandî ya Swêde çap dike. Piştî salekê derketina vê pirtûkê dîsa jî alîyê Mahmud Baksî ve bi alîkariya Wazêreta Çandî ya Swêdê jî bo

zarokan pirtûkeke bi navê *Keça Kurd Zozan* hatîye nivîsandin. Herwiha ev pirtûk hatîye wergerandin bo swêdî û wekî xêzefilm hatîye weşandin. Di weşangerîya kurdî de wekî yekem xêzefilma kurdî tê hesibandin ku xêzefilm di sala 1986ê de bi soranî û kurmançî li ser televizyona hat nîşandan. (Mahmut Baksî. (15.06.2024). Di Wikîpedîyayê de. [https://tr.wikipedia.org/wiki/Mahmut Baksi](https://tr.wikipedia.org/wiki/Mahmut_Baksi))

Nivîskarekî din ku ji bo edebîyata zarokan ked daye Firat Cewerî ye ku di sala 1980î de di *Kovara Kulîlkê* de çend helbest bo zarokan weşandine û herwiha di sala 1983yê de dîwaneke helbestên zarokan bi navê *Dê Şîrîne* çap kirîye. Ji bilî helbestên wî çend berhemên nivîskara navdar a berhemên zarokan a swêdî Astrît Lîndgrenî jî wergerandine kurdî (Subaşı, 2021: 238).

Herwiha nivîskar Kemal Burkay jî di sala 1988ê de pirtûkeke zarokan a bi navê *Aliko û Baz* nivîsandîye û ev pirtûk li Stokholmê hatîye weşandin. (Kemal Burkay, (15.06.2024). Di Wikîpedîyayê de. [https://tr.wikipedia.org/wiki/Kemal Burkay](https://tr.wikipedia.org/wiki/Kemal_Burkay).)

Ew rewşenbîr û nivîskarên li Ewropayê ji alîyê çapemenîyê ve jî xebatên giring kirine. Herwiha ji bo zarokan kovar jî amade kirine û çap kirine. Li gorî çavkanîyên berdest ji bo zarokan 7 heb kovar hatine weşandin û kovareke giring ya bi navê *Roja Nû* derxistine ku di vê kovarê de jî ji bo zarokan hin berhem hatine dayîn.

Kovara çandî, hûnerî û edebî *Roja Nû* di mijdara 1978ê de wekî weşana Komeleya Karkerên Kurdistanê yê li Swêdê (Komkar-Swêd) dest bi weşanê dike. Di hejmarên 58, 61 û 62em de ji bo zarokan hin çîrok hatine weşandin.

Ji wan, *Kulîlk* di navbera sala 1980î û 1997ê de bi tevahî 51 hejmar derketîye. Kovar li Swêdê li bajarê Stokholmê bi hevkarîya Mala Kultura Kurdî, Weşanên Jîna Nû û Komela Çanda Karkerên Kurdistanê hatîye amadekirin. Reşo Zîlan jî yek ji amadekarên vê kovarê ye. Herwiha nivîskarên wekî Zinarê Xamo, Reşo Zîlan, Mehmûd Lewendî, Bavê Hêvî, Zinar Soran, Hesên Qende, Şikoyê Hesên, Malwêran, Mihemed Dehsîwar, Konê Reş, Torînê Osman, Birîndar û Firat Cewerî di vê kovarê de ji bo zarokan berhem dane.

Kovareke din dîsa li Swêdê li bajarê Stokholmê di sala 1981ê bi navê *Hevî* weşîyaye. Heta sala 1984ê bi tevahî 15 hejmar jê derçûne. Di kovarê de mijarên neteweyî yê wekî newrozê, hînkirina rojên hefteyê û navê mehan, matematîk, ji bilî van helbest çîrok, tiştanok, lîstîk, fêbî, nasandina ajalan û hwd. hatine weşandin.

Nivîskarên wekî Murad Ciwan, Amed Tigris, Hesên Mizgîn, Zinarê Xamo, Mahmud Lewendî nivîskarên kovarê ne.

Helîn jî kovareke zarokan e ku di navbera sala 1982ê û 1995ê de li Stokholmê, ji aliyê Yekîtiya Karkerên Demokrat ên Kurdistanê ve hatiye weşandin. Kovar demsalî ye û 14 hejmar hatiye weşandin. Mahmûd Lewendî û H. Mizgîn amadekarên kovarê ne û nivîskarên wekî Zinarê Xamo, Hesên Mizgîn, Murad Ciwan û Mahmud Lewendî di kovarê de jî bo zarokan nivîsandine. Ji aliyê wêneyan ve kovareke dewlemend e.

Li gorî çavkanîyên berdest du kovarên din; *Heval* (1995) û *Hêvîya Me* (1997) li Swêde li bajarê Stokholmê hatine weşandin lê ji aliyê kê ve çend hejmar hatine weşandin nayê zanin.

Herwiha, li Norwêcê di sala 2007ê de kovareke bi navê *Kurdîlekan*, kovareke zarokan tê weşandin. Kovar 5 hejmar weşîyaye û serperîştê kovarê Reza Shiwan e.

Tevî van, kovareke bi navê *Koçer* di navbera salên 1988 û 1992ê de bi tevahî 12 hejmar hatine çapkirin. Kovar bi tîpên erebî û zaravayê soranî hatiye amadekirin. Heme, Letîf Helmet, Herêma Hêmin, Bextîyar Emîn û Emced Şakel nivîskarên kovarê ne (Subaşı, 2022; Tosun, 2017).

Weku diyar e, kovêrên zarokan ên li Ewropayê hatine amadekirin û weşandin ji yê li Tirkîyeyê hatine weşandin kevintir in. Ango li Ewropayê kovarên zarokan berîya kovarên zarokan ên li Tirkîyeyê zûtir dest pê kirîye. Herwisa hejmarên kovarên Ewropayê ji yê li Tirkîyê dirêjtir in jî.

Tevî van xebatan di weşanxaneyê Apecê de gelek pirtûkên zarokan hatine weşandin. Weke mînak, bi dehan pirtûkên zarokan yê nivîskarê swêdî Ulf Löfgren (1931-2011) ku bi adaptasyona kurdî û bi navê *Rindo* hatine weşandin ji aliyê zarokan ve gelek hatine hezkirin. Weşanxaneyê Apecê bi destûra nivîskarê navê lehengê van pirtûkan *Ludde* kirîye *Rindo*. Ne tenê serpêhatî û macerayên *Rindo*, çapên wan yê xweşik jî hêjayî pesindayînê ne. Ulf Löfgren heta niha 34 heb pirtûkên *Ludde* wekî rêzepirtûk weşandine (1984-2006). Nivîskêr bi xwe wêneyên van pirtûkan jî amade kirine. Bi dehan jî wan bi kurdî, bi hersê zaravayan derketine. Carinan kurmancî-soranî, carinan jî bi kurmancî-zazakî wekî tekstên paralel bi hevra hatine weşandin.

(Alakom, R. (2021). Ji Edebîyata Kurdên Swêdê: Trîlojîya Mehmed Dehşîwar.

<https://www.kurdarastirmalari.com/yazi-detay-oku-114>)

Di malpera *Dîyarnameyê* de rojnameger Cemîl Oğuz li ser pirtûkên zarokan nivîseke kurt nivîsîye. Di vê nivîsê de tê daxuyankirin ku di 20 salan de di weşanxaneyê Apecê de, pirtûkên dersê, pirtûkên zarokên biçûk û pirtûkên zarokên mezin jî tê de 78 pirtûk hatine weşandin. Oğuz dibêje:

Piranîya van pirtûkan jî swêdî hatine wergerandin. Pedagojîya pirtûkên zarokan ên swêdî li cîhanê gelek baş û pileya wan bilind e. Loma gelek zimanên mezin jî zimanê swêdî werdigerinin ser zimanê xwe. Wêne gelek rengîn û balkêş in û ew jî bi qasî tekstan pedagojîk in. Apec, di destpêkê de heta niha xwedîyê redaksîyoneke xurt e.

Oğuz, C. (2022). Weşangerên kurd serê sibê ji xew rabû û fikirî. <https://diyarname.com/news.php?Idx=870>. (24.07.2024).

1.4.2.3. Xebatên li Başûr Hatine Kirin

Piştî hilweşîna dewleta Osmanîyan, Îngilîzan Başûrê Kurdistanê û Iraq xistin bin destê xwe û wan dewleteke nû bi navê Iraqê ava kir. Îngilîzan soza parastina mafên çandî û zimanî bo kurdan da û di sala 1918ê de yekem xwendingeha kurdî li Silêmanîyê vekirin. Ew xwendingeh jî ku bi navê *Nimûneyê Se`adet* bû, dibe yekem xwendingeha bi kurdî li Kurdistanê. Herwiha Îngilîzan ligel xwe matbaa anîn Silêmanîyê û bi piştgirîya Îngilîzan di çapemenîya kurdî de gavên giring hatin avêtin. Bi vî awayî rojnameya *Pêşkewtin* li Silêmanîyê hat çapkirin, ku wê jî bandoreke mezin li ser zimanê kurdî hêla. Di rojnameyê da bangewazî ligelê kurd hat kirin da ku zarokên xwe bişînin xwendingehên kurdî (Khalîd, 2021: 85). Di pêvajayê demê re li Kurdistana Başûr gelek dibistan û çapxane vebûn û soranî li Başûr bibû zimanê standart.

Li gorî xebatên ku li ser edebîyata zarokan hatine kirin (Subaşı, 2022; Tosun, 2017) û li gorî tesbîtan, yekemîn berhema ku li Başûr ji bo zarokan hatiye çapkirin pirtûka bi navê *Kelekok* e ku nivîskarê wê Îsa Elî ye û di sala 1927ê de ji weşanxaneyê *Zarî Kurmancî*, li Rewandizê hatiye çapkirin. Her wisa li gorî xebatan, çîroka duyem ya ji bo zarokan hatiye nivîsîn çîroka bi serenavê *Xoşî û Tirşî*, disa li Rewandizê ji weşanxaneyê *Zarî Kurmancî* derçûye. Di salên 1930î de Şakir Fetah çîroka Kamil Geylanî *Xanuweyî Tazeya* ji erebî werdigerîne kurdî û herwiha di sala 1945ê de bi navê *Çîrok Bo Mindalan* li Bexdayê pirtûkekê çap dike. Bi dumahîya demê re gelek çîrok di nav kovaran de hatine nivîsîn û weşandin. Bi taybetî edebîyata zarokan li Başûr piştî salên 1940î geştir dibe. Li gorî çavkanîyan kesên wekî Ferîdun Elî Emîn, Elî Evdilla Şewnîm, Omer Evdilrehîm, Letîf Helmet, Daykî Solav, Ceza Elî Emîn, Ata Qezaz,

Mihemed Ferîq Hesên, Tahir Salih Seîd, Rustem Bacelan, Şukir Mistefa, Reza Şivan, Hoşyar Huseyîn, Mihemed Reşîd Fetah, Nurî Seîd Qadir, Rîwas Ehmed, Fehmî Kakeyî, Osman Derwêş Şukur, Kerîm Şareza, Yasîn Qadir Berzencî, Elî Mendelawî, Mihemed Salih Klêseyî, Rizgar Kerîm Seîd, Burhan Qeredaxî, Kawey Ehmed Mîrza, Îbrahîm Ehmed Baldar, Simko Nakam, Kazim Koyî, Ezîz Mela Reş, Sadullah Şêxanî, Giriftar Kakeyî, Kakey Felah, Latîf Helmet, Kurdistan Mukrîyanî û Sebrî Botanî ji bo zarokên kurd pirtûk amade kirine û nivîsîne.

Li Başûr hin kovar û rojnameyên wekî *Zarî Kirmancî*, *Gelawêj*, *Rojî Kurdistan* hene ku ne bi taybetî ji bo zarokan be jî, di hin beşên wan de ji bo zarokan nivîs hatine nivîsîn. Lê bi taybetî ji bo zarokan ji bilî pirtûk û çîrokên zarokan, li Başûr gelek kovar jî ji bo zarokan çap bûne ku ev kovar bi taybetî piştî salên 1970yî bi rêk û pêk dest pê dikin. Mirov dikare li gorî çavkanîyan kronolojîya kovarên li wir hatine çapkirin wiha bide:

Estêre (1972-1974), Estêre (1975), Newroz (1980), Sirûşt (1983), Gizîngî Biçûkan (1985), Edebî Mindallan (1985-1990), Sivore (1988), Karwanî Mindellan (1990), Pereshêlke (1991), Govarî Estêre (1992), oXalxalok (1992), Pepûle (1992), Cîgergoşekan (1992), Perîstan (1992), Perîstan (1993), Heng (1993), Lane (1993), Gulzar (1994), Hêvî (1995), Awat û Hêvî (1996), Cerîwe (1998), Nêrgiz (1999), Dinyayê Mindellan (1999), Sîndabanî Bexda (2000), Hêlanêy Mindellan (2000), Zeng û Beng (2001), Pelgezêrîne (2001), Jînnamê (2001), Aga (2002), Xende (2002), Kenarî (2002), Kolare (2002), Tirş û Şîrîn (2002), Mindalannî Bewe Gurrur (2003), Kepir (2003), Nêrgiz (2003), Xatûzîn (2003), Mindallî Serdem (2006), Gullekan (2006), Simore (2010), Colanê (2013), Rûdawî Mindalan (2013), Pêlîstank (2014), Jînwar, Mişke, Pêşengî Mindallan, Şilk û Şa, Gedîle, Mame Yare û Tan Tan.

1.4.2.4. Xebatên li Îranê Hatine Kirin

Piştî şerê cîhanê yê duyem Îran ji aliyê Êrîs û Îngilîzan ve tê îşgalkirin. Paşê, Partîya Demokrat a Kurdistanê Îranê tê damêzrandin û Partîya Komara Mahabadê di sala 1946ê de ava dibe. Bi vî awayî xebatên edebî û çandî pêk tên. Piştî hilweşîna Komara Mahabadê xebatên çandî û edebî radiwestin. Lê em dizanin ku di dema avakirina Komara Mahabadê (1946) de gelek kovar û rojname derketine, lê mixabin ew jî mîna komarê temenkurt bûn

(Cewerî, F. (2003). Pêşgotina Antolojiya çîrokên kurdî, Fikra amadekirina antolojiyê. http://www.nefel.com/articles/article_print.asp?ArticleNr=319 (15.07.2024).

Herçiqas pêşengên tevgerên çandî-edebî yên wekî Hemîn, Hejar Rehimê Qazî û Hesên Qizilcî bîrî sîrgûnkirin jî xebatên wan ên çandî-edebî jî bo edebîyata kurdî giring in. Di warê edebîyata kurdî ya zarokan de jî alîyê *Enstîtuya Geşedana Rewşenbîrî ya Ciwan û Zarokan* ve çar berhemên çîrokên zarokan hatine weşandin. Dîsa di sala 1984ê de jî alîyê hukûmetê ve navendeke edebî û çandî ya bi navê *Selahaddînê Eyyûbî* hatîye avakirin (Hassanpour, 1997, vghz Subaşı, 2017: 126).

Li gorî çavkanîyên berdest di kurtejiyana vê komarê de ku nêzikî salekê bû, nêzî pênc şeş kovar û rojnameyên mayînde û biqîmet jî bo dîroka kurdan, li ber dest man.

Li Rojhilatê kovareke bi navê *Sirwe* di sala 1985ê de li bajarê Urmîyeyê tê weşandin. Kovarê di nav rûpelên xwe de beşeke taybet jî bo zarokan amade kirîye. Sernivîsên kovarê Hemîn Mukrîyanî û Ehmed Qazî bûn.

Herçiqas li Îranê xebatên çandî û edebî di nava zehmetîyan de be jî yekem kovara zarokan a bi navê *Gir û Galî Mindalanî Kurd* di sala 1946ê de li bajarê Mehabadê di çapxaneyê Kurdistanê de hatîye çapkirin. Herwisa li gorî çavkanîyên berdest 3 hejmarên kovarê hatine weşandin. Kovareke din *Girr û Gall* di sala 1979ê de li bajarê Kirmanşahê jî hêla Muhsin Şahsiwar ve 2 hejmar hatîye weşandin. Herwiha *Dinyayê Mindalan* kovareke din a zarokan e ku di sala 2002yê de jî alîyê Weqfa Parastina Zarokên Kurdistana Rojhilatê ve li Kurdistana Başûr hatîye çapkirin. Heta niha 155 hejmar hatine weşandin. Dîsa kovareke din a bi navê *Amanc Bo Zaroka* li Tehranê wekî paşkoya kovara *Amancê* derçûye. Hejmara 21em di Gulana sala 1989ê de weşîyaye. Tevî van, kovareke bi navê *Nergis*, bi armanca perwerdekirina zarokên kurd ên li Îranê hatîye weşandin. Heta niha 60 hejmarên vê kovarê derketine (Subaşı, 2022; Tosun, 2017).

1.4.2.5. Xebatên li Sûrîyeyê Hatine Kirin

Piştî avabûna Komara Tirkîyeyê hin rewşenbîrên li Stenbolê koçî Sûrîyeyê dibin. Ew rewşenbîr û zanayên kurd li Şamê xebatên edebî û çandî çêdikin. Herwiha jî bo çapemenîya kurdî gavên giring tên avêtin.

Wisa ku di sala 1932yê de Celadet Elî Bedirxan bi navê *Hawarê* kovarek da weşandin ku ev kovareke edebî, hunerî û çandî bû û bi tevahî li ser hev 57 hejmar jê derçûn ku di 5 hejmarên pêşî de beşeke bi navê “Stûna Zarowan” bi taybetî ji bo zarokan hatibû terxankirin (Subaşı, 2022: 128).

Di hejmara duyem a *Hawarê* de ji bo zarokan helbestek di bin beşa “Stûna Zarowan” de hatiye weşandin. Navê helbestê *Tola Welêt* e. Di hejmara sêyem de Celadet Elî Bedirxan bi serenavê *Şeva We Xweş* helbestek ji bo zarokan nivîsandîye. Herwiha di hejmara pêncem de hin tişt ji bo zarokan hatine nivîsandin. Tevî van, helbesteke bi navê *Alê Qurdan* û lorîyeke bi navê *Delalîya Zarowan* a ku Emîn Elî Bedirxan dema zarokên wî biçûk bûne ji wan re gotîye, nivîsandîye. Di hejmara 30yî ya vê kovarê de dîsa Derketîkî Dersimî bi serenavê *Kurd Yek in* nivîsek hatiye nivîsandin. Herwiha Nûredîn Êsif jî bi serenavê *Ji Xortan re* nivîsek ji bo zarokan nivîsandîye (Hawar, 2012).

Ji *Hawarê* cudatir dîsa ji aliyê Celadet Bedirxan ve kovareke bi navê *Ronahî* di sala 1942yê li Şamê hatiye derxistin û bi tevahî 28 hejmarên vê kovarê derketine. Di kovarê de fêblên Celadet Bedirxan û Osman Sebrî hatine weşandin. Herwiha, Celadet Bedirxan bi navê Bavê Cemşîd di hejmara 19em a *Ronahîyê* de behsa pirtûkeke zarokan a bi navê *Kitêba Sînemxanê* dike. Dîsa di heman hejmarê de Bişarê Segman ji nivîskarê danîmarkî Hans Christian Andersen çîrokek wergerandîye ser kurdî. Segman çîroka Andersan a bi navê *Keçika Kibrîtîfiroş* bi kurdî nivîsandîye. Di bin çîrokê de jî wekî tarîxa nivîsandinê “1ê îlona 1943an-Dihok” hatiye nivîsandin (Tosun, 2017: 53).

Li gorî çavkanîyên berdest kovareke din bi navê *Gulîzar* di navbera salên 2000 û 2002yê de hatiye weşandin. Berpirsîyarê kovarê Lawîkê Hacî ye û kovar xwerû bi zimanê kurdî bû. Bi tevahî 9 hejmar jê derçûne. Ev kovar li ser pelên A4ê wekî fotokopî hatiye zêdekirin û belavkirin (Reş, 2013, vghz. Subaşı, 2022: 128).

Ji wan xebatên li cihên kurd lê dijîn cudatir ji bo geşedana edebîyata kurdî ya zarokan çend kesên navdar hene ku ked û xebatên wan hêjayî behskirinê ne. Yek ji wan kesan M. Emîn Bozarslan e. Berhema wî ya ewil a ji bo zarokan derbarê alfabeya kurdî de ye. *Alfabe* di sala 1968ê li Stenbolê hatiye çapkirin. Berhemeke din bi navê *Meyro* di sala 1979ê de dîsa ji aliyê Bozarslan ve hatiye nivîsîn ku di vê berhemê de 10 kurteçîrok hene û di wan de mekan, leheng û navên wan kurdewar in. Ji bilî van, Bozarslan ev berhem ji bo zarokan nivîsandine: *Mîr Zoro* (1981), *Gurê Bilûrwan*

(1982), *Kêz Xatûn* (1982), *Serketina Mişkan* (1984), *Pepûk* (1985), *Masîyên Bejî* (1987), *Jî Dînan Dîntir* (1988), *Ilmê Tûrik* (1989), *Bûka Gulsûn* (1990), *Mela Kuli* (1991), *Gulî Xatûn* (1997), *Kurê Mirê Masîyan* (1998), *Keçika Darin* (1999a), *Keçika Qirşfiroş* (1999b), *Dîtinhezar* (2000), *Gulê û Sîno* (2002) (Tek, 2019: 55).

Kesekî din ê ku ji bo edebîya kurdî ya zarokan giring e Evdirehîm Rehmî Hekarî ye ku Hekarî ji bo zarokan heft pirtûk bi tirkî û sê pirtûk jî bi kurdî nivîsîne. Ji yên tirkî jî çar pirtûk rasterast ji bo zarokên xwe nivîsîne. Dîsa ji bo zarokên kurdan jî sê berhemên serbixwe nivîsîne. Herwisa gelek helbest û xebatên perakende ji bo zarokan, jin û ciwanan di kovar û rojnameyan de belav kirine. *Garib Çocuklara Ahlak Aşısı* (1919), *Esir Bir Çocuğun Başına Gelenler* (1334/1915), *İslam Yavrusunun Kitabı* (1956), *Metin'in Din Soruları* (1956), *Hâle'nin Din Soruları* (1956), *Pertev'in Din Soruları* (1956) û *Jâle'nin İman Kitabı* berhemên wî yên tirkî ne. Pirtûkên ku Rehmî Hekarî ji bo zarokan bi kurdî nivîsîne ev in: *Dersa Dîn* (1921), *Kilîta (Mifteya) Xwendinê: Elîfbêya Kurdî û 'Eqîda İmanê'/'Eqîda Kurdan* (Tek, 2019: 57).

Kesekî din Elaeddin Seccadî ye ku gelek çîrokên wî yên ji bo zarokan hatine nivîsandin tê dîtin. Li gorî çavkanîyên berdest Seccadî birêvibiraya kovara *Gelawêjê* kirîyê û di *Gelawêjê* de cara ewil di sala 1944ê de nivîseke wî ya edebî weşîyaye ku ew jî wergera çîrokeke Hans Christian Andersenê (1805- 1875) danîmarkî ye. Navê çîrokê *Kejserens Nye Klæder* e ku Seccadî ew bi navê *Kallay Ballay Şa* ji erebî wergerandiye û çap kirîye. Piştî wê di sala 1946ê de yekem çîroka xwe bi navê *Ronezengî Hemesen* (Rûnê Helîyayî yê Hemesen) di *Gelawêjê* da belav kirîye û heya sala 1949ê ku weşana *Gelawêjê* berdewam bûye Seccadî bi giştî diwazdeh çîrok nivîsîne û belav kirine ku şeş ji van çîrokan ji bo zarokan nivîsîne û çîrokeke wergerandî ya zarokan e ku me qal kir û pênc çîrok jî ji bo mezinan nivîsîne. Herwiha di berhema wî ya bi navê *Hemîşe Behar* (1960, Bexda) de şeş çîrokên zarokan hatine nivîsandin. Ev çîrok bi navên *Rawejîşk* (Nêçîra Jûjîyan), *Gurg û Berxeke* (Gur û Berxik), *Sêweng û Mam Rêwî* (Sêweng û Mam Rêvî), *Dû Birake* (Du Bira), *Rêwîyekey Qemçoxe* (Rovîyê Qemçoxeyê), *Bizin û Meymûneke* (Bizin û Meymûn) hatine belavkirin. Ev çîrok di *Gelawêjê* de hatine belavkirin (Subaşı û yd., 2022: 225-227).

Ji van cudatir divê behsa helbestên kurdî yên zarokan jî bê kirin. Lewre destpêka edebîyata zarokên kurd, mîna edebîyata mezinan di nav kurdan de bi helbestê dest pê

kirîye (Qeder, 2016: 15). Wisa ku helbest yek ji hunerên zimanî ye ku piştgirîyeke zêde dide prosesa geşedana zarokan (Subaşı, 2021: 224).

Li gorî çavkanîyên berdest helbestên ji bo zarokan di kurdî de di nav pênc qonaxan de dikare bê dabeşkirin. Ev dabeşkirin bi awayekî kronolojîk hatîye sêwirandin û ji van qonaxan a yekem wekî qonaxa klasîk tê binavkirin ku zêdetir li ser perwerdekirin û fêrkariya zarokan bû. Di vê qonaxê de zêdetir ferhengên menzûm û eqîdename hatine nivîsîn ku me li jorê bi berfirehî behsa wan kiribû.

Di qonaxa duyem de kesên wekî Zêwer, Hisinê Emîn, Kamiran Bedirxan, Cegerxwîn, Evdilla Goran, Pîremêrd, Melayê Gewre, 'Ebidurehman Begî Baban, Muftî Pêncwînî, Şakir Fettah, 'Elaedîn Secadî, Husên Huznî Mukrîyanî, 'Ebidulwahîd Nûrî, Bêkes, Şêx Nûrî û Dildar ji bo zarokan helbest nivîsandine. Wisa ku Zêwer yekem helbestvanê zarokan ê bi zaravaya soranî helbestên zarokan nivîsandîye.

Qonaxa sêyem bi Goran dest pê dike. 'Umer 'Ebidurehîm, Fereydûn 'Elî Emîn, 'Umer 'Elî Emîn, Kakey Fellah, E. E. Şewnim, Zekî Henarî, Îbrahîm Ehmed Şwan, Îbrahîm Emîn Baldar, Hejar, Remzî Qezaz, Fazil Qeftan û Medhet Bêxew hin helbestvanên din ên zarokan in.

Di qonaxa çarem de kesên wekî Mihemed Mewlûd Mem û Aferînî hawjînê wî, Mewlûd Îbrahîm Hesên, Cemal Nûrî, Muhsîn Cwamêr, 'UmerPetî, Îsma'îl Rojbeyanî, Kemal Mamend, Daykî Solav, Rostem Bacelan, 'Ezîzî Melay Reş, Letîf Helmet, Kazim Koîyi û 'Usman Hewramî ji bo zarokan helbest nivîsandine ku di vê qonaxê de helbestên azad zêdetir bûn, ziman zelaltir bû, naverok vekirîtir bû. Bi helbestên xwe yê wergerê jî Firat Cewerî dikare wekî helbestvanê zarokan ên qonaxa çarem were hesibandin.

Tevî van helbestvanên wekî Îdrîs 'Ebidulla, Bekir Pêderî, 'Elî Bextewer, Cemal Girdesorî, Birwa Muhemmedî, 'Elî Hemereşîd Berizncî, Ako Mihemed Sabîr, Sozan Sofî, Serheng' Ebidurehman, Hatem Batasî, Zara Ehmed Caf, Rostem Xamoş, 'Ebidulwehab Şiwanî, Zîyad Reşad, Daykî Xelat, Emîn Mihemed, Rewf Cemîl, Ferhad Ehmed Berizncî, Emîn Gerdgîlanî, 'Ebidurehman Fehîmî, 'Usman Derwêş, Pakîze Mihemed'Elî û Selah Nîsarî di qonaxa pêncem de ji bo zarokan bi soranî helbest nivîsandine. Ji wan kesan cudatir kesên wekî Yehya Elewîferd, Mueyed Teyîb, Aram

Gernas, Taha Bîlal, Elî Heme Reşîd Berzincî, Konê Reş û Emîn Muhemmed jî di vê qonaxê de ji bo zarokan helbest nivîsandine (Qeder, 2016; Subaşı, 2021).



BEŞA DUYEM

2. EDEBÎYATA ZAROKAN LI KAFKASYAYÊ

2.1. Êwra Kafkasyayê

Wêjeya kurdî ya êwra Kafkasyayê xwedî gelek taybetîyan e û di nav xwe de xwedî gelek afirandinên cihêreng e. Mirov dikare bibêje ji roman, çîrok, şano û rojnameyan bigire heya xebatên radyofonîk, gelek xebatên curbicur hatine kirin û ji bo pêşketina perwerde û wêjeya kurdî gelek ked hatine dayîn. Herçiqas li êwra Kafkasyayê xebatên wêjeyî piştî Şoreşa Oktobirê, piştî vekişîna Rûsan, herwisa koçerbûna kurdên êzidî gurr bûbe û dîroka kurdên wir nû derbasî qeydan bûbe jî li gorî kurdnasê rûs Mînskî kurd di demên pir kevnar de li herêma Kafkasyayê bi cih bûne. Li gor Gordon Childe û Vanilor, qewmên arî (ku kurd jî di nav de ne) berîya Îsa di salên 6000î de li Kafkasyayê belav bûne (Ulugana, 2017: 36). Lê pêşketin û xwehisîna kurdên Kafkasyayê piştî avabûna YKSSyê mimkûn dibe û berhemên curbicur tên dayîn. (1917)

Piştî şerê cîhanê yê yekem kurdên êzidî tên sirgûnkirin û wan dişînin Qersê ku Qers wê dewrê di nav tixûbên Rûsyayê da bû. Kurdên ku li Qersê û deverên wê dijîyan û di bin hikumdariya Rûsan de bûn wekî komên piçûk li wir dijîyan. Li gorî îstatîstîkên berdestî di sala 1910an da bi qasî 5 hezar Kurdên Êzidî li wir dijîyan (Can, 2013: 31).

Piştî ku Şoreşa Oktobirê jî pêk hat rûs ji deverên wekî Qersê vekişîyan û kurdên li wir careke din li rastî koçerbûnê hatin. Di dawîya encamên tevgerên polîtîk de piraniya kurdên êzidî xwe spartin rûsan ku li gor qanûnên YKSSyê hemû çînen bindest xwedî maf û azadiyê bûn. Di pêvajoya sirgûnbûna kurdên êzidî de gelek malbat hatin kuştin û gelek zarokên kurd sêwî man. Zarokên ku ketin bin banê rûsan di sêwîxaneyan de perwerde dîtin û gihîştin. Li YKSSyê jî bo zarokan dibistan hatin vekirin û ji bo zimanê dayîkê fêr bibin gelek fîrset hatin dayîn. Li gor Boyîk:

Ji berî qeydê Sovêtê, destpêka sedsalîya bîstan (1900-1904) împêratorîya Rûsyayê li warên Kurd lê dijîtin sê dibistan ji bo zarokên Kurd vekirin. Ew dibistan yên êlêmêntarê çar sale bûn, bi zimanê rûsî. Mixabin, ji bûyerên wan salan zû hatin dadan û bawer ke şopa xwe jîyana Kurdên wê heremê da nehiştin (Boyîk, 2012: 10).

Zarokên kurd yên li Kafkasyayê li gundan hêdî hêdî bi zimanê xwe perwerde didîtin û sal bi sal kadroyên xwe yên pêşî ava dikirin. Berhemdayîna kurdên li wir bi

gelemperî piştî sala 1930î dest pê dike û cureyên berheman şax bi şaxî dibe. Piştî salên 1920î “kadroyên ewlîn pêşda hatin: Hecîyê Cindî Emînê Evdal, Qanatê Kurdo, Cerdoyê Genco, Wezîrê Nadîrî, Casimê Celîl, Etarê Şero” (Boyîk, 2012: 14).

2.2. Perwerdeya Zarokên Sêwî

Piştî sala 1918ê kurdên êzîdî yên ku li rastî gelek zordestî û kuştinê hatibûn, li dû xwe gelek zarokên sêwî hiştibûn. Ev zarokên sêwî mabûn di sêwîxaneyên Ermenîstan û Gurcistanê de hatibûn bicîkirin û parastin.

Bi qirara hukumata Ermenîstanê ya 23ê Adarê sala 1921ê, dibistanên dereca ewlîn û duda da xwendin-nivîsandin, perwerdekirin gerekê bi zimanê dê bihata kirin. Di dibistanên gundên kurdan da, ji bo ders bi zimanê dê bêne dayîn, sala 1921ê, meha Oktobirê, kitêba darsa: *ŞEMS* bi zimanê Kurdî lê bi herfên ermenî hate weşandin. Xudanê wê pirtûkê, ewledê gelê ermenî, pismamê gelê kurd Lazo (Hakob Xazaryan) bû. Merkezên darsdar hazirkirinê vebûn, darsdar hatin hazirkirin, ku bi vê pirtûkê zarokê kurd hîn xwendin-nivîsarê kin. Heta sala 1929a him dibistanên gundên kurdan da, him jî li nav kurdên bajarê Tilbîsê, zarokên kurdan bi vê kitêbê hîn xwendin û nivîsandina zimanê dê bûn (Boyîk: 2004:12).

Mîrov dikare bibêje ku pirtûka *ŞEMS* ji bo perwerdeya zarokên kurd û ji bo bingeha edebîyata kurdî ya Sovyetê gaveke pêşîn bû. Jixwe kadroyên ewlîn di navbera salên 1918-1930î de bi vê perwerdeya ku tê dayîn digihîjin. Firîda Hecî Cewarî (2010: 12) di pirtûka bi navê *Bîranînên Min* de gotinên diya xwe di derbarê pirtûka *ŞEMSê* de wiha neqil dike: “Apê Lazo yekî zef heyf bû, mera dîgo berxîkê min, ewî zarû dora xwe dida rûniştandinê, pirtûkên *ŞEMS* dida destê me û em hîn xwendinê dikirin. Me hevîre dixwend: yekşam, duşam, sêşam..”

Li gor Şamil (2007: 24) “Ev perwerdeya zarokên Kurd heya sala 1929ê li ser vê pirtûkê hatîye berdewamkirin.” Her wisa weke ku Boyîk (2004:12) dipeyîtîne:

Sala 1922an bi însîatîva Ahmedê Mîrazî, Lazo û hinekên din, li bajarê Tilbîsê ji bo wan zarokan dibistana 103a vedibe. Li vê dibistanê da zarok him hîn kar dikirin, him xwendinê. Wurda ji zarok radizan. Xwendevanê vê dibistanê bûn zanyarê kurde usa ye bi nav û deng çawa Qanatê Kurdo, Çerkez Bakayêv, nivîskar, berpirsîyarê rojnama Rîya Teze yê ewlîn Cerdoyê Genco, mîrxasê Yekîtiya Sovyetê Semend Sîyabendov û gelekê din.



(Alfabeya "Şems"ê 1921)

Di sala 1928ê de, li ser bingeha tîpen latînî, li gorî fonetîka zimanê kurdî, bi dilxwazîya rewşenbîrên kurd û sazîyen ronakbîrîyê û perwerdehiye yên hersê komarên Kafkasyayê (Ermenîstan, Gurcîstan û Azerbeycan) ji bo weşangerî û perwerdehiya bi zimanê kurdî, alfabeya nû hate pejirandin. Bi avakirina alfabeya kurdî re astengîya giring ya li ber gulvedana çand û perwerdehiya kurdî rabû. Rewşenbîr wê êdî berhemên xwe li ser zimanê zikmakî biweşandana. Qefleyeke biçûk ji rewşenbîrên kurdan bi alikariya rewşenbîrên ermenî û asûrîyên kurdîziman, dest bi amadekirina pirtûkên kurdî kirin (Celîl, 2010: 10).

2.2.1. Xo-Xo Hînbûna Xondina Nivîsara Kurmancî

Piştî Alfabeya Şemsê, bi dûmahîya demê re, kadroyên pêşîn ên wekî Erebe Şemo, Hecîyê Cindî, Casimê Celîl û Emînê Evdal hêdî hêdî ketin nava kar û barên afirandina berhemên kurdî û pê re jî li ser berhemên perwerdeya zarokan pirtûk amade kirin. Jê cuda, dostê kurdên êzdî yên wekî Isahak Maragulov jî ji bo perwerdeya zarokên kurd tevî kurdan xebat kirin û zarokên kurd ên sêwî perwerde kirin. “Sala 1928a Erebe Şemo û Isahak Marangûlov elfeba Kurdî ya bi tîpên latînî damezrandin. Hema wê salê pirtûka wane xwe bi xwe hînbûna kurmancî çap bû” (Boyîk, 2012: 13). Ev pirtûk yekem pirtûka bi tîpên latînî ye ku ji bo xwendin û perwerdeya zarokên kurd hatiye amadekirin.



(*Xo-Xo Hînbuna Xondina Nivîsara Kurmancî*-1929).

2.2.1.1. Naveroka Pirtûkê

Pirtûka perwerdeyê ya *Xo-Xo Hînbûna nivîsara kurmancî* jî alîyê naveroka xwe ve, him zarok perwerde kirine û him jî ji bo pêşketina xwendina wan di nava xwe de çîrok, helbest û nivîsar hewandine. Wisa ku, dema em bala xwe didin pirtûkê, tevî hev ji 58 rûpelan pêk tê. Di rûpelên destpêkê de wekî pêşgotin bi sê zimanan (bi ermenî, rûsî û azerî) behsa elîfbaya kurdî ya latînî ya nû dike û armanca amadekirina elîfbaya latînî dide dîyarkirin. Li gorî pêşgotina pirtûkê kurd gelek caran xebata elîfbaya latînî kirine lê ji ber sedemên siyasî pêşketina elîfbayê çênebûye. Her wisa, behsa hewcedarîya elîfbeya latînî ji bo zimanê kurdî dike. Elîfbeya ku hatîye çêkirin jî di dawîya pirtûkê de hatîye dayîn.

НОВЫЙ КУРДИСКИЙ АЛФАВИТ.
(Сравнительная таблица)

Алф. по порядку	Курдские буквы	Армянская транскрипция	Русская транскрипция	Примечание
1	A a	Ա ա	А а	
2	B b	Բ բ	Б б	
3	C c	Շ շ	Ч ч	
4	Č č	Շ շ	Т+ч	
5	Ç ç	Շ շ	Д+ж	
6	D d	Դ դ	Д д	
7	E e	Ե ե	Э э	
8	Ə ə	ԵԼ ել	Эа	
9	F f	Ֆ ֆ	Ф ф	
10	G g	Գ գ	Г г	
11	Q q	Ղ ղ	Г мягкое	
12	H h	Հ հ	—	
13	I i	Ի ի	И и	
14	Ь ь	Է Է	и мгновен.	
15	J j	ԴՅ ղյ	Й й	
16	K k	Կ կ	К к	
17	Q q	Ք թ	Кх	
18	Q q	ԿՂ կղ	Кы	
19	L l	Լ լ	Л л	

Алф. по порядку	Курдские буквы	Армянская транскрипция	Русская транскрипция	Примечание
20	M m	Մ մ	М м	
21	N n	Ն ն	Н н	
22	O o	Օ օ	О о	
23	Ə ə	Օ օ	О мягкое	
24	W w	Ու ու	У-и	
25	P p	Փ փ	П п	
26	R r	Ր ր	Р р	
27	S s	Ս ս	С с	
28	Ş ş	Շ շ	Ш ш	
29	T t	Տ տ	Т т	
30	U u	Ս ս	У у	
31	V v	Վ վ	В в	
32	X x	Ջ յ	Х х	
33	Z z	Զ զ	З з	
34	Y y	Ի ի	Ж ж	Их на подобии арабск. «هم»
35	Ə ə	—	—	

Di pirtûkê de ji bo metoda perwerdekirinê, bi gelemperî piştî ku tîp hatine dayîn mînakên dîtbarî jî lê hatîye zêdekirin. Ev şêwe ji bo ku zarok tîp û fotografan di hişê xwe de bi hev re têkildar bikin û zûtir hîn bibin hatîye bikaranîn. Weke Mînak:

Ji bo tîpa “r” yê:

X I. r, u, o, v, i, ə, e, a, n.



ro




oro, ro... ro...



ru



ruvi



nir

Oro! ruvi, ruvi! ruvi ruvi.
Oro, rava! ravi, rava.
a, ə.


nure. na. nə. nan.
nure nan ani.

Jê cudatir, di pirtûkê de navên mehan hatîye dayîn û kêmbê jî di çend cihan de pirsên matematîkê hatîye pirsîn. Di pirtûkê de ji bilî cihên folklorîk û metnên ku ji bo zarokan hatine amadekirin, em li rastî gelek helbest û metnên sîyasî yê propagandaya Sovyetê tên ku piştî Sovyeta Sosyalîst ava dibe dixwaze di hemû berhemên yê werin

çapkirin de divê propagandaya sosyalîzmê û serokan were kirin. Dema em jî bala xwe didin naveroka pirtûkê bi navê *Kooperatîva çawa dixevitin, Kara kooperatîvê gundîyara çîye?*, *Ez naxwazin edî koçerîyê*, *8 Adarê, Rojê 1 Gulanê, Nalog, Kolxoz, Hûrîyeta Oktyabrê û Rojlemê roja hûrîyetê* metnên propaganda û teşwîqa sosyalîzmê hene. Her wisa bi navê *Herdu dijmin, Beyreqa sor, Îternatsîonal û Lozung* helbest hene ku ew jî pesnê sosyalîzm û Sovyetê didin.

2.2.1.1.1. Lorî

Dema em li pirtûkê dinîhêrin dibînîn ku di rûpela 31ê de lorîyek heye û ev lorî bi wêneyekî dayîkeke ku pitika xwe dihejîne hatiye xemilandin. Di pirtûkê de tenê lorîyek heye:



*Lurî Lurî,
 Tumê hewşanê li mi ba bû,
 Mi dî kareke xezala li ber rabû,
 Ne ba bû, ne baran bû,
 Nizanim çima îsa xezala min unda bû
 Lurî, lurî, lurî!
 Ez ê lurîka xe dilurînim,
 Qasêkî xemê xe direvînim,
 Lurî, lurî, lurî!
 Tumê hewşanê li mi kursî,
 Mi dî kareke xezala ber melîsî,
 Ne kull bû, ne hal bû,
 Ez nîzam kud ra bû,
 Li ber berdilka dilê min reqîsî.*

2.2.1.1.2. Pêkenok

Di nav pirtûkê de gelek metn hene û armanca wan e sereke pêşketina xwendina zarokan e. Di vê pirtûka perwerdeyê de yek ji cureyeke metnan jî pêkenok e. Di rûpela 32yê de bi navê *Ker, kor, rût û topal* (ker dengên dibihîze, kor hin kesan dibîne, rût jî şêlandinê ditirse û topal jî direve) û di rûpela 37ê de jî bi navê *Nêçîrvan û hirç* (nêçîrvanek hirçekî digire lê pişt re hirç wî digire û bernade) du pêkenok hene.

2.2.1.1.3. Çîrok


Di nav pirtûkê de metnên herî zêde çîrok in. Amadekarên pirtûkê di pirtûkê de giranî danîne ser çîrokên fabl û di hin dawîyên çîrokan de jî bi gotineke pêşîyan ve girêdane. Em dikarin çîrokên di pirtûkê de wiha rêz bikin:

Çîroka Kor (di çîrokê de ew peyama tê dayîn ku carna hin merivên çavê wan dibînin ji koran gelekî kortir in), *Reşêle Xapand* (yek ji hatina reşêle re dixape pez û dewarê xwe berdide çolê, piştî pez û dewarê wî hemû qir dibin), *Legleg* (behsa mezinbûna çûçikeke leglegekî dike), *Qijika feraset* (behsa qijikekî dike ku qijik kevîr diavêje şîşeya nîvtijê av û av bilind dibe, ew jî ava xwe dixwe), *Mişkê Aqil* (behsa du mişkan dike ku bê çawa herdu mişkan hêkek birine hêlîna xwe), *Du Heval* (şîreta xirabî û xayîntîya hevaltîyê dike), *Dîk û Kevirê bahalî* (dîkek nava xwelîyê de kevîrekî giranbiha dibîne lê şûna kevîr xwezîya xwe bi ceh tîne), *Du kotan* (Behs dike ku du kotan ji hev diqetin, yek dikeve destê cotkarekî û tê şixulandin, ya din dimîne û zeng digire. Çîrok di dawîyê de bi gotinên pêşîyan wateyê tîne li ser wê yekê ku kî bixebite zeng nagire.), *Dîwana Meymûnê* (du pisîk dixwazin meymûn penêrê wan parve bike lê meymûn bi hîletî penêrê wan perçe perçe dike, pisîk poşman dibin), *Murîyê xîret, hespê bavo bexîret* (Behs dike ku murî havînê xebat dike û ji bo zivistanê debara xwe kom dike lê hesp dixwe û digere. Di dawîyê de dibe zivistan û hesp dixwaze murî ew xweyî bike lê murî hesp xwedî nake), *Qijik çûçikê xwe re şîret dike* (Behsa şîreta qijik û aqilbûna çûçikan dike), *Rovî û kew* (behsa fêlên rovî li ser kewê dike), *Rovî û beq* (behsa rovîyekî dike ku çawa li pey beqekî dikeve û dawîyê de dîsa poşman dibe).

2.2.2. Ronaî-Kitêba Alfabaya Kurmancî

Piştî pirtûka *Xo-Xo Hînbûna Xondîna Nivîsara Kurmancî* pirtûkeke perwerdeyê ku ji bo zarokên kurdan bi elîfbeya latînî hatîye amadekirin *RONAÎ* ye. Ev pirtûk di sala 1931ê de ji aliyê Marogulov û R. Dramyan li Rewanê çap dibe. Ev pirtûk jî wekî

ya *Xo-Xo Hînbuna Xondîna Nivîsara Kurmancî* di wê armancê de ye ku zarokên kurd ên sêwî ji zimanê dê perwerdeya xwe bibînin û bielimî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî.



Her wisa, wekî pirtûkên wê demê û wekî hemû pirtûkên perwerdeyê, di vê pirtûkê de jî gelekî zêde propagandaya sosyalîzmê tê kirin û îdeolojîya Sovyetê ji bo zarokan tê teşwîqkirin. Weke mînak, di pirtûka *Ronaîyê* de bi navê *Artêla Zara*, *Komuna Zara*, *Baxçê Zarada*, *Oba Kolxozê*, *Malxwêtiya Kolxozê*, *Nav Bostênda*, *Oktyabra(çîrya) Sor*, *Qulçê Lênîn*, *Keleş û Nûrê û Qanûna Oktyabrîka* hin metin hene ku propagandaya jîyaneke komînal dikin û pesnê Lênîn û sosyalîzmê didin. Her wisa bi navê *Gime-Gime*, *Baxçê Zara*, *Ev Fabrikeye*, *Em Herd jî birê Hevin*, *Pîyonêra*, *Zarê Oktyabrî*, *Ser mezelê Lênîn û Pîyonêr* helbest û marş hene ku ew jî îdeolojîya Sovyetê hînî zarokan dikin û pesnê mezinbûna îdeolojîyê didin.



(*RONAÎ-KITÊBA ALFABAYA KURMANCÎ*, r. 56)

2.2.2.1. Naveroka Pirtûkê

Dema em bala xwe didin naveroka vê pirtûkê, ji pirtûka *Xo-Xo Hînbuna Xondîna Nivîsara Kurmancî* jî alîyê folklora zarokan (çîrok û tiştên dîtir) hinekî qels maye.

Wisa ku di naveroka pirtûkê de qet çîrokên gelêrî nehatîye dayîn lê ji alîyê perwerdeyê ve zêdetir li ser matematîkê sekinîye û zêdetir cih daye beşên hîndarîyê. Dîsa jî dema em bala xwe didin naveroka pirtûkê bi navê *Zarê Mekteba, Baxçê Zara, Golka Qol, Bizina Pîrê, kî gerek nêçîrvan be?, Elegez û Lolo Kuro* helbestên zarokan hene. Her wisa nivîskarên pirtûkê xwestine zarok ji alîyê muzîkê ve jî pêş bikevin û bi navê *Nurê Çû Pincarê û Çivîka Çûk* du heb stranên zarokan tevî pirtûkê kirine.

2.3. Kadroyên Pêşîn û Xebatên Perwerdeya Zarokan

Zarokên kurd ên ji ber zulmê revîbûn û di sêwîxaneyan de diman bi dûmahîya demê re xwe gihandin û heya dawîya salên 1930î bûn kadroyên kurd ên pêşîn.

Kadroyên Kurda ye ewlin sêwîyê kurd bûn, ku ji qir û bira salên 1918-1920an da dê û bavê xwe unda kiribûn, sêwîxana da mezin bûbûn, xwendina xweye navîn li wir standibûn. Ji wan gelek zimanê dê jî bîra kiribûn, bi ermenî diaxivîn (Boyîk, 2004:13). Lê bi alîkarîya ermenîyên, ku dostên kurdan bûn, zarokên sêwî hêdî hêdî bi zimanê dê perwerde dîtin û hatin asta dersdayîna zimanê kurdî. Kesên ji kadroya pêşîn, wekî Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Cerdoyê Gêncî û Casimê Celîl dest bi kar û barê zimanê kurdî kirin. Heya sala 1937ê, ku piştî sala 1937ê gelek kadroyên pêşîn hatin girtin û sirgûn kirin, gelek xebatên perwerdeyî, çandî û hunerî hatin kirin. Bi taybetî jî ji alîyê perwerdeya zimanê kurdî gelek pirtûkên dersan hatin nivîsandin û weşandin. Ji kadroyên pêşîn, Hecîyê Cindî bêguman bavê folklorê kurdî ya Sovyetê tê hesibandin ku wî gelek xebat û berhemên cûrbicûr weşandine. Hin berhemên Hecîyê Cindî yên ji bo zarokan hatine amadekirin û têkildarî wêjeya zarokan in em dikarin wiha bidin:

Berhemên Pêdagogîyê

1. Metodîka zimanê kurmançî, bona xwendinxanê dereca ewlîn, Yêrêvan, 1932.
2. Xebernama fileyî-kurmançî (tevî hevala), Yêrêvan, 1933.
3. Rêzmana kurmançî, bona mektebê (dibistanê) ortê (tevî prof. A. Xaçatryan), Yêrêvan, 1935.
4. Xebernema têrmînologîyê, ermenkî-kurmançî (tevî prof. A. Xaçatryan), Yêrêvan, 1936.
5. Programa zimanê kurmançî. Bona dersxanêd I-IV (tevî E. Evdal), Yêrêvan, 1936.
6. Programa zimanê kurmançî. Bona mektebên ortê (tevî E. Evdal), Yêrêvan, 1936.

7. Programa zimanê kurmancî, bona dersxanêd 5-6 (tevî E. Evdal), Yêrêvan, 1953.
8. Programa zimanê kurmancî, bona dersxanêd 2-4 (tevî E. Evdal), Yêrêvan, 1953.

Pirtûkên Ziman û Wêjeya Kurdî yên Dersê

1. Beyraqa sor, bona koma ewlin, Yêrêvan, 1932.
2. Emirê teze, bona koma 2, Yêrêvan, 1932.
3. Dinya teze, kitêba zimanê kurmancî bona koma 5-6-7, Yêrêvan, 1932.
4. Beyraqa sor, elîfba bona koma ewlin, Yêrêvan, 1933.
5. Kolxoznikê derbdar, elîfba bona mezina, Yêrêvan, 1933.
6. Kitêba zimanê kurmancî, elîfba, Yêrêvan, 1934.
7. Elîfba bona koma ewlin, Yêrêvan, 1935.
8. Kitêba zimanê kurmancî bona mezina, Yêrêvan, 1934.
9. Kitêba zimanê kurmancî bona sala 2-a, Yêrêvan, 1934.
10. Kitêba zimanê kurmancî (tevî hevala) bona dersxana 6-a, Yêrêvan, 1935.
11. Elîfba bona mezina, Yêrêvan, 1936.
12. Kitêba zimanê kurmancî, Yêrêvan, 1937.
13. Kitêba zimanê kurmancî bona dersxana 7-a, Yêrêvan, 1937.
14. Elîfba û kitêba xwendinê bona sala pêşîn, Yêrêvan, 1937.
15. Elîfba, Yêrêvan, 1946, veçêkirî çap bûye salên 1951, 1954.
16. Elîfba, tevî Firîda Cewarî, Yêrêvan, veçêkirî çap bûne salên 1957, 1961, 1966, 1974, 1982.
17. Kitêba zimanê kurmancî, bona koma 3-a, Yêrêvan, 1933.
18. Zimanê dê, bona dersxana 3-a, Yêrêvan, veçêkirî çap bûne salên 1948, 1952, 1955, 1958, 1961, 1970, 1976, 1987.

Çîrokên Civata Kurdan (Hikyatêd cimata kurda)

1. Cilda pêşîn, Yêrêvan, 1961.
2. Cilda dudu, Yêrêvan, 1962.
3. Cilda sisya, Yêrêvan, 1969.
4. Cilda çara, Yêrêvan, 1980.
5. Cilda pêncî, Yêrêvan, 1988.
6. Cilda şeşa, Yêrêvan, 2005.

Ji bilî Hecîyê Cindî, di warê perwerde û wêjeya zarokan de kesên wekî Casimê Celîl, Emînê Evdal, Ordîxanê Celîl û Cerdoyê Gêncî jî gelek pirtûkên perwerdeya zarokan amade kirine û weşandine. Jê cuda di nav pirtûkên xwe yên perwerdehiyê de cih dane gelek çîrok û metnên bi zimanê ermenî, rûsî û hwd. wergerandî.

Di sala 1938'an de, bi biryara Moskovayê hemû ocaxên kurda yên rewşenbîriyê hatin girtin. Hem Texnikûma Kurda a Pedagogîyê, hem rojnama 'Rîya Teze' û hem jî redaksiyona weşanên Kurdî. Herwiha, di sala 1938'an de, alfabeya Kurdî ya li ser tîpên latînî jiyandariya xwe sekinand. Ji sala 1941ê ve, bergeha çanda Kurdî li dewsa alfabeya latînî cihe xwe dide alfabeya kirilî (Celîl, 2012: 12).

Piştî vegera tîpên kirilî dîsa kadroyên pêşî dest bi amadekirina pirtûkên dersan dikin û heya dawîya hilweşîna Sovyetê bêdomdar karê xwe berdewam dikin.

2.4. Çend Berhemên Zarokan ên Perwerdehiyê

2.4.1. Kitêba Zimanê Kurmancî (Bona Dersxana Sisya, 1935)

Hecîyê Cindî piştî sala 1930î gelek pirtûkên dersan amade kirîye ku yek ji wan jî pirtûka *Kitêba Zimanê Kurmancî* ye û ev pirtûk jî bo zarokên pola sêyem di sala 1935ê de hatiye amadekirin. Pirtûk jî aliyê Hecîyê Cindî tê hazirkirin û ji aliyê Neşra Hikumetê, li Rewanê çap dibe. Casimê Celîl rêdaktoriya pirtûkê dike.



2.4.1.1. Naveroka Pirtûkê

Pirtûka *Kitêba Zimanê Kurmancî* bi temamî 138 rûpel e. Dema em li naveroka pirtûkê mêze dikin, gelek nivîskarên wekî Emînê Evdal, Etarê Şero, Celîlê Reşo, Casimê Celîl, Ahmedê Mirazî, Heso Şamilov, Nûrî, Huseyîn Sadîqov û Wezîrê Nadir di pirtûkê de nivîs nivîsîne û nivîsên nivîskarên wekî M. Gorkî, H. Tûmanyân, L. Kaganovic, J. Carents, S. Noryan, Pakrovski, S. Gasparyan, S. Zoryan û Krilov jî aliyê

nivîskarên kurd ve hatine tercumekirin û wergerandin. Dema em bala xwe didine naveroka pirtûkê hemû naverok ji metnan, çîrokan, çîrokên menzûm, stran û ji helbestan pêk tê. Ev yeka ji pirtûkê dixê kategoriya pirtûkên perwerdeyê ya edebîyatê. Herwisa di pirtûkê de, wekî hemû pirtûkên wê demê, hin metn bi naveroka xwe ve pesnê sosyalîzmê û pesnê avakar û rêvebirên Sovyeta Yekgirtî Lênîn û Stalîn didin.

2.4.1.1.1. Helbest

Di vê pirtûkê de bi tevahî 16 helbest ji bo xwendina zarokan hatine nivîsîn. Di rûpela 16em de helbesteke bi navê *Havînê* hatiye nivîsîn ku nivîskarê wê nehatiye diyarkirin. Helbest bi terzeke pastoral hatiye nivîsîn û behsa Havînê û xebata zevîyan dike. Helbesta duyem jî ya Etarê Şero ye. Navê helbestê *Em jî dixûnin* e. Helbest behsa xwendinê dike û behsa pergala Sovyetê dike. Helbesta sêyem a S. Gasparyan e. Navê helbestê *Zevîê Kolxoza Me* ye. Ev helbest behsa pergala kolxozvanîyê û zevîyên kolxozan dike. Helbesta çarem helbesteke bi navê *Bîstûşêş Kommunar* e ku nivîskarê wê nehatiye diyarkirin. Helbest behsa gernasîya bîst û şeş kommunaran (şoreşger) dike. Helbesta pêncem a Casimê Celîl ya bi navê *Kurê Min* e. Casimê Celîl ev helbest ji bo kurê xwe nivîsiye û di tê de behsa şerê sosyalîzmê, zarên êtîm û avakirina sosyalîzmê kirîye.



Helbesta şeşem helbesteke bi navê *Paîzê* ye. Nivîskarê wê nehatiye diyarkirin û helbest bi terzeke pastoral behsa payîzê û xweşîyên wê dike. Helbesta heftem jî ya

Etarê Şero ya bi navê *Neşirxana Me* ye. Ev helbest ji bo weşanxaneyê wê demê hatîye nivîsîn û bi tevî xebatkarên wê, pesnê weşanxaneyê hatîye dayîn.

Helbesta heştem a di pirtûkê de bi navê *Eçoyê Batrak Tengasî-Firaqetî* hatîye nivîsîn. Nivîskarê helbestê ne dîyar e û behsa tengasîyên dewra axatîyê û behsa firaqetîyên dewra sosyalîzmê dike. Helbesta nehem a Etarê Şero ya bi navê *Borîya Me* ye û behsa borîzanê û xweşîya wê dike. Helbesta dehem a Huseyîn Sadiqov a bi navê *Eskerê Sor* e. Helbest bi armanca propagandayê hatîye nivîsîn. Helbesta yazdehem a Casimê Celîl a bi navê *Rewanê* ye.



Helbesta diwazdehem jî ya Ahmedê Mirazî ya bi navê *Traktor û Şofêrê* ye. Helbest behsa cotkarîya şofêr û traktora wî dike. Helbesta sêzdehem jî ya Emînê Evdal ya bi navê *Heçhecikê* ye. Helbest behsa Heçhecikê û fêda wê dike. Ji van helbestan cuda sê helbestên din jî hene ku ji bo propagandaya sosyalîzmê hatine nivîsîn. Ev helbest bi navên *Yekê Gulanê*, *Înternasional*, *Pîoner li Zozana* hatine nivîsîn.


2.4.1.1.2. Çîrokên Menzûm

Di pirtûkê de tevî hev heft çîrokên menzûm hatine nivîsîn. Çîroka yekem a helbestvanê ermenî Carents e û bi sarnava *Hevalêd Hev* di rûpela 6em de hatîye nivîsîn. Çîrok behsa bavekî, kurê wî û pisîka kurê wî dike. Çîroka duyem a menzûm bi wergera Wezîrê Nadîr çîroka bi navê *Muristang û Mês* e. Çîrok ji kîjan zimanê hatîye wergerandin nayê dîyarkirin.

MURISTANG U MEŞ

Roke meşe gotê muristange;
Ty zêringî jani, ez zêringam.
Kyda baxazim, eze baxerim, herim
Xyera eze hardora bi helinkam,
Ser her xyrekl runem u baxym.
Zê te hynryterim, ez dâ bezim.
Herke ty herî seba heb anîne
Haca te tyno zê bo ferine.
Herke berî mendên, eze berovim,
Seba ferine per u baska vokim.
Baske min xitjar dane seva min
Fekara min qet tyno, çê heje zê bo men?
Her gav hazro xarîna min,
Deneda kl dâstî mina min?
Çiye paldana min hevîrmuse nexş
Menzila min meclisa şah-paşa xaş.
Tyno hyrmeta te, nêl jera te,
Ça beze, gelo, çê hynryre te?
Muristange got: Eê berr pîrsa xya.
Bese hundêki pesna bade xya.
Havine berov nakî xarîne
Ewe, biel demîni zêvstane.

46



Ûger havine dâkêşînem çêfa,
Le wexta zêvstane dâblînem sefa.
Ky seba xebate ne cu tînbêl
Axerîja şyxyl dîde êngel.
Her kl ky hênekî bişî ne zehmet
Halbet ky we bîbe axerî rêhet.

Çîroka sêyem a menzûm a bi navê *Elî Beg û Şêx Celo* ye û nivîskarê wê Celîlê Reşo ye. Di çîrokê de Şêx Celo û Elî Beg di navbera xwe de diaxivin û gazinên xwe ji bolşevîkê û sosyalîzmê tînin. Li gorî dîyalogan Şêx Celo dibêje min debara xwe ji xelqê dikir, Elî Beg jî behsa xwarin û begtîya xwe dike. Mirov dikare bibêje ku ev çîroka menzûm polîtîkaya Sovyetê ya li ser şêx û began jî dide dîyarkirin. Çîroka çarem jî ya nivîskar Krîlov a bi navê *Hirç û Şêr* e. Wezîrê Nadir ev çîrok wergerandîye kurmancî û di pirtûkê de weşandîye. Di çîrokê de hirç û şêr ji bo nêçîrê şer dikin lê nêçîr dibe para rûvî.

Çîroka menzûm ya pêncem jî ya bi navê *Ruvî* ye û nivîskarê wê Emînê Evdal e. Di çîrokê de behsa rovîyekî fêlbaz tê kirin û behs tê kirin ku çawa ji alîyê nêçîrvanekî û tejiyên wî ve tê girtin.

Çîroka şeşem ya Menzûm jî ya nivîskarê ermenî H. Tûmanyân a bi navê *Şikyatê Pişikê* ye. Ev çîrok ji alîyê Casimê Celîl ve hatîye wergerandin. Di çîrokê de behsa girîna pişikê dîke û pişik dibêje ku min katix nexwarîye lê avêtine stûyê min. Çîroka dawî ya menzûm ya pirtûkê bi navê *Masî, Werdek û Kêzikê* ye ku ji alîyê Krîlov hatîye nivîsîn û ji alîyê Wezîrê Nadir ve hatîye wergerandin. Çîrok behsa Masî, Werdek û Kêzîkê dîke ku ev her sê ajal dixwazin erebeyekê bikşînin ji bo debarê. Lê erebe cihê xwe naliqe. Werdek dixwaze bifire, masî dixwaze bikeve avê û kêzik dixwaze şûnde bimîne.

2.4.1.1.3. Stranên Zarokan

Di pirtûkê de sê stran hatine nivîsîn ku yek ji wan nivîskarê wê Heso Şamilov e û navê stranê jî *Keçka Kolxozê* ye. Ev stran li ser keçikeke xweşik hatîye derxistin ku li kolxozê gundekî dixebite. Tê de pesnê xebat û bedewîya keçikê tê dayîn. Straneke din jî ya *Xecê û Sîyabend* e ku ji gotina Gogê Ûsiv hatîye nivîsîn. Ev stran varyanteke kilama Sîyabend û Xecê ye ku behsa destanê dike. Strana dawî bi navê *Horovêl* e ku ji gel hatîye tomarkirin. Mirov dikare bibêje ku ev stran jî strana paletîyê ye.

2.4.1.1.4. Çîrok û Metnên Xwendinê

Di vê pirtûka perwerdeyê de gelek çîrok û metnên ji bo xwendinê hatine nivîsîn. Di destpêka pirtûkê de em rastî metneke bi navê *Selam* tên ku L. Kaganovic nivîsîye û ji zarokan re pesnê desmala sor dide. Piştî metneke bi navê *Derbidarin* heye ku tê de behsa du xwendekaran dike. Wisa ku xwendekarek nexweş dikeve û demekê ji mektebê dûr dikeve. Dema vedigere mektebê hevalê wî alîkarîya wî dike. Metneke din a xwendinê jî S. Davtyan bi navê *Cemîle ji mektebê şûnda nema* nivîsîye. Metn behs dike ku li gundekî kurmanca mekteb vedibe û zarok perwerdeyê dibînin. Lê şêx û bavên keçan nahêlin keç biçin mektebê. Mamoste jî di dawîyê de navên wan kesan dide hikûmeta sosyalîst û ew kesên ku nahêlin keç bixwînin tene girtin. Herwiha metneke çîrokî jî ya S. Noryan a bi navê *Dîdara Cezo* ye ku behsa perwerdekirina Dîdara Cezo bi zimanê kurmançî tê kirin. Di çîrokê de Dîdara Cezo bi pirtûka *Ber bi emrê teze* ya R. Dramyan hînî xwendin û nivîsandinê dibe. Ev pirtûk di sala 1931ê de ji bo kesên temenê wan mezin hînî xwendin û nivîsandina kurmançî bibin hatîye amadekirin.



(Ber Bi Emrê Teze- Seva Mezina-1931)

Mirov dikare çîrok û metnên mayîn ên vê pirtûkê wiha bide nasîn:

Nêçîrvanê Derewîn: Ev çîrok ji aliyê H. Tûmanyar hatîye nivîsîn û Casimê Celîl wergera çîrokê kirîye. Çîrok behsa serpêhatîya nêçîrvanekî dike kû hemû tiştên ku nêçîrvan dibêje derasayîne û ne mimkin in.

Quling: Ev çîrok ji aliyê Pakrovskî hatîye nivîsîn û behsa berxvanekî û qulinga wî dike ku çawa berxvan qulingê mezin dike û quling jî di dawîyê de difire û tev li hevalên xwe dibe.

Zevîyê Xwendinxanîyê: Ev çîrok ji aliyê Emînê Evdal ve hatîye nivîsîn û behsa zevîyeke xwendinxaneyê dike û nîşan dike ku çawa xwendekar bi hev re lê nihêrîne û bi yek milî çinîne.

Karik: Ev çîrok ji aliyê H. Tûmanyar ve hatîye nivîsîn û Casimê Celîl wergerandîye kurmancî. Tê de behsa karekî tê kirin ku çawa dengê dîya xwe û ya gur jî hevdû derdixe û nahêle gur wê bixwe. Mirov dikare bibêje ku gelek varyantên vê çîrokê hene.

Mala Teze: Ev çîrok nehatîye dîyarkirin ku ji aliyê kê ve hatîye nivîsîn. Tê de behsa meraqa keçekê li ser kevîrên sivik û çêkirina maleke nû dike.

Kerem Kete ser Xebatê: Nivîskarê çîrokê nehatîye dîyarkirin. Tê de behsa zarokekî bê dê û bê bav tê kirin ku çawa vebêjer karekî dide wî û alîkarîya wî dike.

Şeveke Nav Mêşa da: Ev serpêhatî ji aliyê S. Zoryan hatîye nivîsîn û behsa çend hevalan dike ku çawa şevê di nav darên hurmîyan de mane.

Serhatya Çivîkê: Ev çîroka fêl ji gel, kesekî bi navê Kazo hatîye tomarkirin. Di çîrokê de behsa serhatîya çivîkekê dike ku wekî dawîyê de jî çivîk dibêje:

Tur...Tur..Tur

Min strik da hef nana

Heft nan da heft berana

Heft beran da bûkekê

Bûk jî min da blûrekê

Tur..Tur...Tur..

Kis: Ev metn behsa rewşa keçekê, rewşa malbata wê û hezkirina wê ya li hember dibistanê dike.

Gur: Ev çîrok ji aliyê H. Tûmanyar hatîye nivîsîn. Çîrok ji devê kesê yekem tê vegotin û nivîskar wekî bîranîneke xwe bi awayekî çîrokî vedibêje. Çîrok

serpêhatîya zarokekî 16-17 salî dike ku çawa li pey gayê xwe hatîye gomê û guran gayê wî xwarîye û li pey wî ketine.

9-ê Kanûnê: Ev metn ji alîyê Maksîm Gorkî ve hatîye nivîsîn û behsa bûyerekê dike ku çawa di wê dîrokê de gel ji ber feqîrî û tinebûnê diçin ligel paşa û eskerên paşa bi hezaran mirovan dide kuştin.

Berê û Niha: Ev metn behsa berîya sosyalîzmê û piştî sosyalîzmê dike.

Di pirtûkê de hin metn hene ku behsa jîyan, serpêhatî û kirinên Lênîn dikan. Ev metn bi navên *Vladimir Ilyic Lênîn*, *Vladimir Ilyic Lênîn çawa hîn dibû*, *Lênîn çawa hêsa dibû*, *Lênîn nêçîrvan*, *Lênîn şaxmatîst* û *Rast hatin* hatine nivîsîn.

Pionêr: Ev çîrok behsa zarokekî pionêr dike ku çawa li ser hesinên trêne li erdê dikeve û dema trêne tê û wî xilaz dike.

Çawa firîm: Ev çîrok behsa xeyala zarokekî dike ku çawa dixwaze wekî teyran bifire û piştî jî bavê wî ew li balafirê siwar dike.

Cêk: Ev çîrok behsa kuçikekî bi navê Cêk dike ku çawa di şer de alîkarîya şervanan dike.

Bihar: Ev metn behsa hatina biharê û xweşîya wê dike.

Golka em rind bidin xweyîkirinê: Çîrokeke kurt e ku behsa du zarokên hevalên hev û behsa xweşxweyîkirana wan ya golikên kolxozê dike.

Dayîk: Ev çîrok ji alîyê H. Tûmanyar ve hatîye nivîsîn û behsa çûçikekî hehecikekê dike ku çawa ji hêlînê ketîye û pisîkê ew xwarîye.

Zozan: Ev çîrok behsa keçeke bi navê Zozanê dike ku çawa malbata wê ew bi axayekî temendirêj re zewicandine û piştî re çawa Zozan xilaz bûye û çûye dibistanê.

Sovxoza hevirmişda: Ev metn behsa derketina kurman dike ku çawa piştî re dibine perperik.

Dîya min çawa kuştin: Ev çîrok behsa keçeke bi navê Vera dike ku çawa dîya wê ji ber komûnîstîyê dikeve girtîgehê û tê kuştin.

Palto: Ev çîrok behsa zarokekî xwendekar dike ku li gor çîrokê zarok li ser texte dinivîse $2 \times 2 = 1$ û mamosteyê wî ceza dide kurik û paltoyê li ser wî dide derxistin. Lê zarok ew qas feqîr bûye ku binê paltoyê wî de kiras jî tunebûye.


Êbûrkirina zarê pala li welatê kapîtalîstada: Ev çîrok behsa zarokên feqîr dike ku çawa ji alîyê zarokên dewlemendan ve tîrîşkirin û çawa zarokên feqîr behsa şoreşê dikan.

Bavê min ştrêykrêxêr nîne: Behsa zarokekî bi navê Conson dike ku hevalên wî li dibistanê dibêjin Conson bavê te xayînê Sovyetê ye. Conson jî diçe mal û ji bav dipirse û hîn dibe ku bavê wî xayîn nîne.

Dawîdoz: Ev çîrok behsa kesekî bi navê Dawîdoz dike ku çawa xalê wî neheqîyan lê dike û ew jî heqê xwe ji xalê xwe distîne. Ev çîrok çîrokeke gelêrî ye û ji kesekî bi navê Baso hatiye hildan.

2.4.2. Kitêba Zimanê Kurmancî (Bona Dersxana Çaran, 1936)

Kitêba Zimanê Kurmancî di sala 1936ê de ji aliyê Emînê Evdal ve ji bo zarokên pola çarem hatîye amadekirin. Herwisa ji aliyê Neşra Hukûmetê ve hatîye weşandin. Pirtûk ji aliyê Casimê Celîl û Hecîyê Cindî ve hatîye redaktekirin.



2.4.2.1. Naveroka Pirtûkê

Pirtûk ji 208 rûpelan û ji 66 nivîsan pêk tê. Metnên di nava kitêbê de ji helbest, çîrok û metnên hînbûnê pêk tên. Di gelek metnan de pesnê sosyalîzmê, jîyana kollektîvî û serokên pergala Sovyetê tê dayîn. Ew metn dikarin wiha were rêzêkirin:

2.4.2.1.1. Metn

Gerek Meriv Hîn Bibe (Ji Xeberdana Stalîn): Metnek li ser giringîya hînbûnê hatîye amadekirin. Di metnê de gazîkirin û bangkirinek heye. Metn pêşî behsa taybetî û giringîya ilmê dike, paşî jî giringîya ilm û hînbûnê bi pêkanîna Bolşevîkê ve girêdide. Di metnê de pesindayîna bolşevîkê diyar e.

Cem îlîç: Hevcivînek dixwaze hevnasîna xwe digel Lenîn çêbike. Hevcivîn, ji hin kesên cahil pêk tê ku ew kes li ser hevdîtina Lenîn gelekî kelecânî ne. Di dawîyê de ew hevcivîn hevnasîna xwe ligel Lenîn çêdikin û gelek şa dibin. Di dawîya nivîsê

de, derbarê nivîsê de sê pirs tînin. Nivîs ji alîyê Emînê Evdal ve ji rûsî hatîye wergerandin.

Lênîn û Lî Can: Lî Can navê xortekî ye ku paletîyê dike. Nivîs behsa jîyana Lî Can a paletîyê dike. Di vê metnê de dîsa behsa Lenîn hatîye kirin ku Lî Can li ser mirina wî gelek li ber xwe dikeve. Ji ermenkî, ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye wergerandin.

Lênihêrandina Pêşîn: Metn ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye wergerandin. Nivîs li ser meseleyên kolxoz û kollektîvbûnê tevdigere. Di nivîsê de ji alîyê gundîyan ve komînîzm tê naskirin. Di dawîya nivîsê de du pirsên derbarê nivîsê de tînin.

Nîkîtîn: Di metnê de kesek bi navê Nîkîtîn heye ku pir feqîr e û ji xwe re li karekî digere. Nivîs ji alîyê Emînê Evdal ve ji rûsî hatîye wergerandin. Di dawîya nivîsê de du pirsên derbarê nivîsê de tînin.

Mileta Tivaqa Şêwrê: Emînê Evdal ji rûsî wergerandiye. Metn behsa pêkhatina Şoreşa Oktobirê dike. Di nivîsê de pesnê komînîzm û xerabxistina feodalîzmê berçav e.

Mêrkê: Metn ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye wergerandin. Mêrkê navê mêrekî ye ku di nivîsê de Mêrkê wekî gundîyekî feqîr tê teswîrkirin. Nivîs behsa Mêrkê dike ku tevî bolşevîkan dibe.

Ber bi Gundê Kolxozvanîyê: Ji alîyê Cerdoyê Genco ve hatîye nivîsandin. Metn behsa serpêhatîya hin gundîyan dike ku hevnasîna wan gundîyan digel kolxozan çêdibe.

Hafa Gêlî: Ji alîyê B. Muradyan ve hatîye nivîsandin. Nivîs behsa xweşîkîya kolxozan dike.

Nehê Kanunê: Ji alîyê Emînê Evdal ve ji M. Gorkî hatîye wergerandin. Nivîs behsa serhildanekê dike. Di dawîya nivîsê de pirsê derbarê nivîsê de tê pirsîn.

Zevî: Nivîsek bi zemanek edebî-estetîk hatîye nivîsandin. Behsa rêwîtiyekê tê kirin. Nivîskarê nivîsê nedîyar e.

Bîranîn Derheqê Lenîn Vlademîr Îlîç li Surgûnê: Emînê Evdal ji ermenkî wergerandiye. Di nivîsê de gundîyek behsa Lîenîn û hevnasîna xwe ya digel Lenîn dike. Di nivîsê de pesindayîna Lenîn berçav e.

Zevya Xandinxanîyê: Metn ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye nivîsandin. Metn behsa serpêhatîyên xortekî ku navê wî Memê ye dike ku ew 10-12 salî ye û bûye pîoner.

Capaêv: Nivîs ji alîyê Emînê Evdal ve ji Furmanov hatîye wergerandin.

Çomerde Bira: Ji alîyê Emînê Evdal ve ji Şahbazyan hatîye wergerandin. Metn behsa hevaltîya du kesên bi navê Galo û Çomerde dike. Du heval rêwî ne û nivîs behsa serpêhatîyên wan dike.

Dûajo: Nivîs ji alîyê Erebe Şemo ve hatîye nivîsandin. Nivîskar bi mînakê malbata xwe behsa rewşa gundîyên kurmanc ên li Ermenîstanê dimînin dike. Di dawîya nivîsê de du pirsên derbarê nivîsê de tên dîtin.

Yekê Gûlanê: Ev nivîsa Maksîm Gorkî ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye wergerandin. Nivîs behsa şoreşa karkeran dike. Pavel û Andre du hevalên hev ên serkêşên şoreşê ne û dayîka Pavel di qewîmîna şoreşê de xwedî roleke mezin e. Di nivîsê de behsa şoreşa yekê gulânê tê kirin.

Zavodêda: Ji alîyê Emînê Evdal ve ji rûsî hatîye wergerandin. Metn behsa zehmetîya karkerîyê dike.

Vekirina Cewê: Ji alîyê Hecîyê Cindî ve ji M. Malvelyan hatîye wergerandin. Metn bahsa pîrozbahîya avabûna hikumeta şewrê dike. Herwiha di nivîsê de pesnê sosyalîzmê tê kirin.

Zubêde: Ji alîyê Hecîyê Cindî ve ji M. Armên hatîye wergerandin. Metn behsa keçikeke bi navê Zubêde dike. Keçik di gelek mijaran da li hemberî bavê xwe tê û bi kesekî li gorî dilê xwe re dizewice.

Xebata Dewrêş: Ev metn ji alîyê Wezîrê Nadir ve hatîye nivîsandin. Metn behsa serpêhatîyên xortekî bi navê Dewrêş dike ku Dewrêş berpisyarê komsomola gundê xwe ye û derbarê kolxoz û sosyalîzmê de gelek tiştan dizane.

Sûcok: Metn ji alîyê Emînê Evdal ve ji rûsî hatîye wergerandin. Di metnê de tê behskirin ku kesek bi navê Turgênêv digel ermenîyan diçe nêçîra werdekan. Turgênêv kesekî bi navê Sûcok nas dike ku di nivîsê de behsa serpêhatîyên wan tê kirin. Di dawîya nivîsê de sê pirsên derbarê nivîsê de tên dîtin.

Razanê Dixwaze: Metn ji alîyê Emînê Evdal ve ji Çexov hatîye wergerandin. Metn behsa serpêhatîyên tund ên keçikeke sêzdeh salî ya bi navê Varka dike. Di dawîya nivîsê de pîrsek di derbarê nivîsê de tê dîtin.

Plenê Kavkazê: Nivîs ji alîyê Emînê Evdal ve ji L. Tolstoy hatîye wergerandin. Nivîs behsa leşkerên dîlgirtî yê Kafkayayê dike.

Lampa Elektîrîkê: Ev metn ji alîyê S. Zoryan hatîye nivîsîn û ji alîyê Hecîyê Cindî ve hatîye wergerandin. Metn behsa kesekî bi navê Paqos dike ku ev kes ji bo firotina postê rovî dîçe bajêr û yekem car li bajêr lampeya elektrîkê dibîne.

Pajar Zavoda Nevdêta: Metn ji alîyê Emînê Evdal ve ji Şîrvanzade hatîye wergerandin. Nivîs behsa wê yekê dike ku agir bi zevîyên gundîyan dikeve û gundî bi hev re, mil bi mil agirê zevîyan dîtemirînin.

2.4.2.1.2. Helbest

Lenîn: Helbest ji alîyê Emînê Evdal ve ji rûsî hatîye wergerandin. Helbest behsa taybetmendî û giringîya Lenîn dike. Wisa ku di temama helbestê de pesîndayîna Lenîn berçav e. Helbest bi çêşê tê xwendin.

Înternasional: Helbest ji alîyê Emînê Evdal ve ji rûsî hatîye wergerandin. Helbest behsa giringîya înternasionalîzmê dike.

Dewe: Helbest ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye wergerandin. Nivîskar ligel deweyê xwe diaxive. Gazind dike ku deweyî wî êdî wekî berê ne baş e.

Şebeqê: Helbest ji alîyê Emînê Evdal ve ji H. Hakobyan ve hatîye wergerandin. Helbest behsa vejîn û hevîyê dike. Di dawîya helbestê de sê pîrsên derbarê helbestê de hatine pîrskirin.

Kurê Min: Ev helbeste ji alîyê Casimê Celîl ve hatîye nivîsandin. Di helbestê de helbestvan ji kurê xwe re behsa xweşî û nexweşîya rewşa civaka xwe dike. Herwiha helbestvan behsa başbûna Şoreşa Oktobirê jî dike.

Zînê: Helbest ji alîyê Casimê Celîl ve hatîye nivîsandin. Ji alîyê hûnerên edebî ve helbestek dewlemend e. Helbest behsa keçikeke ku navê wê Zînê ye dike ku dibe pîoner.

Devê Zinarê Rûşanê: Helbest ji alîyê kesekî ermenî yê bi navê N. Zaryan ve hatîye nivîsandin. Helbest behsa kuştina keseke bi navê “Rûşan” dike. Di dawîya helbestê de sê pirsên derbarê helbestê de tên dîtin.

Muhbetî: Helbest ji alîyê Wezîrê Nadir ve hatîye nivîsandin. Helbest ji alîyê hunerên edebî ve dewlemend e. Herwiha helbest behsa xweşikîya keçikeke bi navê Balaxanim dike.

Rewan: Helbest ji alîyê nivîskarekî bi navê Nûrî ve hatîye nivîsandin. Helbest behsa xweşikî û xweşîkbûna Rewanê dike.

Pîoner: Helbest ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye nivîsandin. Helbest behsa tevgera sosyalîzmê dike.

Koç: Helbest ji alîyê Emînê Evdal ve ji Mîrakyar hatîye wergerandin. Helbest behsa koç, koçerî û zeymetîyên koçbûnê dike.

Bihar: Helbest ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye nivîsandin. Di helbestê de behsa xweşikîya biharê tê kirin ku bihar di helbestê de ji bo kar, xebat û kolxozvanan wekî demsaleke giring tê teswîrkirin.

Du Hezkirin: Helbest ji alîyê Hecîyê Cindî ve hatîye wergerandin. Helbestvan di helbestê de behsa keçikeke dike ku navê wê Cemîle ye.

Ballad Derheqa Qelnêda: Ji alîyê Hecîyê Cindî ve ji Tarontsî hatîye wergerandin. Helbest ji diyaloga mirov û qelûnekê pêk tê. Qelûn behsa xwedanê xwe yê şervan dike.

Traktor: Helbest ji alîyê Erebe Şemo ve hatîye nivîsandin. Helbest behsa traktor û xweşbûna traktorê dike.

Aşê Me: Helbest ji alîyê Erebe Şemo ve hatîye nivîsandin. Helbest behsa aşî û xweşîkbûna hebûna aşî dike.

Klam Kolxozvana ra: Helbest ji alîyê Carents ve hatîye nivîsandin û ji alîyê Hecîyê Cindî ve hatîye wergerandin. Helbest behsa kolxozvanan dike û pesnê wan dide. Herwisa di helbestê de behsa Şoreşa Oktobir û Bolşevîkê tê kirin.

2.4.2.1.3. Çîrok

Memê û Eysê : Çîrokeke gelêrî ye ku behsa evîna du ciwanan dike. Çîrok bi helbestkî ji alîyê Hecîyê Cindî ve hatîye nivîsandin.

Ro: Ev çîrok ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye wergerandin. Di çîrokê de keçikeke pir nexweş heye ku bavê wê keçikê, xem û êşên xwe ji kulîlkan re dibêje. Çîrokeke kurt e û di piranîya çîrokê de bavê keçikê digel kulîlkan diaxive. Bavê keçikê, kulîlkan wekî ewladê royê dibîne û keça xwe yek ji wan kulîlkan dihesibîne.

Nêçîra Hirçê: Çîrok ji alîyê Emînê Evdal ve ji H. Tûmanyar hatîye wergerandin. Çîrok behsa du hevalan dike ku herdu heval xwedîyê xinzîran in. Herdu heval hirçekî dibînin û pey wî dikevin.

Çalank: Çîrok ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye wergerandin. Çîrok bi zimanekî estetîk hatîye nivîsandin û ji alîyê şayesandinê ve dewlemend e. Çalank navê kûçikê ye. Di çîrokê de nivîskar bîranînên xwe yê digel kûçikê xwe derdibire. Herwiha di çîrokê de nivîskar li ser Çalank giringî û taybetmendîya seyên din jî tîne ziman.

Se û Pişik: Çîrok ji alîyê Casimê Celîl ve ji Tûmanyar hatîye wergerandin. Çîrok wekî pirtûkeke serbixwe ji bo zarokan hatîye weşandin jî. Di çîrokê de pişik terzî ye û se diçe nik pişikê da ku kumikekî ji bo wî bide dirûnê.

Bizdo: Çîrokeke efsûnîye ku ji alîyê Hecîyê Cindî ve hatîye amadekirin. Li bin serenavê çîrokê tê diyarkirin ku ev çîrok ji çîrokên cimeatê hatîye wergirtin. Çîrok behsa kesekî tirsonek dike.

Derewîn: Çîrok ji alîyê Casimê Celîl ve ji Tûmanyar hatîye wergerandin. Çîrok behsa padîshahekî û gundîyekî dike.

Zembilfiroş: Çîroka kurdî ya gelêrî ye ku ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye hazirkirin.

Gîkor: Çîrokeke bi ermenkî ji alîyê Tûmanyar ve hatîye nivîsandin. Çîrok ji alîyê Hecîyê Cindî û Emînê Evdal ve tê wergerandin. Çîroka dirêj û temam bi awayekî serbixwe ji bo zarokan hatîye weşandin. Di vê pirtûka dersê de jî em rastî kurteya wê çîrokê û sê pirsên derbarê çîrokê de tên. Di bin serenavê xebatên wergerê de mijara çîrokê dê were behs kirin.

Bextê Çeto: Çîrok ji alîyê Emînê Evdal ve ji ermenkî hatîye wergerandin. Çeto gundîyekî feqîr e. Çîrok behsa serpêhatîyên Çeto ên xerab dike. Di dawîyê de du pîrsên derbarê nivîsê de tînin dîtin.

Karik: Çîrok ji alîyê Casimê Celîl ve ji H. Tûmanyar hatîye wergerandin. Di çîrokê de gotinên rîtmîk tînin dîtin. Di çîrokê de bizin rojê diçe çêrêyî, şevê tê malê. Karik her şev ji bo maka xwe derî vedike. Rojekê gurek diçe ku wê karikê bixapîne û bixwe. Lê karik naxape û çîrok diqede.

Çivîk: Çîroka H. Tûmanyar ji alîyê Casimê Celîl hatîye wergerandin. Çîrok behsa çivîkeke xapînok dike ku ev çîrok di gelek pirtûkên dersê de û di berhevokên kurdan de tê dîtin.

Du Bizinêd Serhişk: Çîrok ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye wergerandin. Çîrok behsa du bizinan dike ku ji bo derbasbûna pîrekê herdû bizin şer dîkin û dawîyê de ji ber ku dorê nadin hev herdu jî dikevin avê.

Gur: Çîrok ji alîyê Hecîyê Cindî ve ji H. Tûmanyar hatîye wergerandin. Çîrok behsa serpêhatîyên kesekî dike ku gayê wî wenda bûye û li gayê xwe digere û paşê jî rastî guran tê.

Du Rûvî: Çîrok ji alîyê Hecîyê Cindî ve ji çîrokên kurdî yê gelerî hatîye berhevkirin û nivîsandin. Di çîrokê de du rûvî di nava diyalogekê de ne û derbarê fehlên xwe de diaxivin.

Androglês û Şêr: Çîrok ji alîyê Hecîyê Cindî ve ji îngilîzî hatîye wergerandin. Herwiha ev çîrok di nav çîrokên klasîk ên cîhanî de cih digire. Çîrok behsa xortekî ku navê wî Androglês e dike ku Androglês rojekê strîyekê ji pîyê şêrekî derdixe. Piştî wextekî şêr di dualloyekê de rastî wî tê, wî nas dike û zerê nadîyê.


Kevirbîr: Çîrok ji alîyê Hecîyê Cindî ji D. Demîrêyan ve hatîye wergerandin. Çîrok behsa çend gundîyên kevîrbîr dike. Wisa ku çîrok li ser xortekî bi navê Sergîs tevdi gere û behsa serpêhatîyên wî dike.

Poêmek Biçûk: Çîrokeke menzum e, ji alîyê Hecîyê Cindî ve hatîye wergerandin. Nivîskar di çîrokê de behsa zarokatîya xwe dike. Herwisa behsa xerabîya kapitalîzmê jî di çîrokê de tîne zimên.

Xweyî û Xulam: Çîrok ji alîyê Casimê Celîl ji H. Tûmanyanyan hatîye wergerandin. Herwiha bi awayekî serbixwe jî ji bo zarokan hatîye weşandin. Çîrok behsa serpêhatîya du birayan dike.

2.4.3. Kitêba Zimanê Kurmancî (Bona Dersxana Duda, 1937)

Yek ji pirtûkên dibistanê *Kitêba Zimanê Kurmancî (Bona Dersxana Duda)* ye ku ji alîyê Hecîyê Cindî û Cerdoyê Gêncî ve hatîye amadekirin. Ev pirtûk ji bo zarokên pola duyem di sala 1937ê de hatîye amadekirin. Pirtûk ji alîyê Neşra Hikûmetê, li Rewanê çap dibe. Redaktorîya pirtûkê ji alîyê Casimê Celîl û Edoyê Cango tê kirin û Zeyneba Îbo jî rûpelsazîya pirtûkê dike.



2.4.3.1. Naveroka Pirtûkê

Ev pirtûka perwerdeyê ya ji bo pola duyem ji 99 rûpelan pêk tê. Dema em li naveroka pirtûkê dinêrin bi gelemperî çîrok, helbest û nivîsên nivîskarên bîyanî (Pûşkîn, Xanko Apêr, M. Şahnazaryan, H. Tûmanyanyan, H. Hayrapêtyan, Verîyaskaya, Roqosyan, Aqayan, Lûsabêr, S. Zoryan, A. Ūlyanova, Karmîr Arêv, G. Saryan û hwd.) ji alîyê Ceroyê Gêncî ve hatine wergerandin. Jê cuda em di nav metnan de navê Emînê Evdal û Casimê Celîl jî dibînin. Lê mirov dikare bibêje ku ev pirtûka dersê hema hema hemû ji nivîsên wergerandî û tîpguhastî pêk hatîye. Weke pirtûkên perwerdeyê yên din, ev pirtûk jî bi gelek metn û helbestên xwe ve pesnê sosyalîzmê, kolxozvanîyê û pergale dide û zarokên dibistanan teşwîqî hezkirina pergala Sovyêtê dike. Em dikarin naveroka pirtûkê wiha bisenifînin:

2.4.3.1.1. Metn

Ber bi Xebatê: Behsa zarokan dike ku ji pola yekem derbasî pola duyem dikin û şabûna wan tîne zimên.

Hewa Temîz: Di metnê de Sûtê bi kalikê xwe re derbarê giringîya hewayaya paqij diaxe.

Du Şagirt: Dîyaloga du şagirtan dike ku yek ji wan ji alîyê dersên xwe ve tiral e û yek ji wan zîrek e.

Kelbê Me: Ev metn ji alîyê Xanko Apêr ve hatîye nivîsîn û wergera metnê Cerdoyê Gêncê kirîye. Metn behsa kûçîkekê wêfadar dike.

Radîo Çi Got: Ev metn behsa giringîya radyoyê dike ku çawa agahîyên rast dide gel.

Di Tevyaada Hişyar: Ev metn piçûk behsa gotinên Stalîn dike û ji alîyê Cerdoyê Gêncê hatîye wergerandin.

Quling: Ev metn behsa qulingan, tevgerên wan ên girseyî û hatina payîzê dike.

Nobedar: Ev metn ji alîyê Cerdoyê Gêncê ve hatîye guhastin û behsa nobedarîya zarekî piçûk bi tevî kalikê wî dike.

Pembû: Ev metn behsa kesekî kolxozvan dike ku ev kes behsa zevîyên pembûyan dike û pê re ji pesnê pergala Sovyetê dide.

Xebata Giran: Ev metn behsa xebata di pergala kapîtalîst de dike û dide nîşan ka çawa xebatên wê pergalê giran in.

Welatekî Mezin Nava Dinê da Heye: Ev metn behsa mezinbûna welatê Sovyetê dike.

Tanîya Înqilabdar: Ev metn ji alîyê Verîyaskaya hatîye nivîsîn û Cerdoyê Gêncê wergera wê kirîye. Metn behsa keçekê dike ka çawa kaxizên herfan (ji bo şoreşê) di mala xwe de vedişêre û leşker wan kaxizan nabîne.

Nîşana Sîyanatîya Sor Standî: Ev metn ji alîyê Verîyaskaya hatîye nivîsîn û Cerdoyê Gêncê wergera wê kirîye. Metn behsa dayîkekê dike ka çawa di şer de gernasî kirîye û rozeta sor standîye.

Temo: Cerdoyê Gêncê ev nivîs nivîsiye û behsa xortekî bi navê Temo dike ku çawa xwedîye xwe pêş xistiye.

Min neheqî gura te nekir: Ev metn ji dîyaloga kur û bavekî pêk tê. Di metnê de ew peyama tê dayîn ku kolxozvanî bi bereket e lê mirov li pey şêx û pîran biçe bereket li zevîyan nakeve.

Hatina Zivistanê: Ev metn behsa hatina zivistanê û demsalan dike.

Zivistan: Ev metn behsa zivistanê û şert û mercên xwendekaran dike.

Bob: Ev metn behsa kûçikên perwerdekirî dike ku kûçikekî bi navê Bob zarekî ji êgir xilas dike.

Şev nav Mêşeda: Ev nivîs ji alîyê Sîmak hatîye nivîsîn. Nivîs ji bîranînekê pêk tê.

Gazîya Bayraqê: Tîpguhêzîya vê nivîsê ji alîyê Cerdoyê Gêncî ve hatîye kirin û di nivîsê de propagandaya alaya Sovyêtê tê kirin.

Têlêfon: Ev metn ji alîyê S. Zoryan hatîye nivîsîn û Cerdoyê Gêncî wergera metnê kirîye. Tê de lawîkek bi telefonê meta xwe re diaxive.

Bi Vladimir re tevayî Senatorîyayê: Karmir Arêv ev nivîs nivîsîye û Cerdoyê Gêncî wergera nivîsê kirîye. Nivîs behsa bîranîneke bi tevî Lênîn re dike.

Stalîn: Ev nivîs behsa jîyana Stalîn dike. Cerdoyê Gêncî tîpguhêzîya nivîsê kirîye.

Selam ji Fêrizara: Ev metn propagandaya Sovyêtê dike û pesnê serleşkerên Sovyêtê dide.

Elektrîk: Metn ji alîyê A. Nêvêrov hatîye nivîsîn û Cerdoyê Gêncî wergera metnê kirîye. Metn behsa hatina elektrîkê li gundê Sovyêtê dike.

Name Voroşîlovra: Ev helbest ji alîyê Kvîtko weke nameyekê hatîye nivîsîn û di helbestê de pesnê leşkerîyê tê dayîn.

Name neferê Sor Sivîkê Êso: Ev nivîs ji nameyekê pêk tê û xortekî bi navê Sivîk ji leşkerîyê ji bo dê û bavê xwe re nameyekê dinivîse.

Se Waxtê Şêr: Ev nivîs ji alîyê Cerdoyê Gêncî hatîye guhastin û nivîs behsa giliyên leşkerekî di derbarê şêr de dike.

Hukmê Tavê: Ev metn ji alîyê Aqayan hatîye nivîsîn û behsa xweşikîya tavê dike.

Niha Ezê Çawa bikim: Metn behsa xirabîya şêx û axayan dike.

Hişyarbûna Hebkokê: Metn ji alîyê Lûsabêr hatîye nivîsîn û ji alîyê Cerdoyê Gêncî hatîye wergerandin. Metn behsa şînbûna hebika genim dike.

8ê Martê: Ev metn ji alîyê L. Targyul hatîye nivîsîn û Cerdoyê Gêncî metn wergerandiye. Metn behsa roja 8ê adarê dike.

Rêwîti li Hewê: Metn behsa firîna li hewê û afirandina balefîran dike.

Pîonêrê Baş: Ev metn ji alîyê Sîmak ve hatîye nivîsîn û behsa divêtiya pîonêrtîyê dike.

Çandîna Biharê: Ev metn ji alîyê Cerdoyê Gêncî ve hatîye nivîsîn û behsa çandinê dike.

Rezê Micûrîn: Ev metn behsa zevî û rezên kesekî cotkar ê bi navê Micûrîn dike.

Kalkê Xuda: Ev nivîs ji alîyê Cerdoyê Gêncî hatîye nivîsîn û behsa kesekî bi navê Kalîkê Xudo dike ku çawa ew ji hikûmeta Sovyetê hez dike.

Duh û îro: Metn behsa berî hatina kolxozê û piştî hatina kolxozê dike û pesnê kolxozê dide.

Ew Bextewarin: Ev metn ji alîyê Şoloxov ve hatîye nivîsîn û behsa bextewariya zarokên kolxozê dike.

Edlê çawa Rojêd Xwe Havînê Derbazkir: Ev metn ji alîyê Cerdoyê Gêncî ve hatîye nivîsîn û metn behsa zarokeke bi navê Edlê û bîranînên wê yen havînê dike.

Şevê Dixebitin: Ev metn ji alîyê Şaek ve hatîye nivîsîn û metn behsa elektronstasî (cîhê elektrîkê belav dike), stansî (îstasyonên trêne), Koma Şewatvêsa (vekujer), Neşîrxane (weşanxane), telegramxane (cîhê telgrafê) û nanopêjxaneyê dike ku cîhên behs dike qet ranazên.

Ber bi Xebata Havînê: Metn behsa girtina dibistanan û xebata havînê dike.

2.4.3.1.2. Çîrok

Moz û Hirç: Ev çîrok ji alîyê M. Şahnazaryan ve hatîye nivîsîn û ji alîyê Cerdoyê Gêncî ve hatîye wergerandin. Çîrok behsa hirçekî dike ku çawa diçe hêlîna mozê hildiweşîne û hingivê mozê dixwe.

Se û Pişik: Ev çîrok bi awayekî menzûm ji alîyê H. Tûmanyar ve hatîye nivîsîn. Wergera çîrokê jî ji alîyê Casimê Celîl ve hatîye kirin. Çîrok behsa kûçik û pişikê dîke ku pişik di çîrokê de terzî ye û kûçik dixwaze ligel wî ji xwe re kûmîkekî bide dirûnê. Lê pişik kûçikî her tim dixapîne û şerê wan herduyan hê jî berdewam e.

Şêr û Rovî: Ev çîrok ji alîyê Aqyan hatîye nivîsîn û Cerdoyê Gêncî wergerandîye. Çîrok behsa pîrbûna şêr û diyaloga di navbera wî û rovî de dîke.

Êvar: Ev çîrok ji alîyê H. Tûmanyar ve hatîye nivîsîn. Çîrok behsa hatina êvarê dîke û roj, çivîk, kivîşk, nêçîrvan û heyv diaxivin.

Caxcax Padşa: Ev çîrok ji gotina kesekî bi navê Morof hatîye hildan û çîrok behsa aşvan, wezîr, rovî û paşayekî dîke.

2.4.3.1.3. Helbest

Xwendin: Di destpêka pirtûkê de ev helbest heye û behsa xweşîkbûna xwendinê û hînbûnê dîke.

Sibe: Ev helbest a A. Pûşkîn e û hatîye wergerandin. Lê kê wergerandîye nehatîye diyarkirin.

Traktor: Ev helbest ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye nivîsîn û behsa rakirina erdan a traktorê dîke.

Êvara Kolxozê: Ev helbest ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye nivîsîn û behsa xweşîkbûna êvara kolxozê dîke.

Traktor: Ev helbest a I. Mirakyan e û behs dîke ku traktor çawa li kolxozê dixebite.

Kolxoz: Ev helbest ji alîyê Basoyê Bekir ve hatîye nivîsîn û pesnê kolxozê dide û propagandaya wê dîke.

Payîz: Ev helbest a H. Hayrapêtyan e û behsa hatina payîzê dîke.

Dayîka Mine Firindeyî: Ev helbest ji alîyê Poqosyan hatîye nivîsîn û Cerdoyê Gêncî ew wergerandîye. Helbest behsa firindeyan dîke û wê dişibîne dayîkan.

Bona Kolxozê: Ev helbest ji alîyê H. Hayrapêtyan hatîye nivîsîn û Cerdoyê Gêncî ew wergerandîye. Helbest behsa kesekî bi navê Welî dîke ku çawa ji bo kolxozê fedakarî kirîye.

Tifal û Berf: Ev helbest ji alîyê G. Saryan ve hatîye nivîsîn û Cerdoyê Gêncî wergerandiye. Helbest li ser berfê û barîna wê hatîye nivîsîn.

Îternasyonal: Ev helbest propagandaya Sovyêtê dike û ji alîyê Emînê Evdal ve hatîye wergerandin.

Zavodêda: Helbest behsa xebatên Zavodê de dike.

Bihar: Ev nivîs ji alîyê H. Hayrapêtyan hatîye nivîsîn û ji alîyê Cerdoyê Gêncî ve hatîye wergerandin. Helbest behsa hatina biharê dike.

Keskesor: Xanko Apêr ev helbest nivîsîye û behsa keskesora piştî baranê dike.

Bayraqa Yekê Gulanê: Helbest behsa roja yekê gulanê dike û pesnê alaya yekê gulanê dide.

Zarêd Îspanîyê: Ev helbest ji alîyê Casimê Celîl hatîye nivîsîn û behsa zarên ku di şer de êtîm mane dike.

Birayêd Xwe Bîr Bîne: Ev Helbest ji alîyê A. Baytr hatîye nivîsîn û di helbestê de dayîkek ji kurê xwe re şîretan dike û lorîyan dibêje.

Rêya Hesin: I. Mirakyan ev helbest li ser trêne û rêya trêne nivîsîye.

2.4.4. Kitêba Zimanê Kurmancî (Bona Dersxana Şeşa, 1935)

Yek ji pirtûkên dibistanê *Kitêba Zimanê Kurmancî (Bona Dersxana Şeşa)* ye ku ji alîyê Hecîyê Cindî, Casimê Celîl û Cerdoyê Gêncî ve hatîye amadekirin. Ev pirtûk ji bo zarokên pola şeşem di sala 1935ê de hatîye amadekirin. Pirtûk ji alîyê Neşra Hikumetê, li Rewanê çap dibe. Redaktorîya pirtûkê ji alîyê Casimê Celîl, H. Mikbirtsyân û A. Movsesyan tê kirin.



2.4.4.1. Naveroka Pirtûkê

Pirtûka perwerdeyê ya ji bo pola şeşem ji 232 rûpelan pêk tê. Pirtûk ji aliyê naveroka xwe ve gelek dewlemendiyan di nava xwe de dihevine. Wisa ku di pirtûkê de gelek bîranîn, helbestên klasîk û modern, şano û metnên cudatir hene. Nivîsên gelek nivîskarên kurd ên wekî Hecîyê Cindî, Xelîlê Çaçan, Ahmedê Mirazî, Erebe Şemo, Casimê Celîl, Etarê Şero, Emînê Evdal hene û herwisa nivîsên nivîskarên bîyanî yên wekî V. Papazyan, R. Drambyan, Sîras, S. Zoryan, H. Tûmanyar û hwd. ji aliyê nivîskarên kurd ve hatine wergerandin û hatine weşandin. Weke pirtûkên perwerdehiyê yên din, ev pirtûk jî mijara pesindayîna sosyalîzmê di hundirê xwe de dihevine. Em dikarin metnên di nava pirtûkê de wiha bisenifînin:

2.4.4.1.1. Metn

Metnên ku ji bo xwendinê hatine nivîsîn zêdetir bi terza bîranînan hatine nivîsîn. Çîrokên di pirtûkê de ev in:

Kulfeta me. Zarotîya min (Erebê Şemo, behsa jîyana xwe dike), *Merkeba me. Rêncberîya nava melegana* (Erebê Şemo, bîranîn), *Guhdarîke, Kalê Dibêje, Baku* (V. Totovents, wer. H.Cindî), *Abdul* (D. Demrcyan), *Çem Bira Avê* (Z. Zoryan), *Nêçîra Hirçê, Siba Şewrê* (Arazî, werger), *Gundê Teze* (Cerdoyê Gêncî), *Kedxude* (X. Abovyan, wer. Cerdoyê Gêncî), *Xudoyê Rîspî* (P. Prosyar), *Ersawil, Zevî* (V. Papazyan), *Xebatçiyê Xwelîyê, Narê, Cizaretê Têlîyê* (Etarê Şero), *Çawa Ez Ketim Nav Kolxozê* (Etarê Şero).

2.4.4.1.2. Helbest

Di pirtûkê de nivîsên herî zêde helbest in. Hin helbest li dor pergala Sovyetê hatine nivîsîn lê hin helbest jî ji bo terza zarokan hatine nivîsîn. Helbestên di pirtûkê de ev in:

Moskova (H. Cindî), *Traktor* (N. Zaryan), *Lawikê Delal* (Emînê Evdal), *Rewan* (Casimê Celîl), *Kurê Min, Gulana Sor, Rojê Min, Xeniqok* (Pûşkîn, wer. Casimê Celîl), *Dekabristê Sirgûnkirira, Xatir Xastina Şivan* (F.Şîller, wer. Casimê Celîl), *Kilama Altkirinê* (G. Saryan, wer. Casimê Celîl), *Sînorxweykirî* (V. Norents), *Ballad Derheqa Dîkada* (S. Taronsî, wer. Casimê Celîl), *Şivan* (Ahmedê Mirazî), *Oktobir, Dîlber* (Ev helbesta Feqîyê Teyran ji aliyê Ahmedê Mirazî ve tê berhevkirin û nivîsîn), *Gzîya min* (X.Celal), *Dengbêjê Minra* (Nûrî), *Celal û Rewan*.

2.4.4.1.3. Çîrok

Çîrokên di pirtûkê de zêdetir çîrokên gelêrî ne û ji gel hatine berhevkirin. Çîrokên di pirtûkê de ev in:


Bêjingirê (H. Cindî, berhevkarî), *Leylê û Mecerûm* (çîroka gelêrî), *Heso û Binevş* (çîrokeke gelêrî), *Memê û Eyyê* (Ev çîrok jî ji cimeata kurmanca ji lîyê Sîras ve hatîye berhevkirin û nivîsîn. Ev çîrok piştî ji aliyê Hecîyê Cindî ve hatîye wergerandin û çapkirin. Em ê di beşa pirtûkên wergerandî de behsa vê çîrokê bikin.), *Maro* (H. Tûmanyar, çîrokeke helbestkî ye.), *Bûka Nîfir lê Kirî* (çîroka Pepû), *Merîyê bê Aqil, Sîabend û Xaçezêrê* (Ev çîroka gelêrî ji aliyê Casimê Celîl û R. Drambyan ve ji cimeata kurmanca hatîye berhevkirin û di forma klamî de hatîye dayîn).

2.4.4.1.4. Şano

Reva Jinê: Ev şano ji aliyê Wezîrê Nadir ve hatîye nivîsîn û di pirtûkê de hatîye dayîn. Herwiha ev şano di heman salê de wekî pirtûkê çap dibe.

2.4.5. Zimanê Dê, Kitêba Xwendinê (Bona Dersxana Sisya, 1955)

Di êwra Kafkasyayê de bi taybetî piştî salên 1930î bi polîtîkayên Stalîn xebatên kurdî tî xitimandin. Gelek rewşenbîrên kurd ji kar tî avêtin, tî girtin û nefîkirin. Erebe Şemo nefiyî Sîbîrê dîkin. Hecîyê Cindî, Cerdoyê Gêncî, Ahmedê Mirazî tî girtin, zêrandin (Boyîk, 2012: 15). Herwiha elîfbaya latînî tî qedexekirin û êdî pirtûkên latînî çap nabin. Ji ber vê yekê jî hewcedarîya çêkirina elîfbayeke bi tîpên kîrîlî tî dîtin û ev kar dikeve ser milê Hecîyê Cindî. Di sala 1946ê de elfabe tî çapkirin (Boyîk, 2012: 15). Herwiha ji bilî pirtûkên din êdî pirtûkên perwerdeyê jî bi tîpên kîrîlî tî weşandin û perwerdeya zarokan bi tîpên kîrîlî tî kirin. Yek ji pirtûkên kîrîlî yê perwerdeyê pirtûka *Zimanê Dê* ye ku di sala 1955ê de ji aliyê Hecîyê Cindî hatîye amadekirin û li Rewanê hatîye çapkirin.



2.4.5.1. Naveroka Pirtûkê

Dema em li naveroka pirtûkê dinihêrin, em li rastî çend serenavan tên û ji bo her serenavekî metnên têkildar hatine dayîn. Weke pirtûkên perwerdeyê yên din ev pirtûk jî bi nivîsên xwe gelek pesnê pergala Sovyetê, kolxazan û sosyalîzmê dide. Herwiha ji bo xwendin û fêmkirina zarokan di gelek cihan de terza “metn-pirs”ê hatîye bikaranîn. Em dikarin serenavan û nivîsên bin banê wan wiha bisenifînin:

Havîn: Di bin vê serenavê de 8 metn hene û zêdetir bi demsala havînê re têkildar in. Nivîsên tê de ev in: *Welatê me* (Metn), *Hîmna Ermenîstana Sovêtiyê Sosyalîstîyê Rêspûblîkê* (Helbest), *Havîn* (Helbest), *Zevîya Kolxozê* (Metn, N. Nêzlobîn), *Havîna Me* (Şikl), *Kurik û Çem* (Helbest), *Gundê Mera* (Helbest, Qaçaxê Mirad), *Sibe* (Helbest, Pûşkîn).

Bostan û Rez: Di bin vê serenavê de 13 nivîs hene. Ew jî bi gelemperî behsa cotkarî û xebatên li kolxozan dikin. Nivîsên tê de ev in: *Rêzê Miçûrîn* (Metn, bi guhastina Cerdoyê Gêncî), *Dara Sêva* (Metn, D. Tixomîrov), *Bostanî* (Helbest), *Hesenîkê Kolxoznîk* (Metn), *Hertişt Wextê Xweda Xweşe* (Metn), *Pismama Bostana* (Metn), *Pismamêd Zevya û Rêza* (Metn, Mayrênî Lezî), *Barêd Sovxozê* (Helbest), *Ciwan û Bostançî* (Çîrok), *Baxbançî û Kurêd Wî* (Mtn, Rodnaya Rêç), *Paîz Hat* (Helbest), *Pembû* (Metn), *Zevya Kolxozê* (Helbest), *Kombanî* (Metn), *Paîza Erêvanê* (Helbest, Mikaîlê Reşîd), *Hirç û Qîzik* (Çîrok, hikayetên cimaeta ûrisan), *Belgweşîn* (Helbest, H. Tûmanyar), *Elegez* (Helbest, E. Genco).

Şkol, Mal û Heval: Di bin vê serenavê de 15 nivîs hene. Mijarên nivîsan curbicur in. Nivîsên tê de ev in: *Dersxana me* (Metn), *Hînbîn* (Helbest, Seîdê Îbo), *Belgêd Şîn* (Metn, B. Osêva), *Lûrî-Lûrî* (Lorî), *Îsaf* (Metn, A. Xaydar), *Lênîn Şikolêda*

(Metn), *Lênîn* (Helbest, A. Çolo), *Stalîn Şkolêda* (Metn, Mayrênî Lezî), *Îlyanîngên* (Metn, A. Lyapîdêvskî), *Kalikê Xudo* (Metn, Cerdoyê Gênc), *Zarên Çîstanê Aza* (Metn, Î. Kojêdbû), *Kewê û Hebo* (Çîrok), *Bav û Kurêd wî* (Çîrok, Tolstoy), *Kolêktîv Çîye* (Metn, Rodnaya Rêç), *Pêşkêş Ordîya Sovêtêra* (Metn).

Rêvolyûkîya Oktîabrê Sosyâlîstîyê Mezin: Di vê sernavê de 19 nivîs hene. Mijarên nivîsan cûrbicûr in. Di çend cihan de jî piştî metnan tiştanok hatine pirsîn. Nivîsên di vê sernavê de ev in: *Oktyabr* (Helbest), *Pala Berî Hikumeta Sovêtîyê Çawa Derbaz Dikir* (Metn, Rodyana Rêç), *Gundîya Berî Hikumeta Sovêtîyê Çawa Derbaz Dikir* (Metn, Rodyana Rêç), *Tanya Révolyûsîonêr* (Metn, Vêrêyskaya), *Oktyabrikekîra* (Helbest, E. Çarênts), *Xebata Giran* (Metn, Mayrênî Lêzî), *Çapaêv* (Metn, Mayrênî Lêzî), *Qewmandin li ser Pirê* (Metn, Mayrênî Lêzî), *Î. V. Stalîn li Tsratîksînê* (Metn, Mayrênî Lêzî), *Kurêd Cimaetê Navdar* (Metn), *Andrîk* (Metn, V. Osêva), *Moskva* (Helbest), *Erêvan* (Metn, Mayrênî Lezî), *Hedad* (Helbest, Qaçaxê Mirad), *Bakû* (Helbest), *Xebatçîyê Şevê* (Metn), *Xebat* (Helbest), *Çi Zû Diçe* (Çîrok, Rodyana Rêç), *Çêkin* (Helbest).

2.4.6. Lîteratûra (Bona Dersxana 5-6, 1970)

Yek ji kedkarê perwerdeya zarokan Casimê Celîl e ku ji bilî nivîs û xebatên wî di sala 1970yî de ji bo pola 5 û 6em pirtûka edebîyatê ya bi navê *Lîteratûra* amade kirîye û ev pirtûk ji weşanxaneyê *Lûîsê* hatîye weşandin.



2.4.6.1. Naveroka Pirtûkê

Pirtûka *Lîteratûra* xwedî naverokeke dewlemend e ku di hundirê xwe de gelek curenivîsan dihewîne. Wisa ku di pirtûkê de gelek kilamên cimaetê, lorî, çîrokên

gelêrî, helbestên Feqîyê Teyran, çîrokên wergerandî, têderxistinok, meselok û metnên xwendinê hene. Ev pirtûka perwerdeyê jî wekî pirtûkên perwerdeyê yên din pesnê Sovyetê û pergala wê dide. Em dikarin metnên di pirtûkê de wiha kategorîze bikin:

2.4.6.1.1. Çîrok

Çivîk û Gundî (Hikyata cimaeta kurdan), *Hevt Kose* (Hikyata cimaeta kurdan), *Mer û Merî* (Hikyata cimaeta kurdan), *Xudanmal û Xulam* (H. Tûmanyar, wer. Q. Kurdo. Piştî ev pirtûk wekî pirtûkeke serbixwe hatîye çapkirin.), *Lûr de Lûr* (V. Papazyar), *Hirç û Mar* (A. Îsahakyan), *Xeberê Dayka Şîralî* (Casimê Celîl), *Hikyat Derheqa Mesîgir û Mesîyê Zêrîn* (Pûşkîn), *Ker û Kulikê Silêmin* (Cimaeta Kurda), *Anûş* (H. Tûmanyar).

2.4.6.1.2. Helbest

Lênînê Mezin, *Hey Can Weten* (A. Îsahakyan), *Elegezêra* (A. Îsahakyan), *Feqîyê Teyra Hevsêda* (Feqîyê Teyran), *Dilbera Feqî* (Feqîyê Teyran), *Feqîyê Teyra û Cînartî* (Feqîyê Teyran), *Guhêra Kolxozêda* (Emînê Evdal), *Oktîbrêra* (Emînê Evdal), *Halê Welat* (Osman Sebrî), *Klama Qîza Kurda* (Casimê Celîl), *Klama Edlayê* (Qaçaxê Mirad), *Dewra Kosmîkîyê* (Qaçaxê Mirad), *Sala Teze* (Ûsivê Beko), *Zevya Kolxoz Me* (Ûsivê Beko), *Weten* (Mikaîlê Reşîd), *Yekê Mehê* (Şikoyê Hesên), *Bahar* (Fêrikê Ûsiv), *Dewlemendî* (Fêrikê Ûsiv), *Bahar* (Mikaîlê Reşîd), *Kanya Gundê Me* (Simoyê Şemo), *Payîz* (Baxçoyê Îsko), *Rîya Gundê Me* (Ordîxanê Celîl), *Kulfetê Me*, *Zarotîya min* (Ereb Şamîlov), *Kurdistanîm Ka* (Cegerwîn), *Pembîwê Meyê lê Em Tazîne* (Cegerxwîn), *Klama Teyrê Firtonê* (M. Gorkî), *Lênîn û Elî* (E. Çarêns), *Hevalê Minî Lîpo* (E. Çarêns).

2.4.6.1.3. Meselok û Gotinok

Di pirtûkê de serenavekî bi navê *Derheqa Meselok û Gotinokan* heye ku serê pêşî behsa gotinên pêşîyan dike û pişt re jî 14 heb mînan dide.

2.4.6.1.4. Têderxistinok

Di pirtûkê de serenavekî bi navê *Derheqa Têderxistinoka* heye ku serê pêşî behsa têderxistinokan dike û pişt re jî 16 heb mînan dide.

2.4.6.1.5. Klam

Hoy Can, Klamê Cimaetê (lorîyek, du kilamên xebatê, kilameke xwezayê), *Klamê Mêrxasîyê* (bi mînaka Têlî Hemze), *Klama Kotanê*.

2.4.6.1.6. Metn

Ber bi Çîyayê Araratê (X. Abovyan), *H. Tûmanyanyan* (Bîyografî), *Efiranina bi Çap û Efrandina Vekirî*, *Ber bi Gundê Kolxozvanîyê* (Cerdoyê Gêncî), *Xebata Dewrêş* (Wezîrê Nadir), *Cab* (Hecîyê Cindî, beşek ji pirtûka Hewariyê), *Mizgînîya Xêrê* (Mîroyê Esed), *Blûrvan* (Sehîdê Îbo), *Xatê Xanim* (Elîyê Evdîrehman, novel), *Dûyê Ocaxê Temirî* (Hado Maxmûdov), *Em Çûne Aş* (Emerîkê Serdar, bîranîn), *Rojka Wê Bê* (Mîrz Îbrahîmov, terc. Qanatê Kurdo), *Hisret* (H. Koçar, terc. Emerîkê Serdar), *Komîtas* (Eskerê Boyîk), *Qisa Mûro* (Aksêl Bakûns, terc. Şikoyê Hesên), *Cegerxwîn* (Bîyografî), *Pola Çawa Qal Dibû* (H. Ostrovskî, terc. Emînê Evdal), *Lêvînsôn* (A. Fadêev, terc. Emînê Evdal), *Dilê Danko* (M. Gorkî), *Ber bi Welatê Êrîs* (Ehmedê Mirazî).

2.4.7. Elîfba (1974)

Pirtûkeke perwerdeyê ji pirtûka Hecîyê Cindî ya bi navê *Elîfba* ye ku di sala 1974ê de li weşanxaneyê *Lûîsê* hatîye çapkirin. Li gorî agahîyên pirtûka li ber dest ev pirtûk cara dehem e ku çap dibe. Dîroka çapa wê ya yekem nehatîye diyarkirin.



2.4.7.1. Naveroka Pirtûkê

Dema mirov li naveroka pirtûkê dinihêre, ji pirtûkên perwerdeyê yên din cudatir piraniya pirtûkê ji elîfbayê pêk tê û tîpên elîfbaya kîrîlî tê danasîn. Herwiha piştî ku tîpek tê dayîn nivîs an jî çarîneke piçûk jî ji bo xwendin û nivîsandina tîpê tê dayîn. Di nav van nivîsan de tiştanok, çîrokên kurt, lorî, helbest û çarîn hene. Herwiha piştî ku danasîna tîpan xilaz dibe ji bo xwendinê hin nivîs hatine dayîn ku nivîs ev in: *Elîfba* (Helbest), *Kalikê Lénîn* (Helbest), *Vladîmîr Îlyîç Lénîn* (Metn), *Klama Edlayê* (Sirûd), *Moskova* (Metn), *Êrêvan* (Metn), *Qeyk* (Helbest), *Ba* (Helbest), *Berfa Pêşîn* (Helbest), *Pirsa Çetin* (Metn), *Meselok* (4 heb), *Ezîzê Mekteban* (Metn), *Sala Teze* (Helbest), *Têderxistinok* (3 heb), *Fêrma Sovxozê* (Metn), *Heywanên Bîyanî û Heywanên kedîkirî* (Danasîna heywanan), *Civata Mişka* (Çîrok), *Bahar* (Helbest), *Wê Razîbin* (Çîrok), *Mîçûrîn* (Metn), *Eyda Me* (Metn), *Çi Zore* (Çîrok), *Mûr-Mûrî* (Çîrokeke menzûm), *Nama Zerê* (Name).

Di nava van heft heb kitêbên dersê yên bidestxistî de rengvedana edebîyatê berbiçav e. Wisa ku edebîyat wekî amûreke giring bi armanca hînkirina ziman, fikr û ramanên civakê hatiye bikaranîn. Metn, çîrok û helbestên di pirtûkên dersan de hatine nivîsandin bi gelemperî li ser fikra Leninîzmê hatine dayîn. Tevî wan, di pirtûkên dersan de berhemên wergerandî jî pir zêde ne ku gelek jî wan berhemên wergerandî berhemên klasîk ên cîhanî ne. Herwiha di nava van pirtûkên dersê de gelek berhemên zargotina kurdî jî tên dîtin.

2.5. Rola Radyoya Rewanê di Edebîyata Zarokên Sovyetê de

Kurdên Sovyetê bi saya gihîştina kadroyên pêşîn û perwerdehiyê, çepera xebatên çandî û hunerî firehtir kirin û him bi rojnamegerîyê û him jî bi saya radyofonîkê dengê xwe zêdetir gîhandin cîhanê. Bi taybetî berîya mirina Stalîn xebatên çandî û hunerî hatibûn sekinandin û hin rewşenbîrên kurdan hatibûn sirgûnkirin. Lê piştî mirina Stalîn xebatên çandî û hunerî dîsa geş bûn. Dema Stalîn bi tevî polîtîkayên xwe di sala 1953yê de mir hin civîn li Sovyetê pêk hatin, wekî şaşîyên Stalîn kirine li ber çavan raxin û ji ber vê yekê jî gavên nû biavêjin (Kaya, 2022: 46). Di nav van gavan de avakirina weşanên Radyoya Rewanê û berdewamkirina rojnameya Rêya Teze hebû ku Radyoya Rewanê “sala 1955an meha çile da bi resmî dest bi weşana xwe kirîye” (Boyik, 2012: 73). Herçiqas esasa polîtîkaya Radyoya Rewanê “meremê axaftinan dijî împêralîzmê piropaganda sosiyalîzmê” (Boyik, 2012: 74) bûbe jî ji hêla çand û hunera

kurdan de gelek xebat kirine. Wisa ku Radyoya Rewanê di weşanên xwe de “bernameyên nûçeyan, bernameyên propagandayê, bernameyên jîyana gundîtîyê, bernameyên edebî, bernameyên klaman û bernameyên radyoşanoyan” (Kaya, 2022: 54-58) pêşkêş kirine û dengê xwe gîhandine gelek kurdan. Bi taybetî di weşanên xwe yên radyoşanoyan de gelek destanên kurdî ên wekî *Sîyabend û Xecê*, *Kerr û Kulîk*, *Zembilfroş*, *Leyl û Mecerûm*, *Dimdim*, *Mem û Zîn*, *Heso û Zelxe* û hwd. di formata radyoşanoyan de hatine amadekirin û pêşkêşkirin. Jê cuda gelek çîrokên klasîk û gelek çîrokên ku ji aliyê nivîskarên bîyanî hatine nivîsandin jî di formata radyoşanoyan de hatine pêşkêşkirin (Kaya, 2022: 59-62). Radyoya Rewanê di nav weşanên xwe yên radyoşanoyan de ji bo zarokan jî weşan amade kirine û pêşkêşî guhdarvanan kirine. Heya niha li gorî çavkanîyên li ber dest du radyoşano bi taybetî ji bo zarokan hatîye pêşkêşkirin ku ew *Şengilo*, *Mengilo*, *Xalîçengilo* û *Kumsor* e.

2.5.1. Şengilo, Mengilo, Xalîçengilo

Ev çîrok di nav çîrokên kurdî yên gelêrî de cih digire û di nav gel de bi gelek formên cuda tê vegotin. Helbestvanê kurd ê Sovyetê Şikoyê Hesen ev çîroka gelêrî ji nû ve çekirîye. Piştî veçekirina Şikoyê Hesen jî ev çîrok pêşkêşî guhdarên Radyoya Rewanê bûye (Kaya, 2022: 63). Çîrok bi taybetî ji bo zarokan hatîye amadekirin û dikeve bin banê cureya fablê. Di çîrokê de karakterên sereke bizin, gur û bi navê Şengilo, Mengilo, Xalîçengilo sê karik in. Di vê radyoşanoyê de karakterên teyr, legleg, gakovî, hirç û rovî jî hene ku ew jî wekî karakterên alîkar dikarin werin hesibandin. Çîrok behsa sê karikên bizinekê dike ku bizin dema ji mal derdikeve gur tê wan hersê karikan dixwe. Piştî bizin tê, karikên xwe nabîne û li pey şopa karikên xwe dikeve. Di dawîyê de pê dihesa ku gurî karikên wê xwarîye. Di dawîya çîrokê de bizin zikê gurî diqelişîne û karikên xwe xilaz dike.

Di radyoşanoyên Radyoya Rewanê de gelek nivîskar û xebatkarên radyoyê di dilqê karakterên çîrokan de listine û ew karakter bi deng kirine. Di vê listikê da heşt dengên cuda hene. Her karakterek xwedî dengê ye. Vebêjerê listikê Keremê Seyad e. Wezîrê Eşo di vê listikê de di dilqê gur de ye. Di listikê de mêran dilqê gur, teyr, gakovî û hirçê, jinan dilqên bizin, rovî û leglegê û zarokan jî dilqên Şengilo, Mengilo û Xalîçengilo bi deng kirine (Kaya, 2022: 64). Ev radyoşano bi tevî hevdu nîv seatê dikişîne.

2.5.2. Kumsor

Çîrokeke din a li gorî radyoyê hatîye amadekirin çîroka bi navê *Kumsor* e ku ev çîrok di nav çîrokên gelêrî yên cîhanî de cih digire. Ev radyoşano di kîjan salê de û ji aliyê kê ve hatîye amadekirin nehatîye dîyarkirin. Ev çîrok jî bi forma xwe ya fablî bi gelek dengên cuda ve hatîye pêşkêşkirin. Di çîrokê de karaktera sereke Keça Kumsor e. Ji bilî wê, dîya Keça Kumsor, Gur, Pîrka Kumsor, Minminîk, Teyrede, Gul û Beybûn û darbîr karakterên alîkar in. Di çîrokê de keçek heye ku dîya wê hin xwarin dide wê û wê dişîne cem pîrika wê ya nexweş. Keçik di rê de bi gelek ajal û nebatan re diaxive. Di dawîyê de dikeve rêyeke şaş û rastî gur tê. Gur Keça Kumsor dixapîne û berîya wê xwe digihîne mala pîrika wê û pîrika Keça Kumsor dixwe. Dema keçik xwe digihîne mala pîrika xwe gur dikeve dilqê pîrikê û keçikê jî dixwe. Teyredeyên ku şahidê vê bûyerê dibin diçin gazî darbîran dikin û darbîr tîz zikê gur diqelişînin û Kumsor bi tevî pîrika wê xilaz dikin.

Di vê radyoşanoyê de gelek dengên cuda hene ku ketine dilqê karakteran. Wezîrê Eşo di vê radyoşanoyê de di dilqê gur de leyîstîye. Her wiha Aslîka Qadir jî di dilqê Keça Kumsorê de leyîstîye. Dengên cuda yên wekî dayîka Keça Kumsorê, minminîk, teyrede û darbîran nehatine tespîtîkirin. Lê li gorî dîyalogên di navbera Keça Kumsor, ajal û nebatan de tê fêmkirin ku gelek zarokan bi hevdu re ew ajal û nebat bi deng kirine.

2.6. Rola Rêya Teze di Edebîyata Zarokên Sovyetê de

Kadroyên pêşîn ên kurdên Kafkasayê piştî ku perwerdeyên xwe dibînin û dest bi nivîsandina pirtûkên perwerdeyê dikin rojnameya Rêya Teze jî diafirînin û zêdetir xwe digihînin gelê xwe. Di sala 1930î de rojnameya Rêya Teze dest bi weşana xwe dike (Can, 2013: 50). Ev rojname jî zêdetir ji bo gel ji nûçeyan agahdar bibe û li dijî emperyalîzmê propagandaya sosyalîzmê bike derketîye holê. Rojnameya Rêya Teze jî weke xebatên kurdî yên din para xwe ji polîtîkayên Stalîn hildide û heya salên 1950yî tê rawestandî. Lê piştî mirina Stalîn careke din dest bi weşanên xwe dike. Ji ber ku rojnameya Rêya Teze zêdetir li gorî bûyerên cîhanê û ji bo propagandayê dihate bikaranîn beşên wê yên derbarê çand û edebîyatê kêmane. Lê dîsa jî gelek helbest û çîrokên cuda tê de hatine danasîn û nivîsîn. Ji hêla edebîyata zarokan de jî li gorî hejmarên wê yên li ber destê me (48 hejmar) gelek kêman tişt hatine kirin. Weke ku me tesbît kirine hin xebatên derbarê zarokan de wiha di rojnameyê de hatine dayîn:

Di hejmara 21ê Îlona sala 1966ê de bi sernavê *Para Lîteratûrayê* beşek ji bo helbestan hatîye veqetandin û di nav helbestan de helbesteke Eskerê Boyîk a bi navê *Zar û Bihar* hatîye weşandin.

Di hejmara 14ê Mijdara sala 1979ê de Nûra Cewarî kilameke zarokan bi tevî notayên wê nivîsiye. Navê klamê jî *Hoy Nar* e.

[illegible]

2.7. Berhemên Zargotinê û Edebîyata Zarokên Kafkasyayê

Berhemên zargotinê yên wekî çîrok, çîrçîrok, metelok û hwd. nîş bi nîş bi rêya vegotinê tên heta roja me û ji aliyê nivîskaran ve derbasî nivîsê dibin. Bi vî awayî di

nava edebîyatê de nîşaneyê dewlemendîya çanda civakê çêdikin. Di her civakekê de berhemên folklorîk tînin ku edebîyata kurdî ya gelerî, di vî warî de edebîyateke dewlemend e. Herwiha ev berhemên folklorîk ji bo zarokan jî di warê hînbûna zimanê dayîkê de roleke mezin dilîzin. Wisa ku nasîna zarokan a digel edebîyatê cara pêşî bi van berhemên çêdibe. Bi rêya van berhemên zarok, cara pêşî civak û çanda xwe jî nas dikin. Nahrîn li ser vê yekê fikrên xwe wiha tîne ziman:

Zarok bi saya folklorê hînî dewlemendî, rengîn û kûrbûna ziman dibin. Ji wan cûreyan çîrok di hûndirê xwe de hemû dewlemendîya ziman dihevine. Zarok her tim jî dê û bavê xwe heman çîrokê cardin dixwazin û di dubarekirina çîrokê de zarok demek şûnde dibin pisporê çîrokê. Dema dê û bavê wan şaşîyek kirin zarok wan hişyar dikin û wan rast dikin. Bi vî awayî ziman li ser hiş, dil, mejî û zimanê zarokan jî xwe re hêlîneke delal çêdike (2023: 8).

Di edebîyata zarokan de bi rêya berhemên folklorîk gêşadenek pêk tê. Wisa ku çîrokên ji nû ve bi taybetî ji bo zarokan tînin nivîsandin jî hîmê xwe ji wan berhemên folklorîk distînin. Herwisa li gorî Celîlê Celîl ji ber ku edebîyata nû koka xwe ji edebîyata klasîk bîrîbû, edebîyata nû qinyata xwe ji hin çavkanîyan digirt. Yêk ji wan zargotina kurdan bû ku bi dewlemendîya ziman, hûner û bûyerên epîk û lirîk di nava kurdan de, ji zarokan destpêkirî heta kalên navsere, gelekî zengîn mabû. (2010: 12). Kurdên Kafkasê ev dewlemendî bi kar anîn û li ser vê fikrê di edebîyata kurdî ya Sovyetê de gelek berhemên folklorîk ji alîyê gelek nivîskaran ve ji nû ve derbasî nivîsê bûn. Wisa ku kesên wekî Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl berhevok çêkirin û weşandin. Di wan berhevokan de gelek berhemên folklorîk ji bo zarokan hatine amadekirin.

Lê mixabin ev berhevok belawela ne û di gelek berhevokan de dîyardeya wê tiştê nîne ku ew berhemên taybetî ji bo zarokan hatine nivîsandin. Lê li gorî taybetmendîya edebîyata zarokan em dê tesbîta wan berhemên bikin. Pîvana me dê bi gelemperî zelalbûn û herikbarbûna şêwaz û zimanê berhemên be. Herwisa em dê bala xwe bidin asta têgihiştin û guncavbûna mijarên berhemên.

2.7.1. Folklorê Kurmanca

Hecîyê Cindî ku wekî bavê folklorê kurdî tê zanîn gelekî zêde berhevkarî kirîyê ku wî ev berhevokirinên xwe derbasî nivîsê kirîye û bi vî awayî dewlemendîya zargotina kurdî anîye ber çavan. Hecîyê Cindî digel Emînê Evdal berhevokeke bi navê *Folklorê*

Kurmanca di sala 1936ê de li bajarê Yêrêvanê weşandîye. Berhevok 650 rûpel e. Di Berhevokê de 30 şaxên destana *Kerr û Kulikê*, 37 şaxên destanên *Mem û Zîn*, *Sîyabend û Xecê*, *Memê û Eyşe*, *Zembilfiroş*, *Leyla û Mecnûn*, *Dewrêşê Evdî*, *Dimdim û yên mayîn*, 172 klamên bengîtîyê, 66 afirandinên gelêrî ji bo zarokan, 41 kilamên govendê, 25 hikayetên cimeatê, kilamên Evdalê Zeynikê, afirandinên Feqîyê Teyran ku bi zarkî li nav gel dihatin gotin hatine berhevkirin û weşandin (Cindî û Evdal, 2008).

Di pêşgotina berhevokê de tê daxuyandin ku 66 afirandinên ji bo zarokan hatine berhevkirin. Ji wan 66 afirandinan 45 stranên zarokan in û bi awayekî eşkere di serecama pirtûkê de hatine dayîn. Lê 21 afirandinên din ên ji bo zarokan hatine nivîsandin nehatine dîyarkirin. Helbet dema mirov li ser taybetmendîyên berhemên zarokan hûr dibe dikare pê derxe ka kîjan ji bo zarokan hatine nivîsandin. Wê demê em dikarin wiha tespîta wan berheman bikin:

Em dikarin navên 45 stranên zarokan ên ku di pirtûkê de ne wiha rêz bikin:

Lûrî-Lûrî, Kuro, Kuro-Kuro, Çêlek, Hûrik-Hûrik, Hêklo-Mêklo, Lê Lê, Singê Zer, Kuro Serê min Qurba Bibe, Gevez, Gevez, Çemê Qeymez, Dengê Te, Destmala Te, Ez Gul im, Hat Kavranê Titûnê, Hesênê Pîrê, Wey Wey, Çemo, Keçik, Lûrî, Lûrî, Pîvongê, Kêlendî, Yah Bizinê, Goz Bêrîng, Jêl Da, Ho Dawo, Zengil, Keçikê Hol bi Hol, Bijo- Bijo, Kincê Kevin bû, Yê wê da Tê, Heko, Dûmiqesk, Berxno, Lê Lê, Silêmanê Du Nukul, Keçik, Hîz, Werne Jejîyê, Ha Meşkê, Cafere, Lo Lo Kuro, Klama Gerdana Ûsiv, Tencolî (Cindî û Evdal, 2008).

Ziman û şêweya wan kilaman zela, sivik û herikbar in. Bi gelemperî ji çar risteyan û ji çarînekê pêk tên û bi awayekî ritmîk hatine hazîrkirin. Di hin kilaman de navê nivîskarên dîyar in. Di gelek ji wan kilaman de şexs ajal in. Herwiha dîyar e ku gelek ji wan kilaman ji alîyê dê û bavan ve ji bo ku zarok têkevin xewê hatine gotin. Herwiha em dikarin bibêjin ku çîrokên di nav pirtûkê de yên zêdetir xîtabî zarokan dikin ev in.

Di berhevokê de çîrokeke bi navê *Legleg* tê dîtin û xwedîyê çîrokê Ûsivê Hesên e. Şexsên çîrokê ajal in. Ji ber vê jî morov dikare bibeje çîrok bi terza fablê hatîye nivîsandin. Herwisa dema em li şêwe û zimanê çîrokê hûr dibin em dibînin ku zimanekî sade û uslûbeke herikbar hatîye bikaranîn û ji alîyê têgihiştina çîrokê ve ji

bo zarokan guncav e. Di çîrokê de legleg, rovî û qijîkek diaxivin û mijar fêhlên rovîyekî ye.

Çîrokeke din bi navê *Rovî û Şêr* di berhevokê de tê dîtin. Çîrok dîsa bi terza fablê hatîye nivîsandin û ji alîyê ziman, şêwe û asta têgihiştina xwe ve ji bo zarokan guncav e. Xwedîyê çîrokê dîsa Ûsivê Hesên e. Di çîrokê de rovî pêşî ligel şêr dibe heval. Piştî rovî dixwaze şêr bixapîne û şêr bimire. Bi awayekî rovî, şêrî dixapîne û şêr xwe ji latekê diavêje û dimire, rovî şêrî dixwe û çîrok diqede.

Rovî û Gur çîrokeke din a di berhevokê de ye, ji alîyê Ûsivê Hesên ve ji bo zarokan hatîye wergirtin. Çîrok ji alîyê asta têgihiştina zarokan ve guncav e. Di çîrokê de gelek caran em rastî dîyalogên rovî û gur tên. Rovî şexsekî tirsonek û fêlbaz e.

Di berhevokê de çîrokeke din ji Qadîrê Semend hatîye wergirtin ku Qadîrê Semend şagirtê Têxnîkûma Pedegojîyê ya Bajarê Yerîvanê ye. Çîrok bi navê *Gur, Deve û Rovî* ye ku temama wê bi dîyaloga gur, deve û rovî pêk tê. Çîrok bi awayekî ritmîk diherike û goftigo di navbera wan de derbas dibin.

Di berdwama berhevokê de em rastî çîrokeke din tên ku xwedîyê çîrokê Besoyê Bekîr e. Navê çîrokê *Elîyê Torçî* ye. Di çîrokê de şexs him ajal him jî mirov in û di çîrokê de dîyaloga di navbera mirov û ajalan de derbas dibe. Çîrok behsa masîyekê dike ku ew masî dibe mirov û alîkarîya kesekê dike.

Di nava berhevokê de çîrokeke din a bi navê *Kizirkanûn* tê dîtin ku xwedanê çîrokê Ûsivê Hesên e. Çîrok ji bo têgihiştina zarokan guncav e. Dî çîrokê de şexsê sereke Kizirkanûn e ku ji rovî ditirse lê dikare digel dêwa têbikoşe û wan bixapîne. Di çîrokê de em rastî dîyalogên dêw, rovî û Kizirkanûnî tên.

Çîrokeke din a bi navê *Şa Nezer* ji Hesênê Erebb hatîye wergirtin. Çîrok wekî varyanteke din a çîroka Kizirkanûn e. Çîrok xwîneran dibe cihaneke xeyalî û ji bo zarokan çîrokeke maqûl e. Dî çîrokê de Şa Nezer şexsekî tirsonek e ku dêw jî ji wî ditirsîn. Çîrok bi xapandina dêwan xilas dibe.

Di berdwama berhevokê de gelek çîrok hene ku ji Ûsivê Hesên hatine wergirtin. Ûsivê Hesên di berhevokê de wekî çîrokzanayekî navdar tê nîşandan ku çîrokên wî hemû jî li gorî asta têgihiştina zarokan e. Çîrokeke din a ji wî hatîye wergirtin *Mervê Aqmaq* e. Çîrok behsa kesekê dike ku diçe li Xwedê digere da ku gilî û gazinên xwe jê re bêje.

Çîrokeke din a Ûsivê Hesên *Balûl û Xelîfe* ye. Çîrok behsa serpêhatîyên Balûl dike ku Xelîfeyekî zûlmkar ji alîyê Balûl û pişîka wî ve tê xapandin (Cindî û Evdal, 2008).

Di berhevokê de çîrokên *Axa Mezer, Elenewêrek, Çîvo, Gereke Tîşteke Bizanbî, Balûlî Zana, Koroxolî, Qiratû Torat, Polî Beg, Xewna Qazî, Keçelok, Hîkayeta Bizinê, Ez Ez im- Ez Ne Ez im, Kurê Soro, Qesebê Comerî û Padîşa* hatin xwendin û vekolandin. Li gorî taybetmendîyên berhemên zarokan li ser van çîrokan guman peyda dibe. Ji ber vê yekê em nikarin bêjin ev çîrok teqez ji bo zarokan in.

2.7.2. Folklorî Kurmancîyê

Hecîyê Cindî di sala 1957ê de berhemêke din dîsa wekî berhevok bi navê *Folklorî Kurmancîyê* çap dike. Di berhevokê de behsa zarokan û berhemên ji bo zarokan hatine berhevkirin nehatîye kirin. Lê çîrok, metelok û zûgotinok û têderxistonok ji bo têgihiştina zarokan guncav in. Ji ber vê jî ew berhemên gelêrî dikarin bibin malên edebîyata zarokan jî. Li ser vê darazê di hûrbûn û velêkolîna vê berhemê de tesbîten wiha derketin:

Di berhevokê de 12 çîrok tên dîtin, ji wan 12 çîrokan 8 çîrok meseleyên kûr ên jîyana mirovan in. Herçiqasî bi zîmanekî herikbar û zelal hatibin vegotin û nivîsandin jî ji îzafiyeta zarokan dûr in. Lê 3 çîrok aîdî dinyaya zarokan in û şexsên wan çîrokan ajal in ku di wan çîrokan de di navbera ajalan de diyalog hene. Herwisa li gorî asta têgihiştina zarokan guncav in (Cindî, 2008)

Ji wan çîrokan çîrokeke bi navê *Gur, Rovî û Hirç* tê dîtin ku di çîrokê de Gur Rovî û Hirç di navbera xwe de li ser parvekirina laşê heywanekî diaxivin.

Di berhevokê de çîroka din çîroka *Mer û Rovî* ye. Di çîrokê de Mar û Rovî destbîrakên hev in. Lê ji hev jî aciz in. Di dawîya çîrokê de Rovî Marî dixwe.

Çîrokeke din a bi navê *Xezal* di berhevokê de tê dîtin. Çîrok çîrokeke gelekî kurt e ku ji diyalogê Kûsîyekî û Xezalêkê pêk tê. (Cindî, 2008)

Di berhevokê de gelekî zêde metelok, têderxistanok û zûgotinok tên dîtin. Gelek ji wan ji bo têgihiştin û vegotina zarokan guncav in. Lê ji ber ku wekî serenav nehatîye amadekirin mînakdayîna wan zehmet e. Lê helbet mirov dikare gelek ji wan metelok, zûgotinok û têderxistanokan wekî malê edebîyata zarokan jî bihesibîne.

2.7.3. Hikayetêd Cimeata Kurda

Tevî van xebatan, Hecîye Cindî xebateke din a bi navê *Hikayetêd Cimeata Kurda* li edebîyata kurdî zêde dike. Xebat ji çîrokên gelêrî pêk tê. Hecîyê Cindî ev çîrokên gelêrî bi hûbra xwe neqşandîye. Ev xebat ji sala 1961ê heta 1990î perdeyey li dû hev wekî şeş bergan bi tîpên kîrîlî li Êrîwanê hatine çapkirin. Mîdîya Têmûr û Dîdara Têmûr ew berhevok di weşanên Rûpelê de ji kîrîlî veguhestin ser tîpên latînî. Di şeş bergan de nêzî 240 çîrok û serpêhatî hene. Ji nava her şeş bergan me çîrok ji hev veçirandin û çîrokên ku wekî malên edebîyata zarokan werin hesibandin hatin tesbîtkirin û tesnîfkirin. Li gorî her şeş bergan tesbîtên wiha derketin:

Di sala 1961ê de li Êrîwanê berga yekem tê weşandin. Di berga yêkem de 13 çîrokên dirêj ên civakî tên dîtin. Lê ev çîrok nikarin bibin malên edebîyata zarokan. Lewre di çîrokan de mijar mijarên rojane yên civaka kurdan in. Mijar ji îzafiyeta zarokan dûr in (Cindî, 2014).

Berga duyem di sala 1962yê de li Êrîwanê tê weşandin. Wisa ku di berga duyem de 34 çîrok tên dîtin. Di pêşgotina berhevokê de tê dîyarkirin ku digel hikayetan di berhevokê de qise, mesele û mijûlî jî hene. Piranîya mijarên çîrokan nikare bala zarokan bikişîne û ne maqûl e ku mirov wan çîrokan wekî malên edebîyata zarokan bihesibîne. Lê di berhevokê de hin çîrok dikarin ji alîyê zarokan ve werin xwendin û fêmkirin. Bo nimûne:

Gavan di berhevokê de çîrokeke efsûnî ye. Çîrok behsa keça gavanekî dike ku keça wî ji alîyê guran ve hatîye dizîn. *Benda Aqila* çîrokeke din e ku di berhevokê de ji bo têgihiştina zarokan guncav e. Çîrok behsa xewna heft kesan dike û di nava çîrokê de gotinên rîtmîk tên dîtin. Di berdewama berhevokê de em rastî çîrokeke din tên. Navê çîrokê *Kurî Padşê û Rovî* ye. Di çîrokê de rovî sexsek e û xeber dide. Herwisa çîrok behsa serpêhatîyên rovî û kurê padişahî dike. Dîsa di berhevokê de çîrokeke bi navê *Qisa Xotekî û Rovîkî* tê dîtin ku çîrok bi nêçîrvanîya xortekî dest pê dike. Di çîrokê de rovî, hirç û qijîkek xeber didin. Di çîrokê de dîyalogên xort û wan ajalan tên dîtin ku mijar serpêhatîya wan in (Cindî, 2014).

Berga sêyem di sala 1969ê de li Rewanê tê weşandin. Di berhevokê de 20 çîrokên dirêj tên dîtin ku piranîya wan li ser meseleyên civakî ne. Ji ber ku çîrokên gelêrî ne, ziman û şêweya çîrokan sade û zelal in. Herwiha çîrok herçiqas devokî bin

jî ji bo têgihiştina zarokan guncav in. Lê divê bê daxuyandin ku ew her 20 çîrok jî ji aliyê mijarên xwe ve ji bo zarokan neguncav in (Cindî, 2014).

Berga çarem li Rewanê di sala 1980yê de tê weşandin. Di berhevokê de 46 çîrok tên dîtin. Çîrok meseleyên civakî û çandî ne. Bi gelemperî mijar behsa dewrên berê dikin û di piraniya çîrokan de şexs; padîşah, wezîr, pîrek, kalek an jî çend kesên zane ne. Mijar taybetî ji bo zarokatîya ewilîn neguncav in. Di berhevokê de tenê çîrokeke bi navê *Mer* heye ku di çîrokê de mar xeber dide. Wisa ku mar şexsê sereke yê çîrokê ye û mijara çîrokê serpêhatîyên wî marî ye (Cindî, 2014).

Berga pêncem dîsa di sala 1980yê de li Rewanê hatiye weşandin ku di berga pêncem de 48 çîrok tên dîtin. Di pêşgotina berhevokê de derbarê wan çîrokan de gotinên wiha tên dîtin: “Hikayet gelek kêrhatî ne, ewana bona zargotinana, miletzana, zimanzana, usa jî bona nivîskara û lîteratûrzana, xwendevana gelekî lazim in” (Cindî, 2015). Herçiqasî ji bo zarokatîya ewilîn, ji aliyê mijaran ve neguncav bin jî çîrok li gorî asta têgihiştina zarokan in. Lê ji çend alîyan ve em nikaran wan çîrokan bikin malên edebîyata zarokan. Dîsa jî di vê bergê de çend çîrok hene ku zarok dikarin fêhm bikin û jê tahlîl û bîstînin. Weke mînak, *Fêhlên Rovî*; ev çîrok behsa xapandina dîk, qijik û keweke dike ku di navbera wan de diyalog hene. Çîrokeke din bi navê *Çîroka keçel* behsa serpêhatîya xortekî dike ku çîrok ji bo asta têgihiştina zarokan guncav e. Herwisa çîrokeke bi navê *Xuşkek û Heft Bira* dîsa di berhevokê de tê dîtin ku çîrok çîrokeke efsûnî ye (Cindî, 2015).

Berga şeşem di sala 2005ê de li Rewanê hatiye weşandin. Di vê bergê de jî 80 çîrokan gelêrî hatine komkirin û nivîsandin. Di van her şeş bergan de tiştê balkêş ev e ku gelek çîrok berdewama çîroka din e. Di pêşgotina berga pêncem de tê diyarkirin ku; hinek ji wan çîrokan bi hev re girêdayî ne, yêk a dinê temam dike, dikevine nava cêrga hikayeta ereban a “Hezar û Yek Şev”ê û ya farisan a “Tûtî-namê”yê. Di vê bergê de nêzî 9 çîrok ji bo asta têgihiştina zarokan guncav in û mijar ji bo zarokan balkêş in. Ji ber vê yekê em dikarin wan çîrokan, wekî malên edebîyata zarokan bihesibînin.

Di vê bergê de çîrokeke bi navê *Çîroka Heqo, Neheqo* tê dîtin ku çîrok behsa du rêhevalan dike. Di çîrokê de gur û rovî du kesayet in û diyalogên wan di çîrokê de xwe nîşan didin. Di berdewama berhevokê de çîrokeke bi navê *Bilbil* tê dîtin ku bilbil ji aliyê teyr û mirîşkê ve tê gilîkirin ku ew bilbil dangan derdixe. Di çîrokê de şexs ajal in û gotin û bêjeyên rîtmîk tên dîtin. *Çîroka Masî* çîrokeke din e di vê berhevokê de tê

dîtin. Ev çîrok varyanteke din a çîroka Elîyê Torçî ye ku di berhevoka *Folklara Kurmanca* de jî cih digre. Çîrok behsa xortekî dike ku wî masî ji mirinê filitandîye. Paşê masî bi sûretê mirovan dikeve nava jîyana wî xortî û qencîyê li wî xortî dike. Dîsa di berhevokê de çîrokeke bi navê *Mûrî û Mixmixk* tê dîtin ku şexsên çîrokê mûrî û mixmixk e. Çîrok çîrokeke kurt e û tenê ji diyalogê mûrî û mixmixkê pêk tê. Di berdewama berhevokê de çîrokeke kurt bi navê *Gur û Bizin* tê dîtin. Şexsên çîrokê gur, bizin, rovî û kûçik e û çîrok ji diyalogên wan pêk tê. Di çîrokê de gur û rovî dixwazin bizinê bixwin. Bi alîkarîya kûçikekî bizin ji kuştina gur û rovî difitile û çîrok diqede. *Hirç û Meriv* çîrokeke din a berhevokê ye ku di çîrokê de hirç û mirov wekî hevalên hev tînin teswîrkirin. Di dawîya çîrokê de ji ber hin tevgerên xerab ên mirovan hevaltîya hirç û mirovan xerab dibe û çîrok diqede. Tevî van, di berhevokê de çîrokeke bi navê *Ker û Gur* tê dîtin ku çîrok bi awayekî ritmîk tê xwendin. Şexsên çîrokê ker, gur, mî, dîk û kêwrîşk e. Çîrok behsa îxaneta gur dike ku di dawîya çîrokê de ker, mî, dîk û kewrîşk alîkarî didin hev û gur jî ji wan redive. Çîrokeke din a bi navê *Çivîkê* di berhevokê de tê dîtin ku di çîrokê de şexs çivîkek û pîrek e. Çîrok bi awayekî ritmîk behsa serpehatîya çivîkekê dike. Dîsa di berhevokê de çîrokek tê dîtin ku şexs dîsa ji ajalan û ji diyalogên wan pêk tînin. Navê çîrokê *Hirç, Gur û Rûvî* ye. Çîrok behsa gengeşîya di navbera gur, rovî û hirçê de dike ku di parvekirina laşekî heywanekî de li hev nakin (Cindî, 2015).

2.7.4. Zargotina Kurdî

Xebatên edebîyatnûsên kurd ên Kafkasê di ware berhevkarîyê de berbiçav in. Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl xebateke bi navê *Zargotina Kurdî* li van xebatan zêde kirine. Berga duyem a *Zargotina Kurdî* (bergên din nehat peyda kirin), di sala 1978ê li Moskovê tê weşandin. Di berhevokê de tevî çîrok, metelok û meseleyan 2288 berhevkarî tînin dîtin. Wisa ku di berhevokê de hin çîrok û metelok tînin dîtin ku dikarin bibin malên edebîyata zarokan jî. Ew çîrok bi gelemperî çîrokên fabl in, ji bo asta têgihiştina zarokan guncav in û eger zarok bixwînin dê bikarin tahiye jê bistînin.

Nêrî û Rêwî çîrokeke kurt e ku tenê ji diyalogê pêk tê. Diyalog di navbera rêwî û nêrîyekî de derbas dibe. Di berhevokê de çîrokeke din bi navê *Rovî û Nêçîrvan* tê dîtin û dîsa çîrokeke kurt e û ji diyaloga rovî û nêçîrvanekî pêk tê. Di berdewama berhevokê de çîrokeke bi navê *Destebiratîya Rûvî û Aşvan* tê dîtin. Di çîrokê de ji bilî rovî û aşvan teyrek û gurek jî şexsên çîrokê ne. Di çîrokê de rovî, gur û teyr keça sultanekî ji bo

aşvan direvînin. Çîrok bi îxaneta aşvan diqede. *Axa û Berxik* çîrokeke kurt e ku di berhevokê de tê dîtin. Di çîrokê de axa û berxik li ser serjêkirin û sernejêkirina berxikê diaxivin. Di berhevokê de çîrokeke bi navê *Zirînîya Kerê* heye ku ker û deve di navbera xwe de diaxivin. Di çîrokê de deve û ker naxwazin mirov wan bibin, lê ker dizire, bi zirîna kerê deve û ker tên dîtin. *Biratîya Gur û Rovî* jî di berhevokê de tê dîtin ku temamê çîrokê ji diyalogên gur û rovî pêk tê. Di çîrokê de rovî û gur planekê dikin ku hespekî bikûjin û bixwin. Di dawîya çîrokê de rovî û gur nagihîjin armanca xwe. Di berdewama berhevokê de çîrokeke bi navê *Dîk, Kêrûse, Werdek û Rûvî* tê dîtin. Di çîrokê de dîk, kêrûse û werdek wekî hevalên hev tên teswîrkirin. Ev hersê heval bi fehlên rovî, rastî rovî tên. Di dawîyê de rovî, dîk û werdekê dixwe lê kêrûse xwe diparêze û direve. Tevî van çîrokan, di berhevokê de çîrokeke bi navê *Hevaltîya Şêr û Rûvî* tê dîtin. Di çîrokê de şêr ji alîyê rovî ve tê xapandin û tê girtin. Di dawîyê de ji alîyê mişkekî ve tê rizgarkirin. Bi vê yekê şêr gelek berxwe dikeve û çîrok diqede (Celîl û Celîl, 1978).

2.8. Çîrokên Taybetî ji bo Zarokan Hatine Nivîsandin

2.8.1. Şêrê Çavqul



Pirtûkeke çîrokan e û ji 22 çîrokan pêk tê. Temamê çîrokan bi tîpên kîrîlî hatine nivîsandin û weşandin. Herwisa pirtûk di sala 1972yê de li Yêrîvanê tê çapkirin. Pirtûk ji alîyê Hamoyê Rizgo ve ji bo zarokan hatîye berhevkirin û hazirkirin. Di berhevokê de berhemên wekî *Ger û Ga, Padşa û Gundî* hene, ku herdu jî di nava çîrokên kurdî yê gelêrî de cih digirin. Herwiha çîrokên menzûm ên pirtûkê di nava xwe de hêmanên bingehîn ên têkoşîna sosyalîzmê jî dihevin (Erdman, 2017: 6-8). Dema em li naveroka pirtûkê dinêrin em van çîrokan dibînin:

Padşa û Gundî: Çîrok behsa paşa, kalekî û dara kaloyî dike wekî bi saya darê du caran paşa zêr dide kaloyî.

Gundîyê Aqilbend: Çîrok behsa paşa û gundîyekî feqîr dike. Di çîrokê de wezîr dibêje baran nabare lê gundî dibêje yê bibare. Di dawîyê de gotina gundî derdikeve û baran dibare.

Fêlbazîya Pêçermûkê: Çîrok behsa şerê teyrede û terewîlan dike. Terewîl serê pêşî bi hêztir in û pêçermûk bi fêlbazî piştî wan dîkin. Lê dema teyrede di şer de bi ser dikevin pêçermûk xwe vedişêrin şikeftan û heta niha jî şikeftan de dijîn.

Ker û Ga: Çîrok behsa gurekî dike ku dixwaze ker û gayî bixapîne. Ga naxape lê ker bi gurî dixape û pê re diçe û nema tê.

Parevekirin: Çîrok behsa şêr, gur û rovîyekî dike ku ew hersê ajal di nava hevdu de nêçîrê parve dîkin. Şêr gur dike lê rovî bi fêlbazîyekê xwe nade kuştin.

Dewletî û kesîv: Çîrok behsa kesekî feqîr dike ku dixwaze dora mala xwe çeperê çêbike lê gelekî diweste. Ew mirovê feqîr serê kesekî dixapîne û bi wî çeper dide kolandin.

Mişkê Kêfçî: Çîrok behsa mişkekî dike ku çawa genimê embarê de didize û di dawîyê de tê kuştin.

Şert: Çîrok behsa pêşbirkeke di navbera legleg û teyrê de dike.

Kêvrîşkê Tirsonêk: Çîrok behsa tirsonektîya kêvroşkan û pezan dike.

Nan û Zêr: Çîrok behsa kesekî feqîr û xewna wî dike.

Şêrê Çevqul: Çîrok behsa şêrekî çavbirçî dike ku hertim çavê wî li nêçîrên mezin in lê çavbirçîtîya wî di dawîyê de dibe sedema mirina wî.

Padşê Xewarok: Çîrok behsa kesekî dike ku gayê wî tê dizin. Ew kes diçe cem paşa lê paşa çareyekê nabîne.

Elîxan: Çîrok behsa zarokê bi navê Elîxan dike ku çawa ji pîrika xwe şekir dixwaze.

Dilê Fen: Çîrok behsa dizekî dike ku çawa xwe xilaz dike.

Laqirdîya Gur: Çîrok behsa kerekî, gur û pilingekî dike.

Caba Gundî: Çîrok behsa kesekî feqîr û kesekî dewlemend dike ku çawa ew kesê feqîr heqê xwe ji kesê dewlemend distîne.

Pêşekê Pişikê: Çîrok behsa rovî û pişikê dike ku çawa pişik ji nêçîrvan xilaz dibe lê rovî tê girtin.

Qencîya Mişk: Çîrok behsa şêr û mişkekê dike ku çawa mişk hesinê di stûyê şêr de dibire û wî xilaz dike.

Fîl û Meymûn: Çîrok behsa fîl û meymûnekî dike ku çawa bi hevdu re bihêztir dibin.

Meymûna Fêlbaz: Çîrok behsa meymûneke fêlbaz dike ku çawa şêr dixapîne (Rizgo, 1972).



2.8.2. Gezgezîk

Ev pirtûka ku ji bo zarokan hatîye amadekirin di sala 1963yan de ji aliyê Şerefî Eşîr ve hatîye nivîsîn. Pirtûk ji weşanxaneyê Haypolîgrafhratê derçûye û tevî hevdu 36 rûpel e. Di pirtûkê de 8 metn hene. Pirtûk bi tîpên kîrîlî û bi zimanê kurmancî hatîye nivîsîn. Herwiha hemû nivîsên di pirtûkê de bi terza menzûm hatine nivîsîn û di pêşgotina pirtûkê de jî wisa tê behskirin ku ev yekem pirtûka Şerefî Eşîr ya bi terza menzûmê ye.

Herwiha Erdman derbarê vê antolojîyê de wiha dibêje: Heywanên kesayetekîrî ên li ser bergê, derbarê alegorîya helbest û çîrokên antolojîyê de fikrekê dide me. Em dibînin ku meymûnek û hirçek gurekî dikişînin -ew gur, dê di sala 1969ê de bi saya rêzafilma *Nu Pogodîyê* ji aliyê zarokên Sovyetê ve wekî xapînok û nepenî were naskirin-. Gezgezîk, di nava xwe de çîrokên menzûm ên hêsan û zelal dihevwîne ku ew çîrokên menzûm hevnasîna wezn û qafîyeyê di gel zarokan çêdike. Herwiha ev çîrokên menzûm ferhenga zimanê dayîkê ya zarokên kurd berfireh dike û îdeolojîyeke dewletparêz hînî zarokan dikan (Erdman, 2017: 6-8). Em dikarin metnên pirtûkê wiha rêz bikin:

Rûvî: Ev çîrok çîroka pirtûkê ya herî dirêj e. Di çîrokê de rûvîkî fêlbaz û diz heye. Berî pêşî ev rûvî hertim dikeve kozên gundîyan û zadên wan dixwe. Lê di dawîyê de gundî rûvî digirin û ji lêdanê bêzar dikin. Rûvî vê carê jî diçe serê gurekî dixapîne û xwe wekî nivîskarekî mezin di nav hemû heywanan de dide nasîn. Lê di dawîyê de hemû heywan ji fêlên rûvî û gurê ku alîkarî daye rûvî dihisin. Hemû heywan kom dibin rûvî û gur ceza dikin û biryarê didin ku di nava hemû heywanan de kesekî cahil nemîne û hemû jî bixwînin û bizanibin. Çîrok bi terza fêblê hatîye nivîsîn û diyalogên di nava heywanan de gelek in.

Balad Derheqa wê Yekêda Çawa Krîtîk Pixkire Şaîrê Diz: Ev çîrok behsa kesekî bi navê Krîtîk dike ku ev kes şaîrekî diz dikute. Piştî kurapên şaîr tî jî bo lêdana Krîtîk lê Krîtîk wan jî dikute.

Zewaca Sinco: Ev çîrok (weke ku hatîye dîyarkirin) beşek ji poyêmekê ye û behsa zewaca kesekî bi navê Sinco dike.

Heft Reng: Ev metna lîrîk behsa kesên bêkesayet dike ku çawa dilnepak in.

Mervê Zane: Ev metna lîrîk behsa mirovên xwe zane dihesibîbin dike û tevgerên wan dişayesîne.

***** :** Ev çîrok behsa bilbîlekî dike ku çawa pesnê xwe dide û jinek jî bi pê re dikeve nîqaşê. Sernavê vê metnê tune ye.

Merivê Çevqul: Ev metna lîrîk behsa mirovên çavbirçî dike û tevgerên wan dişayesîne.

Xewna Findî: Çîrok behsa kesekî bi navê Findî û behsa şexsekî dike. Çîrok wê peyamê dide ku şêx her tiştî jî bo xwe dixwazin û tiştên jî bo berjewendîya wan nebe nakin.

2.9. Berhemên Edebîyata Zarokan ên Hatine Wergerandin

Edebîyatnûsên kurd ên Kafkasyayê ji bo zarokan gelek berhem wergerandine kurdî. Wisa ku li gorî Celîlê Celîl, çavkanîyeke din a edebîyata nû destanên edebîyatên gelên cînaran e. Bi taybetî yên rûs û ermenîyan. Herwiha Celîlê Celîl dibêje: “Wergerên ji berhemên klasîk ên dinya naskirî, yên rûsan û ermanîyan, edebîyata kurdî gihandin meşa gelên Sovyetê û di demeke kin de cihê xwe ya hêja di nav cergê wan de girt” (2010: 12). Bi vî awayî gelek ji wan berhemên klasîk ên cîhanê, ji bo zarokan jî hatine wergerandin û weşandin.

Li Sovyetê geşedana edebîyata kurdî ya zarokan di warê wergerê de, ne bi tesadûfî bi hişmendîyeke berbiçav çêbûye. Lewre weşangerîya Sovyetê giringîyeke mezin dida edebîyata zarokan. Pirtûkên ji bo zarokan bi hemû zimanan bi nîgar û tertîba taybet çap dibûn. Bi vê armancê ku wê ji zarokan re bibûna pirtûkên hezkirî û nehatana jibîrkin. Çapemenîya Ermenîstanê ku hêj berî çêbûna Sovyetê xwedîyê tradîsyoneke xurt bû, li ser vî karî jî bi çelengî pirtûkên pir hêja ji edebîyata gelên temamîya dinyayê werdigerandin ser zimanê ermenî û çap dikirin. Meşa wan a çeleng, bandora xwe li ser pirtûkên kurdî de jî hişt. Pirtûkên zarokan di vê pêvajoyê de li ser baldarîya rewşenbîran bû (Celîl, 2010: 12).

Casimê Celîl di vî warî de kesekî taybet û giring e. Wergerên wî yên ji bo zarokan hatine weşandin gelek zêde ne. Hecîyê Cindî, Emînê Evdal û Cerdoyê Genco jî ji wan nivîskaran in ku ji ermenkî û rûsî gelek çîrok û fêbl ji bo zarokan wergerandine kurdî. Di pirtûkên perwerdeyan de bi gelemperî ev werger hatine bikaranîn. Herwiha mimkin e ku ew wergerên hatine kirin ji bo pirtûkên perwerdeyê jî hatibin kirin. Lê dema em li pirtûkxaneyê Casimê Celîl dinêrin em dibînin ku gelek ji wan wergeran bi

awayekî serbixwe wekî pirtûkekê jî hatine weşandin. Celîlê Celîl jî di gotara xwe ya bi navê *Beşek ji Dîroka Weşengerîya Kurdên Kafkasyayê* de diyardeya wan çîrokên wergerê yên serbixwe dike.

Casimê Celîl bi piranî ji ermenkî bo kurdî ji bo zarokan werger kirîye. Herwiha gelek wergerên Casimê Celîl, ji pirtûkên edebîyatnûsê ermenî yê zarokan Hovhannes Tûmanyân in. Herwiha gelek ji wan ji bo zarokên temenê wan di navbera 7 û 11ê de ne. Ew çîrok dikarin wiha werin rêz kirin:

H.Tûmanyân: *Se û Pişik*, 1935.

H.Tûmanyân: *Kalkê Gabo Çewa Kurmê Hevîrmîş Xweyî Dike*, 1935

H.Tûmanyân: *Xweyî û Xulam*, 1936.

H.Tûmanyân: *Axirya Nes*, 1937.


H.Tûmanyân: *Nezerê Mêrxas*, 1937.

Xinko Aper: *Tramve li Rewanê*, 1936.

Xinko Apêr: *Mişka pişikêra Çawa Şer Kirin*, 1937.

H. Hayrapêtyan: *Teyr û Tû*, 1936.

Arkayîd Haydar: *Hîkayet Derheqa Surra Seferîyê* (Derheqa zar-zarokê û derheqa xebera wî qewînde), 1934 (Celîl, 2010: 13).




2.9.1. Se û Pişik

Casimê Celîl ji H. Tûmanyân cara pêşî di sala 1935ê de li Êrîvanê çap dike. Herwiha Emînê Evdal di kitêba xwe ya dersê de cih daye vê çîrokê. Paşê di sala 2012ê de ji aliyê Enstîtûtya Kurdzanîyê – Wien ve ji nû ve tê weşandin. Çîrok ji aliyê bikaranîna wêneyan ve gelekî dewlemend e û çîrokeke kurt e. Herwiha çîrok behsa bûyerekê dike ku di navbera se û pişikê de derbas dibe. Di çîrokê de pişik terzî ye û ji bo ku pişik ji bo se kumekî bidirû se diçe nik pişikê, ji ber ku pişik kumê wî dereng didirû se û pişik pev diçin û çîrok diqede (Celîl, 2012c).

2.9.2. Kalkê Gabo Çewa Kurmê Hevîrmîş Xweyî Dike

Wergera vê çîrokê nehat peydakirin. Lê tê zanîn ku cara pêşî di sala 1935ê de li Êrîvanê tê weşandin. Ji alîyê Casimê Celîl ve ji H. Tûmanyar hatîye wergerandin.



2.9.3. Xweyî û Xulam

Wergera din a Casimê Celîl, bi navê *Xweyî û Xulam* e ku Emînê Evdal redaktorîya çîrokê dike. Çîrok dîsa ji H. Tûmanyar hatîye wergerandin. Emînê Evdal di kitêba xwe ya dersê de cih daye vê çîrokê. Herwiha çîrok cara pêşî di sala 1936ê de li Yêrîvanê tê weşandin. Paşê di sala 2012ê de ji alîyê Enstîtûtya Kurdzanîyê – Wien ve ji nû ve tê weşandin.

Çîrok behsa serpêhatîyên du birayên feqîr dike. Pêşî birayê mezin, paşê birayê biçûk diçin nik kesekî dewletî xulamtiyê dikin. Xweyî bi fêhlan birayê mezin dixapîne û wî bêperetî dide xebatê. Lê dema birayê biçûk diçe nik xweyî dibe xulam, vê carê xweyî tê xapandin û çîrok diqede (Celîl, 2012e).

2.9.4. Axirya Nes

Axirya Nas çîrokeke din a wergera Casimê Celîl e ku ji H. Tûmanyar wergerandiye. Casimê Celîl cara pêşî di sala 1937ê de li Rewanê çîrok weşandiye. Çîrok paşê di sala 2012ê de ji alîyê Enstîtûtya Kurdzanîyê – Wien ve ji nû ve tê weşandin.

Çîrok ji alîyê bikaranîna wêneyan ve dewlemend e û çîrok bi awayekî rîtmîk tê xwendin. Mijara çîrokê fêhlên rovî ne. Rovî dixwaze çûka kîkû bixapîne û çivîkên wê bixwe. Bi hişyarkirina qijîkekê çûka kîkû êdî dikare xwe ji rovî biparêze. Rovî ji ber tevgerên qijîkê, dixwaze qijîkê bixwe. Lê qijîk, rovî dixapîne û bi alîkarîya kûçîkekî rovî dikuje. Bi vî awayî çîrok diqede (Celîl, 2012a).



2.9.5. Nezerê Mêrxas

Wergera Casimê Celîl a bi navê *Nezerê Mêrxas* dîsa ji H. Tûmanyar hatîye wergerandin. Di pirtûkxanaye Casimê Celîl de ev çîrok nehat peydakirin. Wergera li ber destê me ji pirtûkxaneya Temûrê Xelîl


Mûradov hat peydakirin. Di çîrokê de gelek wêne hatine bikaranîn. Di çîrokê de tîpên latînî û kîrîlî tevlihev in û bi wî awayî hatîye weşandin. Wergera çîrokê cara pêşî li Rewanê di sala 1937ê de hatîye weşandin. Paşê weşanên *Evrensel Çocuk Kitaplığı* wê ji nû ve diweşîne.

Çîrok behsa serpêhatîya kesekî dike ku navê wî Nezer e. Di çîrokê de Nezer kesekî pir tirsonek û bêaqil tê teswîrkirin. Şevê jina wî derî lê digire û li wî derve dihêlê. Serê sibê hin moz li ser pozê wî kom dibin. Nezer di carekê de gelek mozan dike û li ser vê yekê xwe gelekî bitaqet dibîne. Nezer diçe nik keşîşê gund û vê meselê dibêje, keşîş wekî henekê xwe pê bike, li ser kaxezekê hin tiştên derewîn ên derbara mêrxasîya Nezer de dinivîse, dide destê wî û wî dixapîne, dişîne gundên din. Bi tesadûfî Nezer pir bi nav û deng dibe. Rastî gundî, dêw û pilingekî tê û nav û dengê wî her bilindir dibe. Bi vî awayî çîrok diqede (Celîl, 1937).

2.9.6. Tramve li Rewanê

Çîrok ji alîyê kesekî ermenî yê bi navê Xinko Aper ve hatîye nivîsandin. Ji alîyê Casimê Celîl ve ji bo zarokên kurdan hatîye wergerandin. Çîrok cara pêşî li Rewanê di sala 1936ê de hatîye çapkirin. Dema Celîl behsa vê berhemê dike dibêje:


Li rewanê di sala 1936an rêya Tramvayê hat çêkirin. Tramvay bûyereke mezin bû di nava jîyana Ermenîstanê de. Wê heremên bajêr bi hev re girê dida, bi carekê ve 50-70 mirov lê siwar dibûn û bi rê diketin. Wê demê mecalên gerê ji bo xelkê bajêr bi transportê tune bû (Celîl, 2010: 13).



2.9.7. Mişka Pişikêra Çawa Şer Kirin

Çîrokeke din a ji alîyê Xinko Aper ve hatîye nivîsandin *Mişka Pişikêra Çawa Şer Kirin* e. Çîrok ji alîyê Casimê Celîl ve tê wergerandin. Herwiha çîrok cara pêşî di sala 1935an de li Rewanê, paşê di sala 2012an de ji alîyê Enstîtûya Kurdzanîyê -Wien ve tê weşandin. Çîrok bi vê gotinê dest pê dike: *Bona nevîyêd mine bişik.*

Çîrok ji alîyê wêneyan ve pir dewlemend e. Di her rûpelekê de wêneyekî rengîn û balkêş tê dîtin. Dî çîrokê de gelek caran mişk kilaman dibêjin. Çîrok bi awayekî rîtmîk tê xwandin. Di çîrokê de mijar şerê pişikê û mişkan e (Celîl, 2012b).



2.9.8. Teyr û Tû

Teyr û Tû çîrokek eremenî ye ku ji alîyê nivîskarek bi navê H. Tayrapêtyan ve hatîye nivîsandin. Casimê Celîl çîrokê werdigerîne kurmancî. Çîrok cara pêşî di sala 1936an de li Rewanê tê weşandin. Paşê di sala 2012an de ji alîyê Enstîtûya Kurdzanîyê -Wien ve tê weşandin.

Çîrok ji alîyê bikaranîna wêneyan ve pir dewlemend e. Herwisa bi zimanekî helbestkî û bi awayekî rîtmîk tê xwendin. Di çîrokê de teyr û çivîk teswîra hev dikin. Di navbera wan de guftigoyek heye (Celîl, 2012d).

Tevî van wergêran kesên wekî Emînê Evdal, Hecîyê Cindî û Cerdoyê Genco jî ji edebîyata dinyayê ji bo zarokên kurd ên temenê wan di navbera 11 û 15ê de pirtûk wergerandine û weşandine. Em dikarin wan jî bi vî awayî rêz bikin;

H. Tûmanyen: Gîkor (1932), bi wergera Emînê Evdal û Hecîyê Cindî.

Berhevkirina Kilama (1936), bi wergera Casimê Celîl.


A. S. Pûşkîn: Masigîr û Masîyê Zêrîn (1937), bi wergera Casimê Celîl.

L. N. Tolstoy: Şirovekirin Derheqa Heywana de. Bona Zara (1935), bi wergera R. Drambyan.

L. N. Tolstoy: Plenê Kavkasê, (1937), bi wergera Miradê Qeçax.

Danyêl Dêfo: Robînzon Krûzo (1936), bi wergera Cerdoyê Genco. (Celîl, 2010: 13).

Sîras: Memê û Eyşê.



2.9.9. Gîkor

Ev çîrok ji alîyê H. Tûmanyen ve hatîye nivîsandin. Çîrok ji alîyê Emînê Evdal û Hecîyê Cindî ve hatîye wergerandin û ji alîyê Casimê Celîl ve hatîye redaktekirin. Çîrok cara pêşî di sala 1932an de li Rewanê tê weşandin. Piştê di sala 2012ê de ji alîyê Enstîtûya

Kurdzanîyê – Wien ve ji nû ve tê weşandin.


Çîrok behsa serpêhatîyên xortekî bi navê *Gîkor* dike. *Gîkor* bi malbata xwe ve li gundekî dijîn û rewşa wan a aborî pir xerab e. Bavê *Gîkor*, ji bo ku *Gîkor* jîyanekê baş bijî û ji xwe re karekî bike bi darê zorê dibe bajêr. *Gîkor* li ber destê malbatekê xulamîyê dike. Lê xanima malê, naxwaze *Gîkor* nik wan bijî û li ser *Gîkor* zordariyê dike. Ji ber vê rewşa xerab, *Gîkor* gelek xerîbîya gund û malbata xwe dike. Ji ber xerîbîya gund û malbata xwe *Gîkor*, nexweş dikeve. Di dawîya çîrokê de bavê *Gîkor* tê, *Gîkor* vedigerîne gund û çîrok diqede.

Di pêşgotina çîroka *Gîkor* de sedema wergerandinê wiha tê diyar kirin:

Gîkor wî çaxî hatye nivîsarê çîçaq Zakavkazêda kapitalîzm diha gumreh dibû, pêra ji gund wêran dibûn. Xebatçîyê gunda û zarê mîna *Gîkor* dihêtin bajarê boy xebatê, boy paletîyê. Xwelî dest gundîyê xebatçîda tunebû, xwelî jî destê wana distendin. Tûmanyên "*Gîkor*" hema ji wê dewrane jî nivîsiye. Nivîsiye derheqê wê zelûliyêda yak wî çaxî bûye û zarongê nola *Gîkor* mezîn bûne. Lema ji me layiq dit, wekî eva kitêba zû bê neşîrîkirinê, bikeve destê zarê kurmancê xebatçîyê Zakavkazê di hêna berêda (Celîl, 2012).

2.9.10. Berhevkirina Kilama

Berhem nehat peydakirin ji ber vê jî mixabin derbarê vê berhemê de agahî nayên dayîn. Tenê tê zanîn ku ji aliyê Casimê Celîl ve hatîyê wergerandin û cara pêşî di sala 1936an de li Rewanê hatîye weşandin.



2.9.11. Masîgir û Masîyê Zêrîn

Çîrok cara pêşî di sala 1937an de li Rewanê tê weşandin. Çîrok ji aliyê Casimê Celîl ve ji rûsî tê wergerandin bo kurdî û ji aliyê Emînê Evdal ve tê redaktekirin. Paşê, di sala 2012an de ji aliyê Enstîtûtya Kurdzanîyê – Wien ve ji nû ve tê weşandin.

Çîrok wekî çîrokeke klasîk a cîhanî tê hesibandin ku bi forma helbestkî ji aliyê Pûşkîn ve hatîye nivîsandin. Casimê Celîl jî ev çîrok bi awayekî helbestkî wergerandiye. Çîrok behsa serpêhatîyên masîgirekî kal dike. Masîgir gel jina xwe ya pîr di xaniyekî kevin de dijîn. Masîgir rojekê masîyeke zer digire û dibîhîse ku masî xeber dide. Li ser daxwaza masîyê masîgir, masîyê berdide û masî azad dibe. Ji ber ku masîgir ew masî azad berda, masî dibêje masîgir heger daxwazên te hebin ez dê pêk

bînim. Lê masîgir qet tişteki naxwaze û yekser diçe mala xwe. Masîgir ji jina xwe re behsa masîya zêrîn dike û li ser vê yekê jina wî masîgirî gelek hêrs dibe û daxwaza gelek tiştan dike ku masîya zêrîn wan pêk bîne. Jina pîr gelek caran masîgir dişîne nik masîya zêrîn da ku daxwazên wê pêk bîne. Daxwazên jina pîr hemû pêk tên. Lê jina pîr li ser hemû daxwazan re dixwaze ku ew masîya zêrîn bibe xulama wê. Lê ev daxwaza pêk nayê û bi vê daxwazê jina pîr, hemû daxwazên masîya zer pêk anîne winda dibin û çîrok diqede (Celîl, 2012f).

2.9.12. Şirovekirin Derheqa Heywana de (Bona Zara)



Wergera li ber destê me ji pirtûkxaneya Têmûrê Xelîl Mûradov hatîyê peydakirin. Di çîrokê de tîpên latînî û kîrîlî tevlihev in û bi wî awayî hatîye weşandin. Çîrok cara pêşî di sala 1935an de li Rewanê tê çapkirin. Çîrok ji alîyê R. Drambyan ve hatîyê wergerandin.

Rubên Drambyan kesekî ermenî ye lê gelek wergerên ermenî ji bo kurdî kirîye. Dema Celîlê Celîl behsa wî dike dibêje: “merivekî kedkar û helal bû ji bo pêşdebirina çand û edebîyata Kurdî” (Celîl, 2010: 13). Çîrok ji alîyê Casimê Celîl ve hatîye redaktekirin.

Em di çîrokê de rastî bîranînên kesekî tên ku bi gelemperî di wan bîranînan de kûçikek heye. Navê wî kûçîkî Balkû ye. Piraniya pirtûkê serpêhatî û bîranînên Balkû û xudanê wî ne. Pirtûk ji 19 çîrokan pêk tê. Di her çîrokekê de serenavekî cuda tê dîtin. Her yek ji meseleyeke cuda pêk tê. Herçiqas mesele derbarê Balkû û xudanê wî de bin jî, her yek wekî çîrokeke cuda jî dikare bê hesibandin. Çîrokên di pirtûkê de tên dîtin ev in: *Balkû*, *Balkû û Beraz*, *Fasyana*, *Miltan û Bakû*, *Kusî*, *Balkû û Gur*, *Pîyatîgorskîyêda Çi Qewimî Serên Balkû*, *Axirya Balkû û Milton*, *Kewrîşka Gewr*, *Kewrîşk*, *Kûçkê Usa ku Zara ji Şewatê Aza Dikin*, *Çêjikê Bêşîkê*, *Teyra Sîmir*, *Çivîk û Dûmeqesk*, *Şêr û Kûçîk*, *Şêr Cewrikê Xwe Çawa Hîn Dikin*, *Semesî*, *Banzdan*, *Nêçîra Hirçê* (Drumbyan, 1935).

2.9.13. Plenê Kavkasê

Plenê Kavkasê ji alîyê Tolstoy ve hatîyê nivîsandin û ji alîyê Miradê Qeçav ve ji bo zarokên kurdan hatîye wergerandin. Lê mixabin berhem nehat peydakirin, ji ber

vê jî derbarê vê berhemê de agahî nikare were dayîn. Tenê tê zanîn cara pêşî di sala 1937an de li Rewanê hatîyê çap kirin.



2.9.14. Robînzon Krûzo

Berhema Danyêl Defo ya bi navê *Robînzon Krûzo* ji aliyê Cerdoyê Gêncî ve hatîyê wergerandin. Herwiha berhem bi redaktorîya Casimê Celîl ve di sala 1936an de li Yêrîvanê tê çapkirin. Paşê di sala 2012an de ji aliyê Enstîtûtya Kurdzanîyê – Wien ve ji nû ve tê weşandin.

Çîrok behsa serpêhatîyê xortekî bi navê Robînzon dike. Robînzon birayê biçûk ê du birayan e. Dixwaze terkiserî dinyayê bibe. Herçiqas dê û bavê wî naxwazin jî ew rojekê radibe diçe. Ji welatekî ber bi welatekî ve diçe. Gelek salan li giravekê tena serê xwe dimîne. Piştî gelek bûyerên cuda û rewşên xerab vedigere welatê xwe Hamburgê. Dibîne bavê wî kal bûye û dîya wî jî mirîye. Bi vî awayî çîrok diqede (Gêncî, 2012).

2.9.15. Memê û Eysê

Çîrokeke din a wergerê Memê û Eysê ye. Herçiqas Celîlê Celîl behs nekiribe jî li ber destê me heye û Emînê Evdal di kitêba xwe ya dersê de, wekî çîrok nebe jî wekî helbestkî cih daye wergera vê çîrokê. Çîrok ji aliyê Sîras ve bi ermenkî hatîye nivîsandin. Herwiha ji aliyê Hecîyê Cîndî ve hatîye wergerandin. Çîrok cara pêşî di sala 1935an de li Rewanê tê weşandin. Paşê di sala 2014an de li Stenbolê ji aliyê weşanên *Evrensel Basımê* ve tê weşandin.

Çîrok bi zimanekî edebî hatîye wergerandin. Mijara çîrokê evînîya du ciwanên bi navê Memê û Eysê ye. Di çîrokê de herdu evîndar, ji ber ku Memê diçe leşkerîyê heft sala ji hev dûr dikevin. Şevê Memê vedigere ku digel Eyşeyê radize. Dîya Memê Zozan, kurê xwe nasnake û wî dîkuje. Bi vî awayî çîrok diqede.

Ev berhemên hatine wergerandin, wekî ku dîyar e hinek berhemên klasîk ên cîhanê ne ku gelek mîletên cuda ev berhem wergerandine zimanê xwe. Di hin berhemên wergerandî de jî şibandinek tê dîtin, wekî ku malê edebîyata kurdî ya gelêrî ne. Lewre dema em li mijarên wan wergeran dinêrin em pê derdixin ku ev berhem bi varyantên cuda di nava zargotina kurdî de jî tên dîtin. Tiştê balkêş ev e ku berhemên werger ên dişibin berhemên edebîyata kurdî ya gelerî, bi gelemperî wergerên ji

zimanên ermenî ne. Celîlê Celîl jî bal kişandîye ser vê şibandinê û dibêje: “Wergerên Casimê Celîl ên ji H. Tûmanyar hatine kirin dergeha peywendîya di navbera her du edebîyatan de (ya kurd û ermenan) vekirin. Di salên dahatûyê de ew peywendî hin firehtir û xurtir bûn.” Celîlê Celîl di berdwama gotinên xwe de hin mînakên wan berhemên dide û dibêje: “Navaroka berhemên Tûmanyar ên wekî *Xweyî û Xulam*, *Nezerê Mêrxas*, *Axirya Nes* û yên mayîn di nava zargotina kurdan de rastî me tên (Celîl, 2010: 13).

Tevî van wergerên serbixwe yên wergerandî, di berhemên werger ên ji bo pirtûkên dersê hatine amadekirin de jî ev şibandin gelek tên dîtin. Ango gelek çîrokên ji ermenî hatine wergerandin bi varyanteke cuda di nava zargotina kurdî de tên dîtin.

2.10. Helbestên Zarokan di Edebîyata Kurdî ya Sovyetê de

Helbest cureyeke vegotinêye ku xwedî dîrokeke gelekî kevin e. Herwisa helbest di nav edebîyata zarokan de jî gelek giring e. Lewre di edebîyata zarokan de helbest, ji bo geşedana zimanê zarokan û ji bo têgihiştina mantiqa zimên roleke mezin dîlîze. Wisa ku ji ber ku helbest, xwedî rîtm û qafiyeyê ye zarok di bin bandora wê de dimînin.

Helbest, di nava edebîyata zarokan de ji hemû cureyan kevintir e. Herwiha, destpêka edebîyata zarokên kurd jî mîna edebîyata mezinan bi helbestê dest pê kirîye. Wisa ku di edebîyat û perwerdeya kurdî ya zarokan de herî zêde ev cure bi pêş ketîye û berhem jê hatine afirandin (Subaşî, 2021: 229). Dikare bê gotin ku di kurdî de gelek helbestên zarokan bi armanca perwerdekirinê hatine hazîrkirin. Li vir rola edebîyata kurdî ya Sovyetê gelekî giring e. Lewre afirînerên berhemên kurdî ên Sovyetê, ji bo zarokan gelek helbest nivîsandine. Herwisa di edebîyata kurdî ya Sovyetê de him helbestên wergerandî him jî helbestên orijînal ên ji bo zarokan hatine nivîsandin tên dîtin. Edebîyatnûsên wekî Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Cerdoyê Genco û Erebe Şemo ji bo zarokan gelek helbest nivîsandine. Helbestên wan kesan di pirtûkên perwerdeyê yên zarokên kurd de hatine weşandin. Wisa ku piraniya helbestên wan edebîyatnûsan li ser mijarên wekî; sosyalîzm, pesindayîna Lenîn, Şoreşa Oktobirê û Bolşevîkê tevdigere. Li gorî lêkolîn û tespîten me, Ji bilî van edebîyatnûsên kurd ên Sovyetê, kesên wekî Ferîkê Êsiv, Karlanê Çaçanî, Emînê Evdal û Mîkailê Reşîd jî ji bo zarokên kurdan pirtûkên helbestan ên serbixwe nivîsandine û hazîr kirine.

2.10.1. Mikaêlê Reşîd – Pişîka Min

Mikaêlê Reşîd di sala 1925ê de, li Tîblîsê tê dinê. Li Gurcîstan û Ermanîstanê xwendina xwe tamam dike. Mikaêlê Reşîd helbestvanekî navdar e ku gelek helbestên wî yên wekî *Çivîkê Çûkê, Berf, Nan û Tembêl* di kitêbên dersan de weşîyane.

Pirtûka wî ya helbestan a bi navê *Pişîka Min* ji bo zarokên kurd hatîye hazîrkirin. Pirtûk cara pêşî di sala 1965an de li Rewanê çap dibe û helbestên pirtûkê bi tipên kîrîlî hatine nivîsandin. Pirtûk, paşê ji aliyê weşanên Nûbiharê ve bi latînîzekerina Kenanê Nado di sala 2024an de ji nû ve tê weşandin. Di pêşgotina pirtûkê de, derbarê pirtûkê de tê behskirin ku gelek zarokên kurdan ên ku dersa zimanê kurdî digirtin helbestên di nav vê pirtûkê de ji ber kiribûn û kêfa wan jê re pir hatibû.

2.10.1.1. Naveroka Pirtûkê

Di navaroka pirtûkê de pênc helbestên bi navê *Pişîka Min, Pişo Dişon, Pişo Diçe Nêçîrê, Pişo Nexweşe* û *Pişo Çileke* tê dîtin. Di nava her pênc helbestan de behsa heman pişîkê tê kirin. Ji ber vê jî di navbera helbestan de girêdanek heye. Wisa ku helbest wekî çîrokekê tê xuyanê. Li gorî rêza sernavên helbestan; di helbesta pêşî de pişîk ji aliyê şiklê xwe ve tê teswîrkirin û pişîk şîrê pîrê didize, di helbesta duyem de pişîk tê şûştin, di helbesta sêyem de pişîk di xewna xwe de diçe nêçîra mişkan lê di rastîyê de ji mişkan ditirse. Di helbesta çarem de pişîk derewan dike ku ew nexweş e. Di helbesta pêncem de behsa çilekî û bêsebirbûna pişîkê tê kirin (Reşîd, 1965).

2.10.2. Fêrikê Êsiv – Pampa Min

Fêrikê Êsiv di sala 1934an de li gundê Pampê tê dinê. Li gundê xwe dibistana seretayî dixwîne, piştî xwendina xwe ya çar salan, Fêrikê Êsiv di 1955an de, di beşa Fîlolojî û Dîrokê de dest bi xwendina xwe ya bilind dike. Heman salê di rojnameya Rêya Teze de dest bi xebatê dike û helbest û nivîsên wî diweşin. Fêrikê Êsiv, helbestvan, wergêr, destannûs, laqirdînûs û şanonûsê kurd e ku edebîyata kurdî bi berhemên wî dewlementir bûye.

Fêrikê Êsiv ji bo zarokan gelek helbest û kurteçîrok nivîsandine. Bi alîkarîya nevîyê wî Alîk, di sala 2009an da ew helbest û kurteçîrokên ji bo zarokan hatine nivîsandin, di pirtûkeke bi navê Pampa Min de tînin berhevkirin. Pirtûk di sala 2009ê de li Rewanê di weşanên Lîmûşê de tê weşandin.

2.10.2.1. Naveroka Pirtûkê

Di pêşgotina pirtûkê de ji alîyê gelek kesên navdar ên wekî Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Qenedê Kurdo, Erebe Şemo, Temûrê Xelîl, Eskerê Boyîk û Çerkesê Reş ve taybetmendî û giringîya Fêrikê Êsiv hatîye dîyarkirin. Herçiqas ev pirtûk ji bo zarokan hatibe amadekirin jî hin helbestên di nav pirtûkê de ne li gorî asta têgihiştina zarokan e. Wekî mînak: *Kurdistan, Cimata min, Ez û Cimet, Mistefa Barzanîra, Kurd Xerîbdoste û Hecîyê Cindîra*. Helbestên din ên mayîn bi gelemperî helbestên pastoral in. Herwiha ji alîyê ziman û şêweya xwe ve herikbar û ji bo zarokan fêambar in. Jê cuda di pirtûkê de bi tevî helbestan kurteçîrokên Fêrikê Êsiv ên ji bo zarokan hatine nivîsandin jî tên dîtin. Helbestên ji bo zarokan hatine amadekirin ev in:

Pampa Min, Kurê Minra, Dinîhêrim Ez Dayka Xwe, Dayîk û Tendûr, Bahar, Bahar Vebû, Zefî Hez dikim, Evara Adarê, Bahare, Adar, Dewata Tebîetê, Hewa Xweş bû, Dara Baharê, Dîsa Gulan, Çîyano, Çingilêd Çîyê, Êvar, Ez Xwey dikin, Vê Êvarê Dînc û Kerr, Sirsûmê Dîya Mine, Teva Sore, Ezmanê bi Steyr, Elegez, Gelî Çîya, Esîrê Mînanî Dayîka Dergûş, Payîza Geş, Wextê Dagereyê, Wextê Beranberdanêye, Bager, Beranê Qerqaş, Qulingêd Berrîyê, Çîyayêd Payîzê, Carekê jî Hildim, Zivistan, Siva Zivistanê, Ax, Çivîkêd Çûktîya Minin, Kalîkê Zivistanê, Edilî Bîna Bagerê û Bê, Dêwê Sipî, Berf, Îşev Dîsa Pşila We Bûm Hey Gidî Çîyano, Zarara, Ewqa Zaru hez dikim, Her Berbang û Şebeq, Nara minra, Narê, Elo û Xalo, Naha Emê, Esil Ew Çîye, Nevîya Kalê, Xûç û Bira, Dibûrdax, Elegezêra, Elegeza Min, Egrîdax, Kanîya Zelal, Mûr-Mûrî, Pirs ji Darê, Hefa Gêlî, Diçim Ez, Xalê Min, Kanê Ew Dîdem?, Çêrga Kermê Pêz, Birê Ewirra, Pîreka Mine Rem, Îşev Dîsa, Mişko, Çêt, Şêr û Rûvî, Rûvî û Dîk, Dûdûqûş, Dêlik û Kopek, Hirç û Qaban, Mêş û Kermêş, Ba, Berf û Baran, Çêja Xiştê û Sova Dîn, Qewirê Qorê, Dewlemend, Milkêdarê Çevqul, Kalê û Ezrahîl, Koroxlî, Zerêra, Ew Mamosteyê Me ye? û Ez ku mirim.

Ji bilî helbestên zarokan di pirtûkê de 14 kurteçîrokên Fêrikê Êsiv ên ji bo zarokan hatine nivîsandin hene. Kurteçîrokên ku di pirtûkê de, di navbera salên 1967an heta 1980yî hatine tomarkirin. Kurteçîrok bi gelemperî bi terza fablê hatine nivîsîn. Navên kurteçîrokan ev in:

Kurik, Çiqilê Darê jê Neke, Beranê “Mêrxas”, Çêlek, Kilam, Pezê Têrxarî Nerevîne, Dayîka Kor, Kafreş, Sala Leglegê, Êtîmok, Hêwirza Çivîkê, Ez Birê Îsafême, Bi Dar û Tifîngê, Ê ne û Gurê Pîr (Êsiv, 2009).

2.10.3. Karlanê Çaçanî

Karlanê Çaçanî di edebîyata kurdî ya Sovyetê de wekî helbestvanê zarokan tê hesibandin. Lê mixabin tu berhem û helbestên wî nehatin peydakirin. Lê belê di hevpeyvîneke Keremê Seyad a di gel Karlanê Çaçanî de kêmbê jî hin agahî hatin bidestxistin. Li gorî hevpeyvînê:

1958an kitêba min a bona zarokan derket navê wê min danî Ehmedê Egît bi vê kitêba zarokan a 1958an hatîye çapkirinê ez hatime naskirinê wekî Helbestvanê Zarokên himlî usa jî di edebîyata me da hesabûm hîndarekî edebîyata zarokan. Paşê peyhev kitêbê min çap bûn him bona mezina him bona zara. Bona zara ez niha bêjim: Kewa Edlayê, bona zarokan e. Tiştêkî gelekî derheqa himlî zarokê me. Nasîna tebîetê didime zarokê me. Pirsêd cimaeta me, rabûn û rûniştandina cimaeta me, serhatîyên isan in, şîrêd isa ne yê ku giradayê cimeata me ra.

(Hevpeyvîn. (25.10.2024). Keremê Seyad bi Karlanê Çaçanî re. <https://www.youtube.com/watch?v=hKL-ocoPL9I>.)

Wekî ku ji gotinên Karlanê Çaçanî jî diyar e wî pirtûkên helbestan xusûsen ji bo zarokan nivîsandine. Herwiha dikare bê gotin ku rola helbestên Karlanê Çaçanî ji bo edebîyata zarokan a ewra Sovyetê giring e. Herçiqas helbestên wî nehatibin peydakirin jî mirov li ser gotinên wî dikare derbarê helbestên wî yên zarokan de bibe xwedî fikir. Wisa ku dikare bê gotin ku hin helbestên wî bi armanca hînkirina nîrxên civakî hatine nivîsandin.

2.10.4. Emînê Evdal- Bihar

Nivîskar, helbestvan û mamosteyê zimanê Kurdî Emînê Evdal ji bo zarokên kurdan gelek xebat kirîye. Yêk ji xebatên wî amadekirina pirtûkên dersan e ku di wan pirtûkan de gelek helbest, çîrok û metn ji bo zarokên kurda nivîsîye. Tevî van li gorî lêkolîna me Emînê Evdal pirtûkeke serbixwe ya helbestan jî ji bo zarokan amade kirîye.

Ev pirtûka helbesta ya bi navê Bihar cara pêşî di sala 1935 an li Êrîvanê hatîye weşandin. Emînê Evdal vê pirtûkê dîyarî pirtûkxaneyê Casimê Celîl dike ku di bergeya pêşî ya pirtûkê de jî Emînê Evdal dibêje; *Vê pirtûkê dîyarî serkarê weşanê kitêbên kurmançî Heval Casimê Celîl dikim*. Pirtûk wek wergêra Casimê Celîl hatîye dîyar

kirin. Li ser vê yekê em di nava gumanekê de ne û pirtûk wek antolojîya helbesta xuya dike. Ji ber vê yekê me di bin serenava pirtûkên wergêrê de cih neda vê pirtûkê. Li gorî tespîtên me divê ev pirtûka helbestan di bin vê seronavê bi cih bibe. Pirtûk paşî dîsa di sala 2014an ji aliyê Evrensel Çocuk Kıtalgı ve tē çap kirin.

2.10.4.1. Navaroka Pirtûkê

Di pirtûkê de pêşî em li rastî helbestek bi navê **Bihar** tēn. Me ev helbest di pirtûka Emînê Evdal ya ji bo dersan amade kirîye de dîtibû. Helbest behsa xweşikîya demsala biharê dike. Herwisa di helbestê de giringîya demsala biharê ya ji bo kolxozvana tē daxuyandin.

Helbesteke din bi navê **Pîonêra** behsa kar û xebatên kolxozan dike. Di helbestê de hevkarî û kolektîvbûn mijara sereke ye.

Di berdewama pirtûkê de helbestek bi navê **Zêvîya Me** tē pêşîya me. Di helbetê de behsa rindbûna zêvîyan hatîye kirin. Di helbestê de zêvî wek cihê kolxozan tē dîyar kirin.

Havîn helbesteke din ya pirtûkê ye ku bi zimanek şîrîn e ku behsa xweşikîya demsala havînê hatîye kirin. Di helbestê de dîsa kolektîvbûn û giringîya komînîzmê hatîye kirin.

Di pirtûkê de helbesteke din bi navê **Hehec** tē dîtîn ku helbest behsa bedewîti û xweşikîya hehecikan dike.

Rûvî wek çîrokek menzum di pirtûkê tē dîtîn ku di destpêka çîrokê de rovî taswîra xwe dike. Paşî çîrokbêj behsa serpêhatîya rovî dike ku rovî ji aliyê nêçîrvanekê ve tē kuştin û nêçîrvan postê wî ji bo kolxozvana dibe.

Di berdewama pirtûkê de em rast helbesteke din bi navê **Çivîk** tēn ku di helbestê de çivîk behsa xwe û zehmetîyên xwe dike.

Di pirtûkê de helbesteke din bi navê **Dîk** tē dîtîn ku helbestê de teswîra dîk tē kirin.

Kommûna Mûrîya helbesteke din ya pirtûkê ye ku di helbestê de behsa komek morîyan tē kirin. Herwisa di helbestê de li ser mînaka morîyan behsa giringîya kolektîvbûnê dike.

Tevî van di pirtûkê de helbestek bi navê **Lûrî** tê dîtin ku di helbestê de gotinên rîtmîk pir zede ne.

Di dawîya pirtûkê de metneke xwendinê bi navê **Zevîya Xwendinxanê** tê dîtin. Di nivîsê de kesek bi navê Mamê heye ku xwendekarekî 10-12 salî ye û bûye pîyonêr. Herwisa di nivîsê de xwendakar zêvîyan diçînin û paletîyê dîkin. Metn behsa wan kar û xebatan dike û behsa giringîya kolektîvbûnê dike (Evdal,2014)

Di pirtûka helbestan de helbest pir sade, zelal û herikbarin. Helbest gelemperî behsa kolxoz, kolxozvan, komînîzm û giringîya xebatên kolektîvin. Rîtma helbestan wekî zûgotinoka diherike. Herwiha hemû helbest ji bo asta têgihiştina zarokan guncav in.



ENCAM

Edebîyata zarokan piştî ku li cîhanê berbelav bû gelek cureyên cihereng ji bo zarokan afirî û bi dûmahîya demê re berhemên zarokan di nav xwe de şax vedan. Ji aliyê perwerdeya zarokan jî metodên nû hatine bikaranîn û berhemên afirî xîtabî xeyal û cîhana zarokan kir. Ev geşadana edebîyata zarokan gav bi gav di nava hemû gelên cîhanê de xwe nîşan kir û her neteweyekê li gorî çand û hunera xwe qulçeke edebîyatê ji bo zarokan veqetand û ew ji bo civakeke birewer amade kirin. Weke hemû neteweyên din, di nav kurdan de jî ji bo zarokan berhem hatine dayîn û pirtûkên perwerdeyê hatine amadekirin. Herçiqas heya niha nebûna pergaleke yekgirtî û nebûna dezgehên kurdî yên di bin banê welatekî de ji bo perwerde û edebîyata zarokan bûbe sedema qelsbûnê jî, berhemdayîna kurdî ji bo zarokan ji Ehmedê Xanî dest pê dibe û heya roja me tê. Weke ku em lê werqilîne, ji çanda medreseyê heya roja îroyîn kurdên dîaspora, başûr, bakur, rojhilat, rojava û Kafkasyayê di hêla xwe de gelek berhem ji bo edebîyata zarokan dane, di kovarên giring ên wekî *Nûbiharê* de ji bo zarokan cih veqetandine û ji radyoyê heya bernameyên televîzyonê kedeke mezin ji bo zarokan dane. Êwra Kafkasyayê jî yek ji şaxên ewrên kurdî ye ku di warê xebat û çanda kurdî de gelek berhem jê afirîne û gelek ked hatîye dayîn. Herwisa ji aliyê edebîyata zarokan ve jî ewra Kafkasyayê xwedî cihekî pêldar e. Wisa ku em têgihîştin, Kurdên Kafkasyayê bi taybetî piştî Şoreşa Oktobirê (1917) û piştî vekişîna rûsan rastî gelek zordariyan hatin û sirgûnî Ermenîstanê bûn. Ji ber ku pergala Sovyetê ya wê demê li piştî hemû çînên kêmeper bû û mafên wan diparast, zarokên kurdan ên di rêya sirgûniyê de sêwî mabûn bi zimanê dê perwerde dîtin, gihîştin û pişt re ji bo çand û hunera xwe xebatên cihereng kirin. Ji bo ku ev prosê û merhaleyên ewra Kafkasyayê baştir were fêmkirin em dikarin têgihîştinên xebatê wiha di çend xalan de dîyar bikin:

Zarokên kurd ên sêwî bi alîkarîya dostên kurdan (kesên wekî Lazo, R. Drambyan û hwd.) serê pêşî ji pirtûka *Şemsê* perwerde dibînin û perwerdeya xwe xilaz dikin. Pişt re di sala 1928ê de pirtûka *Xo-Xo Hînbuna Kurmancî* bi tîpên latînî derdikeve û perwerde bi tîpên latînî ten dayîn.

Kadroyên ewil ên xebatkarên kurdan ên wekî Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Cerdoyê Gêncî, Casimê Celîl û hwd. dest bi amadekirina pirtûkên perwerdeyê dikin û mamostetîya zimanê kurdî dikin. Weku hatîye dîyarkirin bi sedan pirtûkên perwerdehîyê ji bo zarokan tên nivîsin.

Weku me li gorî pirtûkên perwerdehiyê yên li ber dest lêkolîn kir, di pirtûkên perwerdehiyê de gelek metnên curbicur hatine nivîsîn. Herwiha, gelek nivîskarên kurdan ji neteweyên din gelek çîrok, helbest û metn wergerandine û pêşkêşî zarokên kurdan kirine. Bi taybetî jî ji nivîskarên wekî H. Tûmanyar, M. Gorkî, Pûşkin û hwd. ên di dewra xwe de xwedî nav û deng bûn gelek metn hatine wergerandin.

Divê were gotin ku pirtûkên ku ji bo zarokên kurdan hatine amadekirin bi rihekî yekgirtî di rêya pergala Sovyetê de çûye û gelek metnên di pirtûkan de xwedî mijarên propagandayê ne. Ev jî nîşan dike ku pirtûk him ji bo perwerdeya zarokan û him jî ji bo telkîna sosyalîzmê hatine amadekirin.

Ji bilî metnên di pirtûkên perwerdeyê de, gelek berhemên nivîskarên bîyanî jî ji bo zarokên kurd hatine wergerandin û hatine weşandin. Bi taybetî Casimê Celîl ji nivîskarên wekî H. Tûmanyar, Pûşkin, Xinko Apêr û hwd. Berhemên zarokan wergerandine û weşandine. Weke ku me xwe hîgandê, 16 pirtûkên zarokan ên ji zimanên bîyanî (ermenî, rûsî û îngîlîzî) ji bo kurdî hatine wegerandin û pêşkêşî zarokên kurd bûne. Jê cuda weku me tesbît kir Şerefê Eşîr û Hamoyê Rizgo bi taybetî ji bo zarokan pirtûkên çîrokan nivîsîne. Di pirtûka Hamoyê Rizgo ya bi navê Şêrê Çevqul de 22 çîrokên zarokan hatine nivîsîn. Di pirtûka Şerefê Eşîr ya bi navê Gezgesk de 8 çîrok hatine nivîsîn.

Dema em li hêla folklorê jî dinîhêrin, bi taybetî nivîskarên wekî Hecîyê Cindî û Celîlê Celîl rastî me tên ku wan berhevkarîyeke gelekî berfireh kirine û bi dehan berhemên folklorîk dane. Di nav van berhevkarîyan de jî gelek çîrok, metelok, têderxistinok hene ku li gorî asta zarokan in û ji bo wan hatine nivîsîn.

Ji hêla çapemenîyê ve jî dema em lê dinîhêrin di Radyoya Rewanê de jî radyoşano ji bo zarokan hatine amadekirin. Li gor çavkanîyên berdest 2 radyoşano ji bo zarokan hatine amadekirin û pêşkêşkirin (Şengilo, Mengilo, Xalîçengilo û Keçîka Kumsor). Herwiha di rojnameya Rêya Teze de kêm be jî hin nivîs, helbest û çîrok ji bo zarokan hatine nivîsandin. Weke ku me din av 48 hejmarên rojnameya Rêya Teze de lêkolîn kir, di 7 hejmaran de em li rastî stran, çîrok û metnên pedagojîk hatin.

Di Êwra Kafkasyayê de, herçiqas belawela be jî, ji bo zarokan gelek helbest hatine nivîsîn. Ji bilî helbestên di pirtûkên perwerdeyê de, pirtûkên helbestan ên helbestvanên wekî Karlanê Çaçanî, Fêrikê Êsiv û Mikailê Reşîd hatine weşandin.

Weke ku me xwe gihandê, Mikailê Reşîd ji bilî helbestên wî yên di nav pirtûkên perwerdeyê de, pirtûkeke helbestên zarokan bi navê Pişîka Min nivîsiye. Her wiha pirtûka Fêrikê Ûsiv ya bi navê Pampa Min jî antolojîyeke helbestên zarokan e û ji bo zarokan hatîye amadekirin. Helbestvanekî din jî Karlanê Çaçanî ye ku di nav edebîyata Kafkasyayê de wekî helbestvanê zarokan dihate nasîn. Herçiqas me xwe negihandibe berhemên wî jî, weke ku xwe jî dibêje pirtûkên wî yên helbestan ên bi navê Ehmedê Egît û Kewa Edlayê ji bo zarokan in.

Bi gotineke giştî ji destpêka geşedana edebîyata Kafkasyayê heya hilweşîna Sovyeta Yekgirtî gelek nivîskaran di rêya perwerdeya zarokan de ked dane, ji bo zarokan berhem dane û şano amade kirine. Lê terza xebatên edebîyata zarokan di Êwra Kafkasyayê de gelekî belawela ye û vê jî hejmarên berhemên ku tenê ji bo zarokan hatine amadekirin gelekî gelekî kêr kirîye.

ÇAVKANÎ

- Adak, A. (2015). *Destpeka Edebiyata Kurdi ya Klasik*. Stenbol: Nûbihar.
- Ahmad, H. O. (2020). Lîrîkay Şa‘Îrê Gewreyê Kurd Mewlewî. *Kurdîname*. Hej. 3.
- Ulanowicz, A. (d.t) Philippe Ariès. Representing Childhood - Theorists - Philippe Ariès.
- Arıcı, A. F. (2016). *Çocuk edebiyatı ve kültürü*. Ankara: Pegem.
- Arkılıç Songören, S. (2011). İlköğretimde çocuk edebiyatı. *Contemporary Online Language Education Journal*. Hej.1. 82-88.
- Aydın, İ. û Uzun, M. (2020). Çocuk kitaplarının taşınması gereken özellikler: Cemil Kavukçu’nun Bir Öykü Yazalım Mı? ve Masal Anlatma Oyunu adlı eserlerine eleştirel bir bakış. *Rumelide Dil ve Edebiyat Araştırmaları*, Hej.7.
- Aytaş, G. (2003). Okuma Gelişiminde Çocuk Edebiyatının Rolü. Gazi Üni. Gazi Eğitim Fak. Türkçe Eğitimi Bölümü.
- Bender, M. T. (2005). John Dewey’nin Eğitime Bakışı Üzerine Yeni Bir Yorum. Gazi Üniversitesi Kırşehir Eğitim Fakültesi, c.6, h.1.
- Boleli, N. û Ertekin, N. (2017). Ferhengên Menzûm di Edebiyata Kurdî de. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü*. Hej.5.
- Boyîk, E. (2004). *Nûra Elegezê; Çend didem ji Edebyeta Kurdên Ermenistanê*. Oldenburg: Weşangeha Dengê Êzîdîyan.
- Boyîk, E. (2017). Pêşdaçûyîna Lîteratûra Kurdaye Sovêtîê. *Wêje û Rexne*. h.9/10.
- Boyik, E. (2012). *Çanda Kurdên Sovêtê*. İstanbul: Deng.
- Bumin, K. (1983). *Batıda Devlet ve Çocuk*. İstanbul: Alan.
- Bütün Ayhan, Aynur. (2018). *Çocuk Edebiyatı ve Medya*. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi.
- Can, H. (2013). *Kürtler ve Stalin*. İstanbul: İşçi Kolektifi.
- Celîl, C. (1937). *Nezerê Mêrxas*. Yerevan: Neşra Hukumeta Şewra Ermenîstanê.
- Celîl C. (2012a). *Axirya Nes*. Enstîtûtya Kurdzanîyê, Wien.
- Celîl C. (2012b). *Mişka pişikêra Çawa Şer Kirin*. Enstîtûtya Kurdzanîyê, Wien.
- Celîl C. (2012c). *Se û Pişik*. Enstîtûtya Kurdzanîyê, Wien.
- Celîl C. (2012d). *Teyr û Tû*. Enstîtûtya Kurdzanîyê, Wien.
- Celîl C. (2012e). *Xweyî û Xulam*. Enstîtûtya Kurdzanîyê, Wien.
- Celîl, C. (2012f). *Masigîr û Masîyê Zêrîn*. Enstîtûtya Kurdzanîyê, Wien.
- Celîl, C. (2014). *Memê û Eyşê*. Stenbol: Evrensel Basım Yayın.

- Celîl, C. û Celîl, O. (1978). *Zargotina Kurdî*. Moskva: Hayka.
- Celîl, C. (2010). Beşek ji Dîroka Weşengerîya Kurdên Kafkasyayê. *Tîroj*. Sal. 8, Hej.44. Stenbol: Evrensel Basım Yayın.
- Cindî, H. (2009). *Folklor Kurda*. Yêrêvan: Lîmûş.
- Cindî, H. û Evdal, E. (2008). *Folklor Kurmanca*. Stenbol: Avesta.
- Cindî, H. (2008). *Folklor Kurmancîyê*. Dîyarbekir: Lîs.
- Cindî, H. (2014) *Hikayedê Cimeata Kurda (1)*. Stenbol: Rûpel.
- Cindî, H. (2014) *Hikayedê Cimeata Kurda (2)*. Stenbol: Rûpel.
- Cindî, H. (2014) *Hikayedê Cimeata Kurda (3)*. Stenbol: Rûpel.
- Cindî, H. (2014) *Hikayedê Cimeata Kurda (4)*. Stenbol: Rûpel.
- Cindî, H. (2015) *Hikayedê Cimeata Kurda (5)*. Stenbol: Rûpel.
- Cindî, H. (2015) *Hikayedê Cimeata Kurda (6)*. Stenbol: Rûpel.
- Çelik, H. û Fırat, H. (2020). Çocuk Hikâye ve Romanlarında Çocuk Gerçekliği Sevim Ak Örneği. *Uluslararası Türkçe Edebiyat Kültür Eğitim*. Hej.9.
- Çiftçi, F. (2013). Çocuk Edebiyatında Yaş Gruplarına Göre Kitaplar ve Özellikleri, *Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, c. 1, h. 1.
- Demir, A. (2019). Çocuk Edebiyatı ve Yaratıcı Düşünme. *İdil*.
- Dilidüzgün, S. (1996). *Çağdaş Çocuk Yazını*. İstanbul: Yapı Kredi.
- Drambyan, R. (1935). *Şirovekirin Derheqa Heywana de. Bona Zara*, Rewan: Neşra Hukumeta Şewra Ermenîstanê,
- Evdal, Emînê(2014) Bihar, Weş, Evrensel Çocuk Kitaplığı, Stanbol.
- Erdman, M. (2017). Raising Kurdish Armenia: Kurdish Children's Books From Soviet Armenia, *Asian and African studies blog*.
- Eremektar, M. (1989). *Çocuk Kitabı Çizerliği*. İstanbul: YA.PA.
- Evdal, E. û Cindî, H. (2012). *Gîkor*. Enstîtûtya Kurdzanîyê, Wien.
- Foulquie, P. (1994). *Dictionnaire de la Langue Pedagogique*. (wer. Cenap Karakaya). İstanbul: Sosyal.
- Franklîn, B. (1986). *Çocuk Hakları*. İstanbul: Ayrıntı.
- Gêncî, C. (2012). *Robînson Krûzo*. Enstîtûtya Kurdzanîyê, Wien.
- Gönen, M. (2000). *Okulöncesi Çocuk Edebiyatı*. İstanbul: Çocuk Vakfı.
- Gönen, M. (2004). HÜ, *Eğitim Fakültesi Dergisi*, Cilt: 5, r. 7.

- Güler, E. (2014). Çocuk Edebiyatı Kapsamında Mehmet Güler'in Eserleri Üzerine Bir İnceleme. (Teza Masterê). Necmettin Erbakan Üniversitesi Eğitim Bilimleri Enstitüsü Türkçe Eğitimi Ana Bilim Dalı Türkçe Eğitimi Bilim Dalı.
- Güleryüz, H. (2013). *Yaratıcı Çocuk Edebiyatı*. Pegem.
- Hawar. (2012). İstanbul: Belkî.
- Hecî Cewarî, F. (2010). *Bîranînên Min*. Yêrêvan: Lîmûş.
- K. T. D. (1979). Çocuklara Kitaplık. *Türk Dili*. Hej. 331.
- Kabasakal Badamchi, D. (2017). Jean-Jacques Rousseau'nun eğitim anlayışının temelleri: Birey Emile mi, vatandaş Emile mi? *Beytulhikme Philosophy Circle*, 7(1), 107-127
- Kadim, M. (2021). *Çocuk Edebiyatı*. Samsun: Ondokuz Mayıs Üniversitesi,
- Karaağaç, H. G. ü Alikılıç, D. (2023). Çocuk Edebiyatı ve Çocuğa Görelik Kavramı. *Education and Technology in Information Science*. Hej.1
- Karadoğan, U. C. (2019). "Çocuk ve Çocukluk" Kavramının Tarihsel Süreçte Değerlendirilmesi. *Çocuk ve Medeniyet*. 2019/1. 195-226.
- Karagül, S. (2019). Çocuk Edebiyatının Temel İşlevleri: Felski'nin Yaklaşımı Doğrultusunda Bir Değerlendirme. *Dil Eğitimi ve Araştırmaları*.
- Kartal, H. (Zivistan 2014). Di Rojî Kurd de Perwerde û Pêşketin. *Kovara Zend*. Weş. Enstîtuya Kurdî ya Stanbol.
- Kaya, S. (2022). Lêkolînek li ser Radyoşanoyên di Radyoya Rewanê da. (Teza Mastirê). Zanîngeha Bîngolê.
- Kıbrıs, İ. (2010). *Çocuk Edebiyatı* (4. Baskı). Ankara: Kök Yayıncılık.
- Kızılhan, İ. (2014). *Fêrbûn, pirtûkek ji bo zarok û ciwanan*. Stenbol: Rûpel.
- Koyuncuoğlu, A. (2021). *Çocuk Edebiyatının Dünya'daki ve Türkîye'deki Tarihsel Gelişimi*. Ağrı: SEÇ.
- Lewis, D. (2006). *Reading Contemporary Picturebooks, Picturing Text*. New York: Routledge.
- Moran, B. (1974). *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*. İstanbul: Cem Yayınevi.
- Mutluay, R. (1978). *Psikolojiye Giriş*. Ankara: Hacettepe Üniversitesi Bölümü.
- Nahrîn, M. (2023). *Perwerdeya Zarokan bo Çîrokan*. Stenbol: Nûbihar.
- Nas, R. (2014). *Örneklerle Çocuk Edebiyatı*. Bursa: Ezgi Kitabevi.
- Neydim, N. (2003). *İnceleme-Araştırma-Eleştiri-Çocuk Edebiyatı*. İstanbul: Bu.

- Öncü, M. B. (2008). Teknolojisindeki Gelişmelerin Resimli Çocuk Kitaplarının Gelişimine Etkisi. H.Ü. Sos. Bil. Enst Ankara.
- Öztañ, G. G. (2013). *Türkiye’de Çocukluğun Politik İnşası*. İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi.
- Öztürk, B. û Öztürk, S. B. (2021). Özge Altınok Lokmanhekim’in Resimli Çocuk Kitaplarının Çocuk Edebiyatının Temel İlkeleri Açısından İncelenmesi. *Çocuk, Edebiyat ve Dil Eğitimi Dergisi – ÇEDED*.
- Pertev, R. (2009). *Zarok û Çîrok Destpêka Pedagojîya Kurdî*. Stenbol: Doz.
- Pertev, R. (2012). Mîrsadu’l-Etfal (Şahrahê Kûdekan) Ferhenga Menzûm A Kurdî-Farîsî (Vekolîn-Tekst). (Teza masterê). Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Postman, N. (1995). *Çocukluğun Yok Oluşu*. İmge Kitabevi.
- Qader, Z. R. Q. (2016). Bi Zaravayê Soranî Helbestên Zarokan li Edebê Kurdî de (Zêwer, Goran, Letîf Helmet û Emîn Mihemed). (Teza masterê). Zanîngeha Yüzüncü Yılê Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Reşîd, M. (1965). *Pişîka Min*. Yêrêvan: Ayastan.
- Rizgo, H. (1972). *Şêrê Çavqûl*. Êrêvan: Ayastan.
- Sever, S. (2013). *Çocuk ve edebiyat (8. Baskı)*. Ankara: Tudem Yayıncılık.
- Sever, S. (2019). *Çocuk edebiyatı ve okuma kültürü*. İzmir: Tudem.
- Sever, S. (2015). *Çocuk ve Edebiyat*. Ankara: Tudem Yayınları.
- Subaşı, K. (2017). Kurtedîroka Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî. *e-Şarkîyat İlmi Araştırmalar Dergisi Journal of Oriental Scientific Research (JOSR)*. Hej.1.
- Subaşı, K. (2021). Nirxandina Helbestên Zarokan ên Kurdî li Gorî “Rastîya Zarokan” û “Îzafîyeta Zarokan” *Mukaddime*, Hej.12.
- Subaşı, K. û Merak, A. û Akhan, B. (2022). Elaeddîn Seccadî û Nirxandina Çîrokên Wî yê ji bo Zarok û Nûciwanan li Gor Pîvanên Edebîyata Zarokan. *The Journal of Mesopotamian Studies*, hej.7.
- Subaşı, K. (2022). Gîrr û Gallî Mindallanî Kurd Kurtedîroka Çapemenî û Medyaya Zarokan a Kurdî. Stenbol: Nûbihar.
- Suvağci, İ. (2020). Di Edebîyata Zarokan ya Kurdî da Nûnerek ji Nifşê Nû: Berfin Ayşe Öğüt. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. Hej. 8.

- Şahin, A. (2007). *Çocuk ve Çocukluk Eğitim Fakülteleri için Çocuk Edebiyatı*. Ankara: Pegem.
- Şamil, H. (2007). *Serhed, Kafkasya ve Diasporada Yaşamın Adı: Kinyaze İbrahim ve Kürtler*. İstanbul: Peri.
- Şen, E. (2012). Çocuk Edebiyatında Bir Yaşam Gerçekliği Olarak Ölüm Olgusu Üzerine Bir İnceleme (Sevim Ak Örneği). *Uluslararası Türk Kültür Coğrafyasında Eğitim Bilimleri*.
- Şimşek, T. û Yakar, Y. M. (2014). *Kuramdan uygulamaya çocuk edebiyatı el kitabı*. Grafiker Yayınları.
- Şirin, M. R. (2000a). *Çocuk Edebiyatına Eleştirel Bir Bakış*. Kök Yayınları.
- Şirin, M. R. (2000b). *Çocuk Edebiyatı Kültürü, 99 Soruda Çocuk Edebiyatı*. İstanbul: Çocuk Vakfı.
- Şirin, M. R. (2007). *Çocuk Edebiyatına Eleştirel Bir Bakış- Çocuk Edebiyatı Nedir Ne Değildir?-*. Ankara: Kök Yayıncılık.
- Şirin, M. R. (2016). Edebiyat ve Çocuk Edebiyatının Amacı ve İşlevi. *Türk dili*.
- Şirin, M. R. (1987). *Çocuk Edebiyatına Eleştirel bir Bakış*. İstanbul: Gökyüzü.
- Tek, A. (2019). Evdirrehîm Rehmî Hekkarî û Berhemên wî yên ji bo Biçûk, Ciwan û Jinan. *The Journal of Mesopotamian Studies*.
- Toptaş, K. (2016). Eski Mezapotamya’da Çocuk. *ArAn*. Hej.10.
- Türkçe Sözlük. (2011). Ankara: Türk Dil Kurumu.
- Ulugana, S. (2017). Kurdolojîya Sovyetê û Kronolojîya Edebîyata Wêjeya Kurdî (1922-1991). *Wêje û Rexne*. h.9/10.
- Ural, S. (1988). *1987’de Okulöncesi Çocuk Kitapları*. İstanbul: Gökyüzü.
- Ûsiv, F. (2009). *Pampa Min, Berhemên Bona Zarokan*. Yêrêvan: Lîmûş.
- Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê. (1996a). *Fablên Kurdî, Weş. Sîda*. (Belavkirin: Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê).
- Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê (1996b). *Klasîkên Cîhanê yên Piçûkan*. Weş. Sîda. (Belavkirin: Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê)
- Williams, L. (2003). *Çocuğunuzu Keşfedin*. (wer: M. Koyuncu). İstanbul: Hayat Yayınları.
- Xamo, Z. (2014). *Hebû Tunebû ‘Antolojîya Çîrokên Zarokan’*. İstanbul: Rûpel.
- Yalçın, A. û Aytaş, G. (2016). *Çocuk Edebiyatı*. Ankara: Akçağ.
- Yalçın, A. û Aytaş, G. (2011). *Çocuk Edebiyatı*. Ankara: Akçağ

- Yıldırım, K. û Pertev, R. û Aslan, M. (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*. İstanbul: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü.
- Yıldız, K. (2017). *Di Edebîyata Zarokan De Çîrok*. (Teza Masterê). Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.
- Yıldız, F. E. û Öztürk Samur, A. (2018, Aralık). Türkiye’de çocuk edebiyatı alanında yapılan lisans üstü çalışmaların incelenmesi. *International Congress of Human Studies*. Uluslararası İnsan Çalışmaları Kongresi’nde (6 Aralık 2018) sunulmuş bildiri, Ankara.
- Zengin, A. Y. û Zengin, N. (2009). *Eğitim Fakülteleri İçin Çocuk Edebiyatı*. İstanbul: Truva Yayınları.
- Zinar, Z. (1993). *Medresa Kurdî- Xwendina Medresê*. Stockholm: Pencînar.

ÇAVKANÎYÊN DÎJÎTAL

- Alakom, R. (2021). *Ji Edebîyata Kurdên Swêdê: Trîlojîya Mehmed Dehşîwar*. <https://www.kurdarastirmalari.com/yazi-detay-oku-114>. (20.07.2024).
- Ansîklopedîya Zarokan. (30.06.2024). Di Wîkîpedîyayê de. [https://ku.wikipedia.org/wiki/Ans%C3%AEklopediya_zarokan_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/Ans%C3%AEklopediya_zarokan_(pirt%C3%BBk))
- Bawer, M. (2016). Kürt Folkloruyla Gelişen Çocuk Edebiyatı Bin Yıllardır Var. https://bianet.org/haber/mem-bawer-kurt-folkloruyla-gelisen-cocuk-edebiyati-bin-yillardir-var-172500#google_vignette. (30.05.2024).
- Cewerî, F. (2003). *Pêşgotina Antolojîya çîrokên kurdî, Fikra amadekirina antolojîyê*. http://www.nefel.com/articles/article_print.asp?ArticleNr=319. (15.07.2024).
- Hevpeyvîn. (25.10.2024). Keremê Seyad bi Karlanê Çaçanî re. <https://www.youtube.com/watch?v=hKL-ocoPL9I>.
- Kemal Burkay. (15.06.2024). Di Wîkîpedîyayê de. https://tr.wikipedia.org/wiki/Kemal_Burkay.
- Mahmut Baksî. (15.06.2024). Di Wîkîpedîyayê de. https://tr.wikipedia.org/wiki/Mahmut_Baksi
- Oğuz, C. (2022). *Weşangerên kurd serê sibê ji xew rabû û fikirî*. <https://diyarname.com/news.php?Idx=870>. (24.07.2024).